Abdullah OCALAN

# NEXŞEYA RÊ

## LI TIRKIYÊ PIRSGIRÊKÊN DEMOKRATÎKBÛYÎNÊ, LI KURDISTANÊ MODELÊN ÇARESERIYÊ

Weşanên Akademîya Zanistên Civakî ya ABDULLAH OCALAN

**Cihê Çapxanê: Çapxaneya Azadî**
**Diroka Çapkirinê: 2012**

**Werger: Rêşad Sorgul**
**Sererastkirin: Luqman Guldivê**

**NAVEROK**


**PÊŞGOTIN ........ 5**

**BEŞA YEKEMÎN: DESTPÊK ........ 7**

**BEŞA DUYEMÎN: ÇARÇOVEYA TEGÎNÎ, TEORÎK Û PRENSÎBÎ ........ 13**
*Çarçoveya Tegînî* ........ 13
*Çarçoveya Teorîk* ........ 15
*Çarçoveya Prensîbî* ........ 23
Prensîba Neteweya Demokratîk ........ 24
Prensîba Welatê Hevpar (Welatê Demokratîk) ........ 24
Prensîba Komara Demokratîk ........ 24
Prensîba Destûra Bingehîn a Demokratîk ........ 25
Prensîba Çareseriya Demokratîk ........ 25
Prensîba Bihevrebûna Azadî û Mafên Ferdî û Kolektîf ........ 27
Prensîba Azadî û Serxwebûna Îdeolojîk ........ 27
Prensîba Nihatî û Dîrokîtî ........ 28
Prensîba Wijdan û Exlaq ........ 29
Prensîba Xweparastina Demokrasiyan ........ 31

**BEŞA SÊYEMÎN: LI TIRKIYÊ PIRSGIRÊKA DEMOKRASIYÊ û ÇARESERIYA DESTÛRA BINGEHÎN A DEMOKRATÎK ........ 33**
LI TIRKIYÊ DERKETINA HOLÊ YA PIRSGIRÊKA DEMOKRASIYÊ, PÊŞKETINA WÊ û ENCAMÊN WÊ ........ 33
DERKETINA JI KRÎZÊ û ÇARESERIYA DESTÛRA BINGEHÎN A DEMOKRATÎK ........ 56
Neteweya Demokratîk ........ 57
Welatê Hevpar (Welatê Demokratîk) ........ 57
Komara Demokratîk ........ 57
Çareseriya Demokratîk ........ 57
Jihevnebûna Mafên Kolektîf û Ferdî ........ 57
Azadî û Serxwebûna Îdeolojîk ........ 58
Nihatî û Dîrokîtî ........ 58
Exlaq û Wijdan ........ 58
Xweparastina Demokrasiyan ........ 58

**BEŞA ÇAREMÎN: PIRSGIRÊKA KURD Û ÇARESERIYÊN MUHTEMEL ........ 61**
DI TÊKILIYÊN KURD Û TIRKAN DE DIYALEKTÎKA DÎROKÎ ........ 64
XETIMÎNA PROJEYA KOMARÊ YA MODERNÎTEYA KAPÎTALÎST û DERKETINA HOLÊ YA PKK'Ê ........ 69
DI PIRSGIRÊKA KURD DE ÇARESERIYÊN MUHTEMEL ........ 81

Çareseriya Îmhaker a Neteweyî ya Hegemonyadariya Modernîteya Kapîtalîst ........ 82
Çareseriya Dewletdar-Netewe ya Federalîst a Kurd ........ 87
Çareseriya Neteweya Demokratîk ........ 89
Neteweya Demokratîk ........ 91
Welatê Hevpar (Welatê Demokratîk) ........ 91
Komara Demokratîk ........ 91
Destûra Bingehîn a Demokratîk ........ 91
Jihevnebûna Mafên Kolektîf û Ferdî ........ 91
Azadî û Serxwebûna Îdeolojîk ........ 92
Nihatî û Dîrokîtî ........ 92
Exlaq û Wijdan ........ 92
Xweparastina Demokrasiyan ........ 92
Di Asta Nav De Berbiçavkirina Çareseriya Demokratîk: KCK ........ 94
Di Çareseriya Bi Navê KCKê de Şaxên Wê Yên Muhtemel Bêne Pêkanîn .97
Şaxê Aborî ........ 97
Şaxê Civakî ........ 97
Şaxê Ewlekariyê ........ 98
Şaxê Dîplomatîk ........ 99

**BEŞA PÊNCEMÎN: PLANA ÇALAKIYÊ ........ 101**
Plana Çareseriya Îmhaker û Înkarker a Ji Rêûresmê ........ 102
Plana Çareseriya Milliyetgir, Federalîst ........ 103
Plana Çareseriya Demokratîk ........ 104
Qonaxa Yekemîn ........ 105
Qonaxa Duyemîn ........ 105
Qonaxa Sêyemîn ........ 105

**BEŞA ŞEŞEMÎN: ENCAM ........ 107**

## PÊŞGOTIN

Li Tirkiyê guftûgoyên li ser demokratîkbûyînê zêde dibin. Di bingehê van guftûgoyan de jî pirsgirêka Kurd heye. Di sala 2009'an de Serokkomarê Tirkiyê Rêzdar Abdullah Gul bi xwe di çarçoveya çareseriya pirsgirêka Kurd de gotibû "Yan wê çareser bibe, yan wê çareser bibe." Bi vê yekê jî diyar dibû ka di demokratîkbûna Tirkiyê de çareserkirina pirsgirêka Kurd çiqasî girîng e. Ji lewra jî ez bi berpirsiyariya li ser milê xwe radibim û divê vê nirxandinê pêşkêş bikim. Herweha tevahiya saziyên bingehîn ên dewletê yên bi ewlekariyê re têkildar di warê pirsgirêkên çareseriya wan lezgîn de helwestên diyarker nîşan dan. Dîsa di nava raya giştî de li ser şexsê min nirxandin û bangawazî hatin kirin. Van hemûyan ev pêşkêşî girîngtir û elzem kir.

Di heman mijarê de li serê salên 1990'î xwestekên devkî û nivîskî yên Serokkomarê demê Rêzdar Turgut Ozal û di sala 1997'an de yên Serokwezîr Rêzdar Necmettîn Erbekan, di heman demê de notên agahdarkirinê yên ji Beşa Têkiliyên Civakî yên Artêşê hatin, sala 1999'an di wexta êsîrketinê de di jêpirsîna deh rojên girtinê û hevdîtinên bi hin rayedaran re di pêvajoya piştî jêpirsînê de, dîsa nivîsên nirxandinê û nameyên min ji saziyên cûrbicûr ên dewletê re şandî û tevî van, meyla Komara Tirkiyê ya her diçû xuyatir dibû di vê pêşkêşkirinê de bi bandor bûne.

**Beşa Yekemîn:**

## DESTPÊK

Pirsgirêkên demokratîkbûnê di dîrokê de her hebûn. Çawa ku dixwazin nîşan bidin, diyardeyek e ku bi modernîteya Ewrûpayê re derneketiye holê. Di xwezaya civakan de meylên demokratîk her hene. Her hebûn der barê xwe de xwedî însiyatîf, rêveberin û berdayînê ye. Em vê yekê di her hebûnê de dibînin û demokrasî bi xwe jî bi van diyardeyan girêdayî ye. Ez yeqîn dikim ku ev dîtineke gerdûnî ye.

Di dîroka şaristaniyê de nexasim di dema destpêkê ya Sumeran de saziyên meclîsan ên ji berdevkên civaka cotkaran û gelê bajaran pêkhatî bi roleke girîng rabûne. Bi qasî ku tê dîtin, saziyên demokratîk ên pêşî ne li Grek-Atînayê, lê li bajarên Sumeran pêk hatine û ev rastiyek e ku mirov nikare înkar bike. Bi demê re giraniya rahib, rêveberê polîtîk û rayedarê eskerî zêde dibe, lewma saziyên demokratîk dikevin dereceya duyemîn û girîngiya xwe ya di rêveberiyê de ji dest didin. Di serdema Nemrût û Firewnan de ku serdema qral-xwedeyan e, bi tevahî gel weke 'evdên afirandî' têne dîtin û lewma mirov êdî nikare behsa saziyên demokratîk bike. Pêvajoyên bi heman rengî hema hema li cem şaristaniyan hemûyan hatine dîtin. Em mînaka vê ya dawiyê di Serdema Destpêkê de li cem Atîna û Romayê ji tecrûbeyên wan ên komar û demokrasiyê dibînin.

Serdema Navîn di dema destpêkê ya Xiristiyantiyê de, ango hê weke dînê fermî yê Împaratoriya Bîzansê nehatibû qebûlkirin û di salên destpêkê yên Îslamiyetê de herçiqasî hêmanên demokratîk girîng bûbin jî rêûresma îmapratoriyê ya bi hêz bandora van hêmanan bi lez tesfiye kiriye û bi rêveberiyên navendî yên hişk hebûna xwe dewam kirine. Li parzemîna Ewrûpayê di serê salên 1000'î de saziyên nû yên bajaran demeke dirêj bi rêûresmên demokratîk hatin birêvebirin. Bajar demeke dirêj neçar man li dijî otorîteyên feodal saziyên xwe yên serbixwe û demokratîk biparêzin. Di berxwedana civakên gundan ên serbixwe (bejahiya derveyî bajaran) û prensan li dijî rejîmên qraltiyan de hêmanên demokratîk bi roleke girîng rabûn.

Qraltiyên ji sedsala 15. û pêve veguherîn monarşiyên mutleq, mîna şaristaniyên ji rêûresmê saziyên demokratîk bi giranî li derve hiştin. Bi tenê li Girava Brîtanyayê Magna Charta ya di sala 1216'an de li dijî qraltiyê bi awayekî fermî dan qebûlkirin weke rêûresmeke demokratîk hebûna xwe parast. Şoreşa Mezin a Fransî ya di sala 1789'an de, tevî ku li dijî monarşiya mutleq weke şoreşeke gel destpê kir, bi demê re veguherî dîktatoriya bûrjûwaziyê. Vê dîktatoriyê xwe weke dewleta netewe bi rêxistin kir û xwe di ser monarşiya mutleq re bi otorîteyekê gurçûpêç kir. Bi polîtîkaya Împaratoriya Brîtanyayê ya perçe bike-bi rêve bibe dewletên netewe yên piçûk li Ewrûpayê zêde bûn û bi vî awayî statukoyeke balansê hat avakirin. Rejîmên di çarçoveya dewleta netewe de dimeşiyan, tevî îdeayên xwe yên lîberal hemûyan weke rejîmên olîgarşîk ên ji elîtan pêkhatî bûn. Saziyên parlementeran ên heyî ti carî nikarîbûn serweriya elîtên olîgarşîk tesfiye bikin. Hemin saziyên demokratîk ên xwe dispêrin têkoşîna demdirêj a gelên gund û bajaran jî bi temamî tesfiye nebûn. Ji lewra demokrasiya heta roja me ya îro li Ewrûpayê dimeşe, demokrasiyeke çînî ye ku naveroka xwe ya gelêrî gelekî kêm e, û di bin destê olîgarşiya bûrjûwaziyê de ye. Piştî salên 1950'î Yekîtiya Ewrûpayê YE, tevî ku hewl da konfederasyoneke yekîtiya demokratîk di ser dewleta netewe re pêk bîne jî yekdestdariya olîgarşîk a dewletên netewe nayê şikandin. Tecrûbe û ezmûn girîng in, lê şensê serketinê vebirrî û teqez nîne.

Çawa ku li tevahiya dinyayê pêk hat, Împaratoriya Osmanî jî li ser bingehê şoreşa îndustriyê ji sedsala 19. û pêve di serî de Împaratoriya Brîtanyayê ya hegemonya xwe misoger kiribû ket bin bandora hêzên mezin ên Ewrûpayê. Împaratoriya Osmanî li gorî rêûresma dewletê ya Rojhilata Navîn hatibû avakirin. Ji ber ku ekolên dewletdar ên netewe bi lez pêş diketin, Împaratorî ji bo ji hev de nekeve li ser bingehekî burokratîk hewl da xwe nû bike û xwe veguherîne dewleteke netewe ya navendî ya şidandîtir. Ji lewra xwestin isyanên navxweyî bi dijwarî bitepisînin. Di encamê de bi giranî li Anatolya û Bakurê Mezopotamyayê Komara Tirkiyê ya îro ya ji milletên Tirk-Kurd û gelek komên etnîk pêkhat ji Împaratoriyê mîras ma. Di vê pêkhatinê de Împaratoriya Brîtanyayê bi rola diyarker rabû. Bi demê re bûrjûwaziya bi nav Tirk lê ji gelek milletan pêkhatî ji serê sedsala 20. û pêve xwe weke

Partiya Îttîhad û Terakî bi rêxistin kir, bi milliyetgiriyeke gelekî hişk pêşî di dema Meşrûtiyeta Duyemîn de û paşê jî di dema rejîma Komarê de gavavêt dîktatoriyê. Di nava dewletê de tevî hebûna lîderên karîzmatîk ên weke Mistefa Kemal Paşa dîktatoriya olîgarşîk a burokratîk di nava dewletê de hebûna xwe heta roja me ya îro parast. Gelek cemiyet û partiyên siyasî yên legal û îllegal ên bi navikê bi ser dewletê ve –bêyî ku mirov wan weke laîk-dîndar, rastgir-çepgir ji hev cuda bike- ji bo dîktaya olîgarşîk bi sazî bibe û bandora wê ya îdeolojîk bi cih bibe, bi kêr hatine û bi vê rabûne û rûniştine. Dadgehkirina Ergenekonê ya di roja me ya îro de hewl didin bimeşînin, bi vê rêûresma dîktaya olîgarşîk re ya di sedsala dawî ya nava dewletê de têkildar e. Dadgehkirina Ergenekonê dikare çarenûsa demokrasiyê diyar bike û ji vî alî ve mirov dikare gelekî girîng bibîne û bi vî awayî binirxîne.

Li Tirkiyê demokrasî tevî ku mijarek e, ji Meşrûtiyetê û heta ji Tanzîmatê ve tê guftûgokirin jî weke teorî û sazî pêş neket; nexasim demokrasî di nava *demos'*a xwe de ango di nav gel de bi cih nebû. Ya rastî di navbera du komên neqane yên olîgarşîk de, veguherî lîstikekê û hat lîstin. Ango di navbera eşrafên giregir ên li derveyî dewletê û burokrasiya dewletê de. Van herdu komên olîgarşîk her tişta bi rastî bi berjewendiyên gel re têkildar tepisandin, pelixandin. Sîstemê xwe li dijî gel ji aliyê aborî, îdeolojîk, polîtîk, eskerî û çandî ve gelekî şidandî û veşartî ava kir û bi awayekî têkûzkirî xwe heta roja me ya îro anî. Lê têkoşînên gel û avahiyên civakî yên bi pêş ketin ji roja damezrandinê ve û di şertên roja me ya îro de her ev sîstem hejandin. Pirsgirêkên demokratîkbûnê bi van bûyeran ve girêdayî pêş ketin. Ji ber karekterê rejîmê yê girtî û hişk milliyetgir, dîndar, cinsiyetparêz û ji ber îdeolojiyên din ên zanistiya pozitivîst, di qada guftûgoyê de ev bi rêkûpêk bi nav jî nehatin kirin. Huqûq ji rêzik û pîvanên dewletê wêdetir nebû tiştekî din. Ti carî derfet û îmkan ji bo huqûqa gel û ferd nehat dayîn. Yên hatin dayîn jî timî bi dewletê ve girêdayî bûn û misêwa bi derban ji rêya xwe diman. Ne azadiyeke îfadeyê ya manedar hat qebûlkirin ne jî azadiya rêxistiniyê hat qebûlkirin. Azadiya rêxistinî û îfadeyê ya xwe nasipêre konsensuseke civakî ya berbiçav pirrî caran tesfiye bû. Wexta azadiya rêxistinî û îfadeyê nehat qebûlkirin, ji bo vê konsensusa civakî pêk nehat, ji bo gel, cemaetên dînî û çînên bindest ên qadên

sereke yên demokratîkbûnê ne, azadiya rêxistinî û îfadeyê têra xwe bi cih nehat anîn. Di vê mijarê de her heqê tê îdeakirin heye, her gavavêtin yan qet bi cih nehatin anîn, yan bi darbeyan an jî bi hin qanûnên ji hêsin ên nivîskî û neniviskî bêhn li wan hat çikandin. Der barê Kurd û Kurdistanê de jî ev qanûnên ji hesin ên nivîskî û nenivîskî bi awayekî hişk pêk anîn. Qanûnên herî hişk li ser Kurd û Kurdistanê bi awayekî bêrehm bi cih anîn. Tevî ku bi fizîkî ceza kirin, li ser navê Kurdîtî û Kurdistanîtiyê çi hebe bi bernameyên asîmîlasyonîst gelekî hûrûkûr û bi awayekî berfireh tesfiye kirin, qedexe kirin yan jî bi helandina di nava îdeolojiya fermî de hewl dan tine bikin. Li dijî van polîtîka û qanûnan gelek komik rabûn. Yek ji van koman jî PKK bû. Di nava rêûresma çepgir de rabû. Komek mirovî ew pêkanî, û bi salên 1970'î re dest bi têkoşînê kir. Di gelek qonaxan re derbas bû. Di berdêla êş û azarên mezin de heta roja me ya îro hat û gihişt salên 2009'an. Têkoşîn û berxwedana PKKê ji bo pirsgirêkên demokrasiyê derkevin holê û bêne çareserkirin bi roleke mezin rabû.

Di bin van şert û mercan de DYE û YE weke berê ji aliyê olîgarşîk ve xwe ferz nakin û ji vê xwe dûr digirin. Ji ber ku bûyerên berjewendiyên wan dixin tengasiyê diqewimin û ev jî dihêle ku li çareseriyên demokratîk vekirîbin. Di vê çarçoveyê de atmosfera polîtîk a Tirkiyê cara pêşî ye, dihêle ku şensê çareseriya demokratîk zêde bibe. Ji lewra pêdiviya bi destûreke bingehîn a nû ya xwe bisipêre konsensusa civakî ji bo çareseriyê yek ji şertên pêşî ye. Li ser vî bingehî, bi konsensusa tevahiya beşên civakê, mafên bingehîn ên ferdî û civakî, û mafê azadiya xweîfadekirin û xwebirêxistinkirina demokratîk bêne misogerkirin, ev yek (ji bo çareseriya demokratîk) di asta diyarker de girîng e. Destûreke bingehîn a li ser maf û azadiyên civakî û ferdî pêk bê, wê bi awayekî rastî naveroka huqûqî, laîk, civakî û demokratîk a Komarê kêrhatî û misoger bike.

Di vê çarçoveya destûrî de çareseriya pirsgirêka Kurd jî wê pêkan be, weke ya pirsgirêkên din ên civakî. Komareke ku karibe kirasê teng ê dewleta netewe fireh bike û pêre Kurd mafên xwe yên civakî û ferdî bi dest bixin, bihêlin parçebûna wê, wê stûneke ku di dîrokê de bi rola sereke ya avakirinê rabûye qehîmtir bike û bi vî awayî wê yekparebûneke demokratîk a rastî û mayînde pêk bîne. Li ser vî bingehî, wê karibe xwe ji trawmayên giran, ziyana

mal û can a dawî lê nayê, êş û rondikên çavan xilas bike. Bi vî awayî, ewlehiya millet û welat, bextewarî û xweşhaliya wan wê mayînde bibe.

**Beşa Duyemîn:**

## ÇARÇOVEYA PRENSÎBÎ, TÊGÎNÎ Û TEORÎK

Di rewşa berbiçav a Tirkiyê de ji bo demokratîkbûnê û çareseriya pirsgirêka Kurd pêdivî pê heye ku hin têgîn bi awayekî zelal û eşkere bêne terîfkirin. Di çûna ber bi çareseriyên muhtemel de pêdivî bi prensîb û çarçoveyeke teorîk û faraziyên mirov pê girêdayî bimînin heye. Di dema ravekirina pirsgirêkan de pêdivî pê heye ku ji rojanebûn û demîbûna wan heta bi şêweyê avabûna wan divê gelek têgînên demê ji hev bêne derxistin. Mînak mirov dikare hin pirsgirêkan bi rêvebirname û qanûnan çareser bike, lê pirsgirêkên avabûnê û destûrî bi qanûnan û rêvebirnameyan çareser nabin. Pirsgirêkên avabûnê bi sîstema destûrî re têkildar in, û hewce dike di vê çarçoveyê de bêne çareserkirin.

### ÇARÇOVEYA TÊGÎNÎ

Li Tirkiyê di rabihuriya nêz de navlêkirina pirsgirêkan jî carnan qedexe bû, lewma di asta têgînan de jî mirov di çareseriyê de asê dibûn, dixetimîn. Têgîna ‘Kurd’, dîsa hê beriya wê gelek têgînên di lîteratura çepgir de hatibûn qedexekirin. Hê jî di warê bikaranîna têgîna ‘Kurdistanê’ de tirs û fikar hene, û derdorên fermî ji bikaranîna wê direvin. Li şûna ku bi awayekî zanistî bifikire, bê ka têgîna Kurdistanê çawa derketiye holê, bi gelê li herêmê têkiliyê datîne, ango gengaz e ku mirov nîşan bide, gelek belge hene eşkere dikin ku rêveberiyên Selçûkî û Osmanî gotina ‘Diyarê Kurdan’ gelekî bi kar anîne. Di dema damezrandina Komarê de têgînên weke ‘Mebûsê Kurdistanê’, ‘Meclîsa Kurdistanê’ û ‘Wîlayeta Kurdistanê’ ji aliyê Mistefa Kemal Paşa bi xwe gelek caran hatine bikaranîn. Di dema asîmîlasyonîst û înkarker de qedexebûna têgînên Kurd û Kurdistanê nikare pêşî li bikaranîna wan bigire. Di pêvajoya gavavêtin û çûna ber bi çareseriyê de qedexekirina bikaranîna têgînên Kurd û Kurdistanê tê wê maneyê ku ji serî ve pêşî li çareseriyê tê girtin. Herweha wexta weke nav bikaranîna wan şaş were dîtin û bêne redkirin bi dadgeriya pêwendîdar re ji aliyê hin kesan ve jî tê redkirin.

Yek ji têgînên pêşî divê eşkere were terîfkirin demokratîkbûn bi xwe ye. Li Tirkiyê demokratîkbûn têgîna herî zêde hatiye berevajîkirin û çeloxwarîkirin e. Maneya demokratîkbûnê ya ez di nirxandina xwe de bi kar tînim koka wê çînî nîne. Bi tevahî têkilî û pêwendiyên civakî digire nava xwe. Mohra çi çîn an jî tebeqeyê li ser nîne. Çi pirranî çi jî hindikayî, zimanên cuda, dîn, etnîsîte û netewebûnên wan çi dibe bila bibe, misogerkirina mafên ferdî û heman azadiya rêxistinî û îfadeyê ya tevahiya civakê li beramberî dewletê îfade dike. Rast nîne ku ne dewlet di nava demokrasiyê de, ne jî demokrasî di nava dewletê de were bêtesîrkirin û helandin. Rol û fonksiyona herduyan cuda ye. Dewlet û demokrasî balansê didin hev û di demokratîkbûnê de ev yek ji pirsgirêkên bingehîn ên bivênevê ye.

Di dema çûn û gavavêtina çareseriyê de têgîneke din a girîng a divê were zelalkirin dutêgînên 'Komar' û 'Dewleta-Netewe' ne. Her komar dewleteke netewe nîne. Mînak Komara Romayê bi vî rengî ye. Her dewleta netewe ya ji xwe re komar jî dibêje nikare bibe komar. Têgîna komarê têkiliya xwe bi demokrasiyê re heye, bêyî li elîtên olîgarşîk bialiqe, wê birêveberiya temsîlî ya beşên civakî îfade dike ya ku gel jî di nav de cih digire. Ji bo dewleta netewe jî mînaka berbiçav Îtalya faşîst, Elmanya Nazî û Japonya ne. Di van mînakan de tê dîtin ku dewlet = millet wekhev in. Di nava millet de hebûna komên cuda yên xwedî berjewendî û azadiyên wan qebûl nake. Rê nade ku di nava dewlet û millet de komên xwedî berjewendî bibin xwediyê berjewendî û nakokiyên cuda. Bi xwe dîktatorî ye. Perdeyên demokratîk ên şeklî vê naveroka wê naguherînin. Ji lewra li Tirkiyê di gavavêtina ber bi çareseriyê de bi awayekî rast danasîn û serwextbûna li têgînên komarê û dewleta netewe girîng in. Mînak mirov dikare pirsgirêka Kurd di nava Komarê de çareser bike, lê di nava dewleta netewe ya tê maneya înkarkirina komarê de çareser nabe.

Ji bo çareseriyê zelalkirina têgînên 'welatê hevpar' û 'millet' jî heyatî ne. Gelên ji çandên cihêreng dikarin heman cografyayê weke welatê hevpar qebûl bikin û di dîrokê de ev mînak têra xwe tê dîtin. Mînak cografya berê navê wê weke Anatolya û Mezopotamyayê tê hildan û îro jî bi giştî weke Tirkiye û Kurdistanê tê bi navkirin ji bo gelek xelkan –Tirk, Kurd, Ermenî, Asûrî, Ereb, Cihû, Xiristiyan, Rûm, gelek komên bi koka xwe Qefqasî- welatê

hevpar e. Mirov bi tenê weke welatê Tirk û Kurdan bi nav bike rast û adil nîne. Sînorên dewleta Komara Tirkiyê van deveran digire nava xwe û ev jî nayê wê maneyê ev cografya bi tena serê xwe ya etnîsîteya Tirk e.

Ji bo têgîna 'milletê hevpar' jî mirov dikare terîfeke bi heman rengî bike. Millet jî bi tenê ji yek bi yek welatiyan pêk nayê; herweha û ji vê jî girîngtir, divê weke xelkê welatî endamê wê ne, û heta weke milletê milletan were fêhmkirin. Eger li ser têgîna 'welatê hevpar' were lihevkirin, wê wextê di çarçoveya vê têgînê de û tevahiya xelkên di nava sînorê heman dewletê de û milletê hevpar ê milletan, wê bibe milletê wê dewletê. Çawa ku em dibêjin Komara Tirkiyê, Meclîsa Mezin a Milletê Tirkiyê, em dikarin têgîna Milletê Tirkiyê jî bi kar bînin û ev di warê demokratîkbûnê de dibe têgîneke rê li çareseriyê veke.

Mirov têgîna 'nasnameyê' jî zelal bike wê bi kêra çareseriyê bê. Nasname rengekî civakan ê weke dînî, millî, etnîk, çandî, cinsî û hwd. îfade dike. Lê di vê mijarê de ya girîng ew e, em çawa nêzîkî nasnameyan dibin, gelo em nerm û serê meselê vekirî dihêlin an jî hişk û serê meselê girtî digirin. Di çareseriyên demokratîk de nermbûn û serîvekirina li nasnameyan gelekî bi kêr tê. Serîgirtin û hişkbûn jî têra xwe çareseriyê zehmet dike. Mirov dikare têkiliya pirr reh a nasnameyan bi hev re weke dewlemendiyekê bibîne. Ya girîng ew e ku mirov serwext bibe, bi sentezê nasnameyek di nava ya din de bihele, nêzîkatiyeke gelekî cuda û bi nakok e.

Der barê pirsgirêka têgînan de xusûsa girîng ew e ku mirov têgînan fetişîze neke; mirov diyardeyeke civakî weke têgîneke teng a nepixandî û ji rastiya wê dûr bi nirxeke şoven pêşkêş neke. Mînak, divê mirov hin kategoriyên sûbjektîv û guherbar ên mîna netewe, welat, dîn, ziman û hwd. weke nirxên bingehîn ên dogmatîk ferz neke, ji ber ku ev li gorî ruhê çareseriyên demokratîk nîne.

## ÇARÇOVEYA TEORÎK

Mirov der barê demokratîkbûnê de hin çarçoveyên teorîk zelal bike wê bi kêra çareseriyê bê. Yek ji mijarên bingehîn ew e, divê mirov bi awayekî pirr eşkere û zelal teoriya neteweya demokratîk û teoriya dewleta netewe ji hev derxe. Dewleta netewe

homojentiya welatî ya yek zimanî û yek etnîsîteyê esas digire. Herweha welatiyê behsa wî tê kirin bi bîrûbaweriya fermî ve girê dide û li ser ferz dike heman rîtuelan pêk bîne. Bîrûbaweriya qala wê tê kirin welatparêzî nîne, milliyetgirî û dîndarîtiya şoven e. Dewleta netewe di nava têkilî û nakokiyên xwe de cudatiyên civakî qebûl nake. Li cem xwe her komê weke hev ango wekhevbûyî qebûl dike. Gelekî eşkere ye ku ev teoriyeke netewe ya li gorî îdeolojiya faşîzmê ye. Teoriya neteweya demokratîk gelekî ji vê cuda ye. Teoriya neteweya demokratîk di nava xwe de pirrzimanî, pirrdînî, pirretnîsîteyî, pirrneteweyî, pirrçandî, pirrkomên xwedî berjewendiyên cuda û ferdan dihewîne. Wekhevbûna kom û welatiyan wekhev esas nagire. Terîfa ‘dewlet = netewe’ qebûl nake. Bawer dike ku herdu pêkhatinên cuda ne.

Dewlet û demokrasî, du qadên cuda ne, divê mirov bi nazikî li ser wan raweste. Ya girîng ew e, ev herdu qad rewabûna hevdu qebûl bikin û di nava weznekê de bi gewde bibin. Herweha mirov vê pîvanê bike yek ji hukmê herî esasî yê destûra bingehîn. Teoriya neteweya demokratîk bi qasî welatî, kom, cemaet û civakên sivîl jî girîng qebûl dike û hebûna wan bi destûra bingehîn misoger dike. Têgîna welatî ya neberbiçav weke lafazaniyeke lîberal dibîne û bi endambûna welatî ya kom, cemaet an jî civaka sivîl maneyeke berbiçav didiyê.

Pirsgirêkeke din a girîng jî der barê destûra bingehîn de ye. “Gelo divê dewlet esas be, yan jî ferd?” ev pirs di bingehê teoriya destûrî de heye û mijarek e ku gelekî hatiye guftûgokirin. Teoriya destûra bingehîn a ji tevahiya rêzik û pîvanên dewletê dimeşîne pêk tê û teoriya destûra bingehîn a maf û azadiyên ferd li hemberî dewletê bi rêkûpêk dike, gelekî ji hev cuda ne. Heman tişt ji bo maf û azadiyên kolektîf jî bi heman rengî ye. Di teoriya demokratîkbûnê de eşkere ye ku teoriya destûra bingehîn a divê esas were girtin wê xwe bisipêre têgihiştina maf û azadiyên ferdî û kolektîf li beramberî dewletê diparêze. Dewlet weke desthilatdariya herî zêde rêxistinkirî pêdiviya wê bi parastinê tineye. Jixwe hebûna wê parastinê îfade dike. Mirov rêveçûn û meşa wê bi rêzik û pîvanên bingehîn ve girê bide bi teoriya destûra bingehîn a demokratîk re çep nakeve.

Ji aliyê teoriya demokratîkbûnê ve mijareke din heye ku divê mirov baş lê serwext bibe ew e, di navbera çareserkirina dewletê

ya pirsgirêkên civakî û çareseriyên teoriya demokratîk de ji hev cudabûneke mezin heye. Teoriya dewletdar çareseriya pirsgirêkên civakî bi dewletdarkirina her tiştî dibînin. Mînak mijareke metafizîk a weke dîn ku bîrûbawerî û felsefeyê eleqedar dike jî tê dewletdarkirin û bi vî awayî ji çareseriyê zêdetir vediguherînin pirsgirêkê. Gelek pirsgirêkên din ên aborî, civakî, çandî û neteweyî têne dewletdarkirin an jî bi dewletê ve girê didin û mîna ku hatibin çareserkirin his dikin. Eşkere ye ku ev teorî pirsgirêkan çareser nake, pirsgirêkan zêdetir û girantir dike. Teoriya çareseriya demokratîk dibêje; xwediyê pirsgirêkan ne dewlet civak e, lewma divê pirsgirêk jî ji aliyê civaka pêwendîdar ve were çareserkirin. Yekeya civaka pêwendîdar xwe çiqasî bigihîne rêxistinî û îfadeya azad, ewqasî jî dikare îdea bike ku ev yek rê li çareseriyê vedike. Teoriya dewletdar timî rêzik û pîvanan li ser civaka pêwendîdar ferz dike, teoriya demokratîk jî dibêje; civaka pêwendîdar mafê xwe heye û girîng e ku însiyatîfa xwe bi xwe diyar û ava bike. Di têkiliya bi dewletê re hevdu redkirin an jî berevajiyê wê tineye. Herçiqasî di nava têkilî û nakokiyan de bin jî bihevrebûna di nava lihevkirin û aştiyê de divê. Di vê çarçoveyê de çareseriya demokratîk bi aştiyê ve girêdayî ye. Her aştî dibe ku di çarçoveya çareseriya demokratîk de nebe, lê her çareseriya demokratîk a em jêre 'aştiya bi rûmet' dibêjin heqîqeta pêşketinê ya her hebûnê têkûz dike. Kengî hêzên li hev tên huqûqa hevdu ya pêşketin û hebûnê qebûl kirin wê wextê aştiyeke bi rûmet pêk tê.

Fikareke din a mirov der barê teoriyên dewletdar de dike ew e, hêzên li hemberî xwe yên dikevin bin bandora pirsgirêkê berê wan dide dewletdariyê, ango weke rêya bi tenê ya çareseriyê dewleta xwe ya netewe ferz dike, rê li ber rîskeke welê vedike. Bi awayekî din mirov dikare bibêje, mirov digihîne zêhniyeta li dijî dewletê dewlet. Şensê teoriya demokratîk gelekî zêde heye ku pirsgirêkan ji hev derxe, lewma ne li veqetîna ji sînorên dewletê difikire, ne jî hewce û mecbûrî dibîne berê xwe bide dewleta netewe. Pêşbîniyeke çareseriyê ya nerm şensekî mezin ê teoriya demokratîk e ku dewletê naxwaze, hedefa xwe dewlet nîne, red û înkar nake.

Pirsgirêkeke din a bingehîn a teorîk jî der barê teoriya mafên ferdî û kolektîf de ye. Di vê mijarê de spekulasyoneke mezin heye yan jî hatiye afirandin. Ev mijarek e ku têgihiştina ferdperest a

lîberal ew ji rê derxistiye. Serwextbûneke herî kêm a li civaknasiyê jî dikare bi mirov bide fêhmkirin ku ya ferdî civakî ye, ya civakî jî ferdî ye, û yek a din di nava xwe de dihewîne. Civakîbûn nebe ferd jî ti carî nabe. Eger mirov kesekî bi tena serê wî hefteyekê deyne deverekê mirov ê vê rastiyê yekser fêhm bike. Herweha ji bo mirov fêhm bike ku civak ji hewldan û têkiliyên ferdî pêk tê, hewce nake mirov bibe hozan û zanyar. Bi têgihiştineke berpirsiyar ev yek bi hêsanî tê fêhmkirin. Ji ber ku bi armanca afirandina welatî û neteweya homojen, lîberalîzm huqûqa kom, cemaet û civaka sivîl red dike pirsgirêk giran dibin. Maf û azadiyên van kolektîvîteyan çiqasî bêne pejinandin û kesixandin, şensê desthilatdarî û mêtinkariya herî zêde yê yekdestdariyên dewleta netewe û sermayeyê ewqasî zêde dibin. Eger behsa mafên ferdî bê kirin û behsa mafê kolektîf neyê kirin û heta ji vê jî wêdetir redkirina mafên kolektîf nêzîkatiyeke faşîst e. Heta azadî û mafên kolektîvîteya ferd endamê wê ye, neyên qebûlkirin, pejirandina azadî û mafên ferdî ti qîmeta xwe nîne. Herweha ji aliyê teorîk ve jî ev pêkan nîne. Li vir bi temamî 'Lîstika Elî Cengiz'[1] tê lîstin. Eger were gotin "Tu dikarî

---

[1] **Lîstika Elî Cengiz:** Dem û dewranên berê mirovek heye. Ev kes dikare ji rengekî bikeve rengekî din. Ev kes vê jêhatbûna xwe ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî bi kar tîne. Mînak dikare xwe li ber malê bike bizin û ji jina xwe re bibêje; 'bibe li çarşiyê bifiroşe'. Jina wî dibe li çarşiyê difiroşe, lê ew paşê vedigere malê. Xisleteke din a vî mirovê neşîrîn û xwînsar ew e, sirr û razên xwe hînî her kesî dike. Lê piştî ku hîn dike, kesê sirra xwe hîn kiriyê dikuje. Kesê hîn dike eger bibe çivîk ew jî dibe başoke û wî dixwe. Eger ew bibe dar, ew jî dibe agir û wî dişewitîne. Axir em dirêj nekin. Her kes ji destê wî el-eman dike. Keya ferman dike ku kî karibe vî sihêrbazî bide çîzkirin wê keynika xwe bidiyê. Kes newêre derkeve pêşiya wî, lê derwêşekî xizan bi navê Elî Cengiz ji bo vê dibe namzet. Elî Cengiz xwe li nezanî û korfêmiyê datîne û li ber destê sihêrbaz dixebite hînî fen û fûtên wî dibe. Ji ber ku sihêrbaz wî kêmaqil dibîne di hînkirinê de zêde fikaran nake. Di dawiyê de roja wê derkevin pêşberî keya û li ber hev bidin tê. Elî Cengiz xwe dike beran û derdikeve ser dikê. Sihêrbaz jî dibe gurek û tê. Elî Cengiz xwe dike av û dixwaze gur bixeniqîne, lê sihêrbaz xwe kiriye agir û bersiv daye. Herduyan bi vî awayî demekê li ber hev dane. Di

weke ferd Îslamê bijî, lê weke civakî nikarî bijî” ev hem demagojiyeke faşîst e, hem jî ev xasûkî ye ku bi destekî dide bi destê din jî distîne. Maf û azadiyên ferdî û kolektîf mîna goşt û hestî ne, hevdu temam dikin. Bêguman di vê mijarê de her cure cemaetperestî û kolektîvîstperestiyên ferd înkar dikin û her cure ferdperestiyên civakê înkar dikin di teoriya azadî û mafên kolektîf û ferdî de cih nagirin. Divê mirov teoriyên bi vî rengî red bike û nas neke.

Di dema çareserkirina pirsgirêkên demokratîkbûyînê de wexta mirov çarçoveya teorîk fireh bike, divê baş fêhm bike ku yek ji pirsgirêkan a herî girîng çavkaniya xwe ji civaknasiya navenda xwe Ewrûpa, nexasim jî ji Franseyê digire. Tevî ku tecrûbeya wê ya komara pêncemîn heye jî hem hê xwedî pirsgirêkên laîktî, welatîbûn û cemaetparêziyê ye, hem li hemberî Împaratoriya Brîtanyayê û ji derve li hemberî tevahiya Ewrûpa û dinyayê îdeaya xwe ya hegemonîk ji dest da û di vê de para civaknasiya pozîtîvîst diyarker e. Komara Tirkiyê û beriya wê jî Tenzîmat û herdu ezmûnên Meşrûtiyetê bi awayekî bingehîn ezmûna Komara Sêyemîn a Fransî kiribûn hîmê xwe, herweha weke îdeolojiya modernîteyê jî pozîtîvîzma Fransî qebûl kiribûn, lewma gelekî girîng e ku mirov di pirsgirêkên demokratîkbûnê yên roja me ya îro de li para van bikole û encamên wê zelal bike. Em divê eşkere bibêjin, Komar nod sal in ku di warê demokratîkbûnê de bi leza kîso jî nikarîbûye biçe, lewma mirov heta di vê de bandora pratîk a ezmûnên komargerî û teorîk a pozîtîvîzma Fransî dernexe holê, dîsa jî wê zehmet be ku mirov karibe xwe bigihîne çareseriyên serketî û wê pirsgirêkên

---

dawiyê de Elî Cengiz xwe kiriye gulek û avêtiye destê keya. Sihêrbaz jî xwe kiriye mêşek hungiv bersiv daye. Paşê Elî Cengiz xwe kiriye gilgil û li naverastê belav kiriye. Sihêrbaz jî xwe kiriye mirîşk û dest bi xwarina gilgilan kiriye. Elî Cengiz di vê kêliyê de xwe dike rêvî û mirîşkê dixwe. Ji bo Elî Cengiz û keynika keya çil roj û çil şevî dawet tê kirin. Herçiqasî du tiliyên Elî Cengiz kêmbûne jî dîsa vê yekê pêşî li bexteweriya wî negirtiye. Lê ji hingê ve navê Elî Cengiz bi hîlekarî, fenûfût û dekûdolaban hatiye hildan.

berê yên kor û hilboqî dewam bikin. Ez behsa bi tevahî redkirina ezmûneyên komargerî û pozîtîvîzma Fransî nakim. Lê em ji pêşketinên mezin ên di teoriya demokrasî û şoreşa zanistê ya piştî salên 1950'î de sûdê wernegirin û ji bandorên wê yên neyênî nebihurin, em ê nikaribin şensekî mezin ê azadiya fikir û demokratîkbûnê bi kar bînin.

Bandora Fransî ya di çarçoveya teorîk û pratîk de roja me ya îro jî girîngiyeke xwe ya mezin heye û li benda çareserkirinê ye. Çawa ku tê zanîn, bi awayekî giştî civaknasiya navenda xwe Ewrûpa di roja me ya îro de jî gelekî tê rexnekirin. Maskeya oryantalîzmê ya der barê Rojhilata Navîn de her diçe ji ber rûyê wê tê kirin. Bi kurtî divê ez vê bibêjim: Ew nirxên çandî yên Rojhilanavîn ku ji 15.000 salan û vir ve hatine îspatkirin, nexasim nirxên çandî yên ku ji bo şaristaniyên navendî yên 5000 salên dawiyê sereke ne, ew derfetên çareseriyê yên di nava wê de em înkar bikin û ji nedîtî ve bên ku gelek ji wan jî ji çanda Rojhilata Navîn hatine dizîn, em bawer nekin ku bi çanda Ewrûpa ya bi nêzîkbûna pozîtîvîst a maddeparêziya çor a 500 salên dawiyê, em ê karibin pirsgirêkên xwe, pirsgirêkên civakî yên bingehîn manedar û çareser bikin. Eger ev çand weke esas bê dîtin û gavên çareseriyê bêne avêtin dibe ku rê li ber avahiyên hê nexweşokî bê vekirin. Ya rast ew e, divê mirov xwe ji hegemonya îdeolojîk a navenda wê Ewrûpa rizgar bike, nêzîkatiyên çareseriyê yên pirsgirêkên civakî û nirxên din ên mezin ên insanî yên rêûresma Rojhilat û Rojhilata Navîn bixin rojevê. Eger em ê behsa modeleke Tirkiyê yan jî Rojhilata Navîn bikin, eşkere ye ku divê ev model çavkaniya xwe rastiyên mezin ên civakî û dîrokî be.

Yek ji encamên girîng ê felsefeya pozîtîvîst ew e, berevajî îdeayên wê, ew xisleta wê ye ku rê li ber şêweyê herî hişk ê dogmatîzmê vedike. Di bin navê zanistperestiyê de dogmatîzma modernîteyê rewa kirî, ji bîrûbaweriya dîn hişktir rê li ber fanatîzmekê vekiriye. Mînak maneyên li têgînên netewe, welat, dewlet, çîn, civak û hwd. hatiye barkirin ji maneya li têgîna Ellah hatiye barkirin zêdetir vebirrî ne. Ev têgîn ji xwedê mezintir bi xwedatiyan hatine mezinkirin. Ji lewra hem ev têgîn naveroka xwe ya rastî namînin, hem jî têne giştîkirin û bi vî awayî çarçoveya wan a heqîqetê tê tinekirin. Objekirin dikare ji sûbjekirinê zêdetir rê li ber dogmatîzmeke bi tehlûke veke. Li dinyayê rastiya şer a

pêncsed salên dawiyê û dinya me ya îro ya gihiştiye wî sînorî ku hew karibe dewam bike, ji nêz ve têkiliya xwe bi vê materyalîzma pozîtîvîst re heye.

Em dema dibêjin em ê ji dogmatîzma objektîvîzmê rizgar bibin, em dogmatîzma sûbjektîf tercîh nakin. Divê beriya her tiştî em hewl bidin xwe ji hegemonya îdeolojîk a Rojava rizgar bikin. Wê wextê em dikarin pirsgirêkên civakî û ji van jî girîngtir em ê karibin demokratîkbûnê li gorî xwezaya wê ya civakî bixin rojevê. Demokratîkbûna mayînde, kengî di nava azadiyeke tam a fikrî de li gorî xwezaya wê ya civakî were guftûgokirin, belkî bikeve rêya çareseriyê. Bi teorî û têgînên civaknasî yên navenda wan Ewrûpa di serî de çanda Îslamê mîrateya çandî ya gelekî zêde ketiye serhev, nabe were rojanekirin û ji hev nayê derxistin. Kirinên oryantalîst ên dused salên dawiyê ev rastî têra xwe piştrast kirine. Lihevnekirina 'Îsraîl-Ereb' bi serê xwe jî nîşan dide ku çaresernebûneke çawa pêk hatiye û nîşan dide ku têgînên Îsraîl û Ereb (têgînên netewe yên pozîtîvîst) bi serê xwe mekanîzmayên pirsgirêk afirandinê ne, û mirov dikare wan weke mînakên piştrastkirinê pêşkêş bike. Tu çiqasî rastiyê li Îsraîl û Erebtiyê bar bikî, tu yê ewqasî bikî ku mirov nikaribe ji nav pirsgirêkê derkeve. Ji ber ku hem têgîna Ereb hem jî têgîna Îsraîlê rastiya tê îdeakirin hilnagirin û heqîqetê îfade nakin.

Mirov heman rêbazê dikare ji bo têgînên Tirk û Kurd jî pêşniyar bike. Mirov çiqasî rastiyê li Tirk û Kurd bar bike, wê ev rewş pirsgirêkên li dora van têgînan pêkhatî ewqasî girantir bike. Têgînên Kurd û Tirk di sedsala dawî de rastiyên qels ên bûbûn diyarde, lê ev diyardeyên diviyabûn qels bibin berevajî derxistin asta heqîqetên zêde mezinkirî û ev jî bûye sedema pirsgirêkên mirov nikare xwe bide ber barê wan. Milliyetgirî weke dînê pozîtîvîst pirsgirêkên civakî ji dînên rêûresmê zêdetir giran dike. Bi kurtî, teoriyên demokratîkbûnê ji dogmatîzma objektvîzm û sûbjektîvîzmê çiqasî bêne rizgarkirin ewqasî jî wê bi kêra çareseriyên rastî bên.

Mijareke din a divê mirov di çarçoveya teorîk de bigire dest têkiliya di navbera dîrokîtî û niha, rojanetiyê de ye. Dogmatîzma objektîv a ji pozitivîzmê îlham girtî herî zêde bandora xwe li ser maneya dîrokê û nihayê nîşan dide. Yan niha weke çendahiyeke ketîserhev a hişk determenîst a dîrokê qebûl dike, yan jî dîrokê

weke çendahiyên niha yên ketîserhev û dirêjî rabihuriyê dibe dipejirîne. Ya rastî, di navbera dîrok û niha de cudahiyekê nabîne. Ji lewra bi vî awayî dîrok tê redkirin. Eger mirov bibêje “Niha çi be, dîrok jî ew e” ev rê li ber gulokeke bi tehlûke ya şaşî û çewtiyan vedike. Jixwe avakirina niha ya pozitivîst ji sedî nod li ser înkarkirina heqîqetê ye. Ji aliyê dîrokî ve jî di warê naverokê de yan gelekî înkar dike yan jî berevajî zêde mezin dike, dinepixîne.

Ya rast ew e, mirov bi lêkolîneke hûrûkûr û nazik diyar bike, bê ka dîrok şertên niha çawa ava dike. Ti pirsgirêka civakî nabe ku ji dîroka wê qut an jî berevajî were çareserkirin. Mirov nikare behsa nihayekê bike ku dîroka xwe nîşan nede. Mirov di dîrokê de li niha bigere çiqasî rêbazeke rast be, mirov di niha de jî hinekî li dîrokê bigere rêbazeke lêkolînê ya ewqasî rast e. Lê ji vê encameke weke dîrok = niha dernakeve. Di navbera wan de avakirina şertan vebirrî ye. Ya bi tehlûke ew e ku bêyî şertavakirin rast bêne pîvan mirov wan weke hev bibîne. Hingê mirov li ber çarenûsa xwe stû xwar dike, hewcedarî bi fêhmkirina ti pirsgirêkê namîne û şensê pirsgirêkan ê çareseriyê jî namîne. Divê mirov niha weke azadiyekê weke firsenda çareseriyê bibîne, lê bi şertê ku mirov di nava heqîqetên dîrokî de li şertên wê bigere. Herçiqasî avabûna şertên şidandî di navbera wan de dîtin girîng û hewce be, dîtina cudahiya di navbera wan de jî ewqasî rast e, û wê bi kêra çareseriyê bê.

Der barê çarçoveya teorîk de mirov dikare alîkariyeke dawî li ser pratîk û fikrên di çarçoveya dîn û exlaq de bike. Eger mirov demokratîkbûnê bi tenê di çarçoveya teoriya siyasî de çareser bike, ev ne adil e, ne jî wijdanî ye. Civak bi tenê rastiyeke siyasî nîne, rastiyeke dînî û exlaqî ye. Dîn û exlaq ji wan saziyan e ku hezar salan herî zêde li ser pirsgirêkên civakên xwe rawestiyane û ji wan re li çareseriyê geriyane. Ji lewra mirov van saziyên dîrokî û dest ji wan nabe, rabe paşguh bike û bi tenê bi rastiyên ekonomîk û siyasî analîz bike, ji wan re li çareseriyan bigere, wê ev yek bivênevê kêm bimîne û eşkere ye ku wê rê li şaşiyan veke. Bi vî awayî, wê hewl bidin ji aliyekî ve pirsgirêkan çareser bikin, ji aliyê din ve jî wê rê li ber girantirkirina wan veke.

Yek ji bandorên xirabker ên pozitivîzmê li ser civakê ew e ku rola heqîqetên dînî û exlaqî di çareserkirina pirsgirêkan de daxistiye asta herî kêm. Hukmên dîn û exlaq, nexasim jî di çandên

Rojhilat û Rojhilata Navîn de ji tecrûbeyên civakî yên hezarê salan tên, di çareserkirin û jihevderxistina pirsgirêkan de encamên pîvanên dad û wijdanê ne. Şert e ku mirov serî li wan bide. Oryantalîzmê ev rêyên ji rêûresmê yên çareseriyê bê tesîrkirine û bi vî awayî zordestiya despotîk li ser civakê zêde kiriye, pirsgirêkên demokratîk girantir kirine. Dad û wijdan nebin, jiyana civakî nikare dewam bike. Bi tenê bi nêzîkatiyên hişk ên desthilatparêz, ekonomîst û determînîst mîna hesabên sar ên sermayeyê ya ku mirov wê rê lê veke wê rewşeke kaotîk a ji rê derketî be, jixwe bi pirranî rewşa pêk tê jî ev e.

Ji bo pirsgirêkên civakî yên bi qasî çiyayan mezinbûne bi awayekî demokratîk bêne çareserkirin vegera li dad û wijdan hukmekî bivênevê ye. Mînak, ne hêza wan a ekonomîk û ne jî ya eskerî têrê dike ku gelên fena Ermenî û Asûriyan ji serhatiyên xwe yên trajîk bibihurin. Di çanda Rojhilata Navîn de tevahiya dîrokê modernîteya kapîtalîst pêk nehat, lê gelên herêmê ketin xefika wê û di encama vê de ya bi serê gelên navbihurî de hat trajedî bû. Ji bo ku mirov alîkariya van gelan bike da ku ji vê trajediyê bibihurin dîsa bi serîlêdana li hukmên exlaq ên wijdanî û dadî pêkan e, ku her tim di çanda herêmê de hebûn.

## ÇARÇOVEYA PRENSÎBÎ

Çarçoveya prensîbî divê di çarçoveya teorîk de were pêşdebirin. Çareseriyên demokratîk ên bêne pêşdebirin ji rojanebûn û konjekturelbûna wan wêdetir divê yên avabûnê bin û mayînde bin. Çareserkirina pirsgirêkan divê ne bi kêrî dewamkirina rewşa heyî bê, divê yan bi kêrî rizgarkirina sîstemê û eger nebe jî bi kêra jinûveavakirina sîstemê were. Dewleta fonksiyonel û aramiya mayînde ya civakê çareseriyên bi vî rengî ferz dikin. Li gorî ku demokrasî sîstemeke dewlet û civakê ye, gavavêtinên demokratîkbûnê divê sîstematîk bin. Em ê hinek prensîban rêz bikin, mumkîn e ku mirov wan berfirehtir bike û pêşde bibe. Ez yeqîn dikim ku ji bo sîstema demokratîk wê şert û mercên tesîskirina çarçoveyeke mayînde pêk bînin.

**Prensîba Neteweya Demokratîk:**

Netewetiya yekparebûnê pêk tîne, divê ne weke neteweya dewletê, lê weke neteweya demokratîk were avakirin an jî hedef û armanc ew be ku netewetiyên heyî ber bi neteweya demokratîk ve bêne veguherîn. Têgihiştina nerm a netewe û nasnameya serê wê vekirî ji bo pêkhatina vê armanc û hedefê dibe ku bibin destpêkeke têrê bike. Li vir a girîng ew e, neteweya pê yekparetî çêbibe, divê ne bi zora desthilatdariyê, lê bi demokrasiya bi dilê xwe ava bikin an jî veguherin. Di neteweya demokratîk de azadî û mafên kolektîf û ferdî mîna du rûyên madalyonekê hevdu temam dikin. Bi tenê welatiyan esas nagire; civakên sivîl ên cuda, cemaet û komên gelan weke yekeyên kolektîf dibîne û wan weke çavkaniya dewlemendiyê dihesibîne. Welatî çiqasî bibin endamên fonksiyonel û kêrhatî yên kolektîvîteyê ewqasî jî statuyeke bi hêz pêk tînin.

**Prensîba Welatê Hevpar (Welatê Demokratîk):**

Divê têgihiştina welatê hevpar (welatê demokratîk) bingeh bê qebûlkirin. Ango li şûna welatekî xwe bisipêre etnîsîteyeke yek zimanî û yek dînî, welatekî xwe bisipêre pirr zimanî, pirr neteweyî û pirr dînî rastir e. Ev yek wê zêdetir bersiva yekparebûn, xuşk û biratiyê bide. Ev yek wê temendirêjtir be. Têgihiştina welatî ya xwe disipêre hisa etnîsîteyeke bi tenê, wê beşekî mezin ê welatiyan bike yên din. Ev têgihiştina qutban çêdike û yên din zêde dike, bi rola rastî ya cihêkariyê radibe. Têgihiştina welatiyên ji yek tornayê derketî qebûl dike, eşkere ye ku çavkaniya xwe faşîzm e. Cihêrengî û cudatî dewlemendiya hem xwezayê hem a civakê îfade dike. Hisa welatparêziyê ne bi nijadeperestî ne jî bi şovenî, lê bi hisa girêdana bi ax, ekolojî û pêşketinê rastir e.

**Prensîba Komara Demokratîk:**

Eger mirov komarê weke şiklê dewletê bi dewleta netewe îfade bike, nexasim bi şêweyê dewletdariyeke hişk a neteweyî vê bike, ev hêmanekî din e ku pê yên din têne afirandin. Ji bo komarê rejîma dewletê ya herî di cih de dewleta netewe nîne, dewleta demokratîk e. Dewletek nabe ku hem dewleta netewe be, hem jî dewleta demokratîk be. Ev herdu reng û sifet li hev nakin, bi hev re nakok in. Dewleta demokratîk li sîstema demokratîk vekiriye, pêre li hev dike. Hedefeke bi vî rengî ya dewleta netewe nîne, berevajî

civaka demokratîk di nava xwe de asîmîle dike. Prensîba çareseriya demokratîk bi komarê re li hev dike, lê bi heman awayî bi şêweyê dewleta netewe re li hev nake. Ya girîng ew e, divê mirov li komarê weke rêxistina sîwan a demokratîkbûnê bifikire û ava bike. Di çareseriya demokratîk de girîng e ku şêweyên dewletê yan jî komarê îdeolojîk neyên kirin, bi etnîsîte û dînekî ve neyên girêdan. Divê komar ji bo tevahiya welatiyan weke rêxistiniyeke demokratîk a bibe sîwan were qebûlkirin û ya herî rast ew e, di vê çarçoveyê de terîfeke huqûqî were kirin. Bi vî awayî, wê prensîba civakî û prensîba laîktiyê bi cewherê xwe di nava terîfê de cih bigirin. Kengî komar bi vî awayî eşkere hat terîfkirin, mirov dikare wê bi etnîsîteyekê, dînekî yan jî îdeolojiyekê ve girê nede. Mînak têgînên 'Kurd' û 'Tirk' yên etnîsîte û kok di wan de hene, dîsa îfadeyên din ên mîna dîn û îdeolojîk di nava xwe de dihewînin fena Îslamtî, Xiristiyantî û Sunnîtiyê li navê komarê neyên zêdekirin, wê zêdetir yekpare be, û zêdetir karibe bihewîne.

**Prensîba Destûra Bingehîn a Demokratîk:**

Tevî ku demokratîkbûn tevgereke siyasî ye, eger xwe nesipêre destûreke bingehîn a bi lihevhatineke civakî hatiye pêkanîn, wê nikaribe bibe rejîmeke rêveberiyê ya sîstematîk û mayînde. Destûrên bingehîn ên demokratîk lihevkirina civaka demokratîk û dewletê îfade dikin. Azadî û mafên ferdî bi tenê dikarin bi civaka demokratîk manedar bibin. Naxwe li hemberî dewletên hêza wan gelekî zêde, parastina gelan mumkîn nîne. Ji bo dewlet jî ne weke saziyeke timî pirsgirêkan diafirîne û giran dike, lê weke qadeke pispor û tecrûbeyên kombûyî ya çareseriyê pêk tîne bimîne, destûra bingehîn a demokratîk amûrek e, ku dest jê nabe. Destûra bingehîn a demokratîk dewletê fonksiyonel dike, wê dike pispor û xwedî tecrubeyeke kombûyî, bi vê xisleta xwe mîna zemqê dewlet û civakê bi hev ve dizeliqîne.

**Prensîba Çareseriya Demokratîk:**

Prensîba çareseriya demokratîk zêdetir ji bo demokratîkbûna wê civaka sivîl e ku armanca wê ya dewletbûnê nîne, naxwaze bibe dûvikê dewletê ango modeleke çareseriyê ye, armanca wê civaka demokratîk e. Di nava dewletê de li guhertinên bingehîn ên şeklî nagere, ji vê zêdetir berê xwe dide çareseriyên ku di nava civakê de

rê li ber rejîmeke demokratîk a bimeşe veke. Der barê dewletê de herî zêde destûreke bingehîn a demokratîk dixwaze. Hemin divê ji bo pêkhatina destûra bingehîn a demokratîk hewldanên tatmînkar ên teorîk û pratîk hebin, û ev destûra bingehîn divê ji dewletê zêdetir xweşhaliya civakî bike armanca xwe. Dijberê prensîba çareseriya demokratîk, ferzkirina çareseriyên dewletparêz û desthilatparêz in. Çareseriya demokratîk weke prensîb bi parvekirina desthilatdariyê re mijûl nabe, heta jê dûr disekine. Ji ber ku desthlatdarî çiqasî zêde bibe, ji demokrasiyê dûrketin jî ewqasî pêk tê. Eger bi tenê li ser navê hukûmet û dewletan civak bêne tenzîmkirin, hingê a derkeve holê wê nîzamekî antî-demokratîk be. Ji ber ku hêzên civakî tevlî nava meseleyê nehatine kirin. Wexta hukûmet û desthilatdarî ber bi erênî ve bêne tenzîmkirin dibe ku pêşî li demokratîkbûnê vebe, lê demokratîkbûn bi xwe pêk nayê. Armanc û hedefên çareseriya demokratîk nabe ku parvekirina derfet û îmkanên dewletê yan jî desthilatdariyê bin. Mirov xwe bi dewletê ve bigire, blokeke wê pêk bîne, nabe ku ev weke hedefa çareseriya demokratîk were dîtin.

Di prensîba çareseriya demokratîk de xusûsa bingehîn ew e, destûra bingehîn divê bihevrebûneke aştiyane ya saziyên dewletê û saziyên demokratîk misoger bike. Di navbera hebûna herdu saziyan de rewabûneke qanûnî heye. Hebûna xwe li ser înkara hevdu pêk nayînin. Ne hewce dike li ser navê demokrasiyê dewlet were tesfiyekirin, ne jî hewce dike li ser navê dewletê demokrasî were helandin. Ji ber ku li Rojava ev herdu sazî zêde di zikhev de ne, ev dihêle ku demokrasî di nava dewleta netewe de weke saziyeke şeklî bimîne. Yek ji pirsgirêkên aktuel ên demokratîkbûnê ew e, divê ji vê ketina nava hev zêdetir, hebûna van herdu saziyan ji bo ku bi hev re bimeşin, ji nû ve bê tenzîmkirin. Çawa ku ji bo demokrasiyê prensîb e, dewletê bi sînor bike û pêşiyê li zêdegaviya wê bigire, herweha ji bo dewletê jî ewqasî prensîb e ku koma tecrûbe û pisporiya wê ji demokrasiyê re bi rola ban û sîwanê rabe. Di pêvajoya dîrokî de ya wê bi ser bikeve wê civaka demokratîk be. Xulase, dewlet û saziyên demokratîk wê di nava aştiyê de lê bi awayekî tengezar bi hev re bin, ev rewşa wan wê rê li ber reqabetê veke û ji vê jî ya bi hêz derkeve û pêş bikeve civaka demokratîk bi xwe ye.

**Prensîba Bihevrebûna Azadî û Mafên Ferdî û Kolektîf**

Prensîba maf û azadiyan di çareserkirina pirsgirêkên demokratîkbûnê de roleke xwe ya heyatî heye. Di dema pêkanîna vê prensîbê de mirov kolektîf û ferdî ji hev cuda bike, ev yek ji çareserkirina pirsgirêkan wêdetir wê girantir bike, û wê bihêle ku mirov nikaribe ji nav derkeve. Mirov dikare vê yekê ji bêhejmar mînakên li dinyayê hîn bibe. Herweha bi vî awayî ji hev cudakirin li gorî xwezaya civakan nîne. Ferd di civaka mirov de ti carî û li ti mekanî, mafdar an jî nemafdar, bi azadî yan jî bêyî azadî, bêyî kom nejiyaye. Jixwe xisleta mirov ew e, heywanê herî pêşketî yê civakî ye. Ji lewra çi heq û azadiya ferd bi dest xistiye yan jî pê ditamije, heta bi civaka xwe re parve neke ti maneyê îfade nake. Ferdê ji civakê hatiye şuştin çiqasî bê mane be, azadî û mafên bi destxistine jî ewqasî bê mane ne û jê nayê wan pêk bîne. Berevajiyê vê jî rast e: Eger komek maf û azadiyên bi destxistine nîşanî endamên xwe nede, ew maf û azadî ti nirxê xwe nînin. Maf û azadî bêyî ferd pêk nayên. Eger ferd ji maf û azadiyan bêpar bêne hiştin ev tê wê maneyê ku civaka endamê wê ne jî ketiye heman rewşê û eger civak, kolektîvîte ji maf û azadiyan bêpar bêne hiştin ev tê wê maneyê ferdên endamên wê jî dikevin heman rewşê. Bi kurtî, maf û azadî ne bêyî ferd ne jî bêyî civakê dibin. Ev nirxên welê ne, bêyî hev nabin, bêyî parvekirinê pêk nayên.

**Prensîba Azadiyê û Serxwebûna Îdeolojîk:**

Di bingehê vê prensîbê de zêdetir rizgarbûna ji hegemonyadariya îdeolojîk heye. Ev ji aliyê modernîteya kapîtalîst ve li nava dinyayê hatiye ferzkirin. Xisleteke wê ya çor a materyalîst heye û bi xwe îdealîst e, lê xwe weke 'zanista pozitivîst' nîşan dide. Divê mirov baş fêhm bike ku heta ji vê rizgar nebe, demokratîkbûn û azadiya ku bi xwe di nava wê de ye, wê pêk neyê. Zanistperestiya pozitivîst prensîba sereke ya hegemonîk a şaristaniya Ewrûpayê ye. Ew heta vê prensîbê hegemonîk neke, hêmanên xwe yên din ên bingehîn kapîtalîzm, îndustriyalîzm û dewletdariya netewe nikare li nava dinyayê bi xwe ve girêdayî ava bike û bimeşîne. Hegemonya îdeolojîk li Rojhilata Navîn bi zanista oryantalîst zêhnan fetih dike. Piştî vê yan jî bi vê re bi hêmanên din ên bingehîn fetih, dagirkerî û mêtingeriya xwe bi gelek awayan pêk

tîne. Mêtingertiya nû ya bi hêmanên xwecihî yên kevin ên despotîk re li gorî xwezaya xwe timî hevkariyê dike, pirsgirêkên demokratîkbûnê girantir dike. Her cure berxwedana li dijî wê pêş bikeve aliyekî xwe yê demokratîk heye. Ji bo ev aliyê demokratîk pêş bikeve, bi hêz bibe, karibe xwe bigihîne awayên xwe li ser piyan bigire û sîstematîze bike, divê xwe ji hegemonya îdeolojîk qut bike. Ji bo rêyên alternatîf ên îdeolojîk manedar bibin divê kategoriyên xwecihî, bajarî, pirr neteweyên herêmî û welatê hevpar bihewîne. Naxwe dibe ku hegemonyayeke din a îdeolojîk pêş bikeve.

Fikrên nijadperest û dîndar ên ji rêûresmê jî herî kêm bi qasî hegemonyadariya pozitivîst a îdeolojiya modernîteya kapîtalîst hegemonîk in. Di nava kategoriyên sereke de ku behsa wan hat kirin, hewldanên îdeolojîk ên xwe disipêrin azadîxwaziyê, mirov dikare wan weke îdeolojiyên azadiyê binirxîne. Bi tenê mirov dikare bi van îdeolojiyên azadiyê pirsgirêkên demokratîkbûnê û rêyên çareseriyê bide fêhmkirin û bi cih bîne. Azadiya îdeolojîk nebe gavên demokratîkbûnê dikarin bihilkumin û bikevin kontrola îdeolojiyên hegemonîk. Azadiya îdeolojîk bi heqîqeta xwezaya civakî re têkildar e, û bi pêkanîna civaka demokratîk û bi cihanîna wê misêwa xwe îfade dike. Heqîqeta civakî bi awayekî azad îfadekirina rastiyên civaka demokratîk e.

**Prensîba Nihatî û Dîrokîtî:**

Pirsgirêkên demokratîkbûnê û çareseriyên muhtemel bi têkilîdanîneke rast di navbera dîrokîtî û nihayî de ji nêz ve têkildar e. Zêhniyeteke pirsgirêkên têkildarî dîrokê û çareseriyên wê yên muhtemel paşguh bike, sansur bike, bi tenê wê ne pirsgirêkên demokratîkbûnê, ji serwextbûna li tevahiya pirsgirêkên civakî wêdetir, wê wan girantir bike û wê bihêle ku mirov nikaribe ji navê derkeve û bivênevê wê wan ber bi krîz, şer û pevçûnan ve bibe. Bûyerên di dîrokê de bûne-çûne şertên bingehîn in ku nihayê diyar dikin. Ya niha yan jî rojane, rewşa dîrokê ye ku xwe bi derfetên pirsgirêk û çareseriyê pêşkêş dike. Cudahiya bi tenê ev e: Em nikarin mudaxeleyî rabihuriyê bikin, lê em dikarin mudaxeleyî niha û rojaneyê bikin. Bi bingehê fikrî û hêza maddî ya mudaxeleyê ve girêdayî em dikarin rojaneyê biguherînin. Mirov dikare guhertinê bi lez bike, berê wê bide aliyekî din, azad bike yan

zêdetir bike kole. Ev xusûsek e ku bi temamî bi statuya hêzên mudaxeleker re têkildar e. Ya girîng ew e, mirov bersivê bide vê pirsê “Rabihurî, dîrok wê bi xeleka xwe ya sereke çawa di niha de were nîşandan.” Divê mirov nihayê weke îfadeya qad û pirsgirêkên dîrokê yên nexasim em pêre mijûl dibin, analîz bike û ev kilîta çareseriyê ya pirsgirêkên civakî ye. Kesên bi awayekî rast li dîroka xwe serwext nebin û nenivîsin, kêm îhtîmal heye li nihayê rast serwext bibin, wê azad û demokratîk bikin. Azadî û demokratîkbûnên bi pelandinê bi dest ve bên wê mayînde nebin; çawa bi dest ve hatine wê welê jî ji dest biçin.

Divê mirov baş zanibe ku civak bi xwe dîroka herî pêşketî ye. Heta ku vê civaka bi xwe dîrok e, bi vî rûyê wê, bi vê heqîqeta wê nas neke, mirov ê nikaribe wê ji pirsgirêkên wê rizgar bike, pêkan xuya nake mirov wê bigihîne çareseriyên demokratîk û şêwazê wê yê jiyanê. Ji ber vê yekê ye ku çalakiya pêşî ya despotan tinekirina bîr û hafiza civakî ye. Lewma ya divê demokrat jî pêşî bikin xwedî li hafiza civakî derkevin ango bi tevahiya rastiyên xwe xwedî li dîrokê derkevin. Zirar û ziyana herî mezin a modernîteya kapîtalîst ew e, hafiza mirovatiyê daye ber derbên kujer, niha weke bêserûbiniyê nîşan daye, ya rastî mirov dibêje qey dawiya dîrokê hatiye îlankirin. Li gorî wê her tişt bi tenê ji nihaya civiyayî ser hev pêk tê. Nexweşiya jêre ferdperestî tê gotin têkiliya xwe bi vê têgihiştinê re heye. Ferdperestiya dibêje “Li kêfa xwe binêre, wekî din tewş e” bi înkara civaka dîrokî re têkildar e. Ji zêhniyeteke bi vî rengî mirov nikare heqîqeta civakî û îfadeya wê ango civakparêziya demokratîk hêvî bike. Ji vî alî ve, ferdperestiya lîberal înkara demokrasiyê ye. Mirov di dîrokê de kêliyê, di kêliyê de jî dîrokê bibîne prensîbeke rast a civaknasiyê ye.

**Prensîba Exlaq û Wijdan:**

Civaknasiya Rojava prensîba wijdan nas nake. Ew bi mejiyê analîtîk radibe. Wijdan pêdiviya xwe bi mejiyê hisî heye. Civaknasiya modern a weke felsefeya analîtîk destpê kir di roja me ya îro de bûye teknîkeke rêveberiyê. Wijdan yek ji wan prensîbên sereke ye ku pê civak ava dibe. Wijdan weke hukmekî adil ê civakê bi kêr tê. Wexta ku tine bê hesibandin weke mekîneyeke cinawir a bi tehlûke dixebite. Mirov dikare wijdan weke cewherê dîn û exlaq jî bihesibîne. Eger em dîn û exlaq weke rêûresmeke hişk û zuha

bidin aliyekî, em ê bibînin ji van herdu saziyan a li dawiyê dimîne wijdana civakî ye. Yê/ya hêza wî/wê ya eskerî, siyasî û aborî tinebe wijdan qada bi tenê ye ku penahê wê bibe, xwe bisipêriyê. Eger ev qad têk biçe, wê wextê di civakê de bi tenê prensîba hêzê wê hukim bike. Hingê jî herkesê bibe gurê her kesî. Ango kî karibe bi kê.

Demokrasî ne ew rejîm e ku bê wijdan bimeşe. Sîstemên hêz û sermayeyên yekdestdar li ser înkara wijdan hatine damezrandin. Mirov demokratîkbûnê bi xwe dikare weke tevgera bi destxistina wijdanê civakî û bêtesîrkirina vê înkarê bide naskirin. Civaka gelekî mezin a li derveyî yekdestdariya hêz û sermayeyê bi tenê mirov dikare bi tevgera wijdanê biparêze. Têkoşîna civakî ya roja me ya îro bi awayekî têkoşîna bi destxistina wijdanê ji destçûyî ye. Demokratîkbûn heta nebe tevgera bidestxsitina nirxên wijdanî yên jidestçûyî bi temamî nagihîje maneya xwe, ferd û hindikayî jî wê nikaribin maf û azadiyên xwe bi dest bixin. Ev sedem hemû nîşan didin ku di çareserkirina pirsgirêkên demokratîkbûnê de prensîba wijdan a nirxên civakî exlaq û dîn jê dawerivîne divê mutleq di dewrê de be.

Eger wijdan nekeve dewreyê sedemên qirkirinan ji hev nayên derxistin. Kengî prensîba wijdan bikeve nav tevgerê modernîteya kapîtalîst dikare li qirkirin û hovîtiyên xwe hemûyan mikur bê û rê li dadê vebe. Modernîte di tevahiya pirsgirêkên civakî de prensîba hêzê dike bingeh. Yê hêza wî hebe bi ser dikeve yan jî çareser dike, yê hêza wî tinebe têk diçe, ji kirasê rastiyê derdikeve. Nexweşiya herî mezin a di bingehê modernîteyê de ev e. Eger civak bi vê prensîbê rabe wê bikeve tevlîheviyekê ku xweziya xwe bi serdema kevir bînin. Eger em dixwazin ji pirsgirêkên civakî yên bi kok re û di serê van pirsgirêkan de ji demokratîkbûnê re bersivên adil û mayînde bibînin, divê em li şûna prensîba hêzê cih bidin prensîba wijdanê. Çanda Rojhilat ji vê prensîbê re xerîb nîne. Berevajî di tevahiya pirsgirêkên xwe de li rêza pêşî cih daye vê prensîbê. Em ji bo hesabên sar ên hêz û kapîtalîzmê nikarin ji vê prensîbê bigerin. Em dema hewl bidin pirsgirêkên demokratîkbûnê yên li Tirkiyê çareser bikin, divê li serê tevahiya prensîban em cih bidin prensîba wijdanê û di çareseriyê de em neçar in serî li vê prensîbê bidin.

**Prensîba Xweparastinê ya Demokrasiyan:**

Ji bicanê yekşane heta bi perçikên jêr-atoman ên weke bê can têne qebûlkirin - ku hatiye fêhmkirin ew bê can nînin ji vê jî wêdetir bingehê prensîba bicanbûnê ne -, ti hebûn bê xweparastin nîne û ev jî heqîqeteke tê zanîn e, û bi zanistî ev hatiye piştrastkirin. Hebûnên mîna civakên mirovan ku mejiyê xwe gelekî zêde ne, û di asteke bilind de nerm in, di her kêlî û mekanê jiyanê de xuya dike ku bê xweparastin nînin. Şer bi xwe jî ji nêz ve bi têgihiştina çeloxwarîkirî ya xweparastinê ya sîstemên şaristaniyan re têkildar e. Civakên demokratîk û ferdên wan ên azad di dema şaristaniyên çînî de ji bo xwe bergiriya xwe bikin bi pirsgirêkên mezin ên parastinê re rûbirû bûn. Heta civakên komin ên destpêkê di jiyana xwe ya demdirêj de tevî nakokiyên di navbera xwe de, ji ber tehlûkeyên kujer ên ji hebûnên xwezayê yên bican û bêcan dihatin, xweparastin di her kêlî û her mekanî de weke wezîfeya yekemîn qebûl kirine.

Hêmanên modernîteya kapîtalîst dewleta netewe, kapîtalîzm û îndustriyalîzm li ser ferdên azad û wekhev ên civakên ekonomîk, ekolojîk û demokratîk mêtinkariyê û zordestiya yekdestdar dimeşîne û li beramberî vê pirsgirêkên xweparastinê di serê mijarên heyatî de ye. Jiyana bê xweparastin bi tenê bi koletiya heqdestê bi encam nabe, di heman demê de rê li ber her cure bê karî, nexweşî û rizînê vedike. Ji vê jî xirabtir, gelek qirkirinên fizîkî û çandî bi xwe re tîne. Modernîte weke sîstem bi giştî civak û ferdan, bi taybetî jî zêdetir bi awayekî dijwar hebûnên civakên demokratîk û ferdên wan ên azad, neçarî parastinê dike. Eger di xweparastinê de bi ser nekevin, bi tenê ne azadiya wan, hebûna wan jî dikeve tehlûkeyê ango qirkirina wan dikeve rojevê. Hêmanên yekdestdar ên modernîteyê ji bo xwe dewamî bikin qîma xwe bi gefxwarina li civaka demokratîk û ferdê wê ya azad nayînin, di demên xwe yên dereng de şertên ekolojîk ên ji bo jiyanê dest ji wan nabin jî diqedîne. Qedandin û tinekirina şertên ekolojîk bi awayekî demdirêj tê maneya qirkirina tevahiya jiyanê.

Civaka demokratîk û ferdê azad, divê ne bi tenê ji bûyerên şoreşgerî û beridînî re lê tevî wan ji pirsgirêkên xweparastinê re jî çareyê bibînin. Dema dawî ya krîza avabûnê ya modernîteyê, xweparastin daniye serê tevahiya pirsgirêkan. Her kom çawa divê

bibe yekeya ekonomîk, ekolojîk û demokratîk, herweha divê weke yekeya xweparastinê jî pêk bê. Di heman demê de her ferdê azad û wekhev çawa divê di yekeyeke ekonomîk, ekolojîk û demokratîk de cih bigire, tevî vê, herweha divê di yek an jî zêdetir yekeyên xweparastinê de cih bigire. Ji bo tevahiya zindî û yên bican, xwexwedîkirin, xweparastin û xwezêdekirin şertekî jiyanê ye. Ev hersê şert herî zêde jî ji bo civaka mirov di cih de ne, û dest ji wan nabe.

**Beşa Sêyemîn:**

## LI TIRKIYÊ PIRSGIRÊKA DEMOKRASIYÊ û ÇARESERIYA DESTÛRA BINGEHÎN A DEMOKRATÎK

### LI TIRKIYÊ DERKETINA HOLÊ YA PIRSGIRÊKA DEMOKRASIYÊ, PÊŞKETIN Û ENCAMÊN WÊ

Pirsgirêka demokrasiyê weke diyardeyeke gerdûnî, kengî di rêveberiya jor a komên qebîleyan de ji hev cudabûn çêbû derket holê. Qebîle di nava xwe de xwedî demokrasiya xwezayî ne. Lewma di civaka qebîleyê de bi cudabûna di rêveberiyê de pirsgirêka demokrasiyê derdikeve holê. Bi gavavêtina ji hiyarerşiyê ber bi dewleta despotîk ve vê pêvajoyê kûr dike. Sîstemên şaristaniyê bi xwe ji aliyê vê pêvajoyê ve diyar dibin. Şaristanî heta bi qonaxa kapîtalîzma li Ewrûpayê li ser civakê xwedî hukmekî bi sînor e. Civak jî potansiyela hêza xwe ya exlaqî û polîtîk diparêze. Şaristaniya Ewrûpayê bi cihêwaziya dayî diyardeyên netewe û dewleta netewe –li gorî kapîtalîzm û îndustriyalîzmê-, civaka exlaqî û polîtîk hûrûkûr parçe dike, hûrûkûr xwe ber nava civakê dide. Yekdestdariya sermayeyê û desthilatdariya îdeolojîk bi vê ketin û çizirîna nava civakê, rê li tehekumekê vedike di dîrokê de hemtayê wê nehatiye dîtin. Modernîte ferd dixe rewşa wî/wê ya herî qels û lawaz. Bi reformên bi sînor hewl dide pêşiyê li têkoşînê bigire. Demokrasiya Ewrûpayê bi reforman hewl dide ferd û civakê li ser piyan bigire. Dewleta huqûqê, maf û azadiyên ferd cewher û çarçoveya vê demokrasiyê pêk tînin. Yekîtiya Ewrûpayê rewşa sîstematîk a vî bingehî îfade dike. Lê ji ber ku ji jor ve sîstema yekdestdar serdestiya xwe dewam dike, sîstema demokratîk a derdikeve holê, ji sîstemeke desthilatdariyê ya gelekî tengkirî û kontrolkirî wêdetir naçe. Pirsgirêka demokrasiyê hebûna xwe dewam dike.

Klanên Sibîryayê yên xweser ji salên 7000'î B.Z. ve bi pêvajoya helîna qeşayên li qûntara çiyayên Başûrê Sibîryayê re û bi bandora Şoreşa Neolîtîk a bi koka xwe Rojhilata Navînî di salên 4000'î B.Z. de dest bi şoreşa xwe ya neolîtîk dikin. Di salên 2000'î B.Z. de ji hiyarşiyê gav diavêjin şaristaniyê, gav diavêjin dewletê. Şaristaniya

pêşî ya navenda wê Çîna îro di salên 1500'î B.Z. de derket ser dika dîrokê. Li dora wê prototîpên ezbetên gelên îro Japon, Korye, Vîetnam, Moxolîstan û Tirkistanê hebûn û timî li dijî wan têdikoşiya. Mirov vê têkoşîna wan a li beramberî şaristaniya Çînê dikare weke demokrasiya xwezayî binirxîne. Di nivîsên dîrokê yên Çînê de cara pêşî bi navê Hûn behsa pêşiyên Tirkan tê kirin. Ji ber ku ezbetên Hûnê bi demokrasiya destpêkê radibûn timî bi şaristaniya Çînê re şer dikirin. Bi hêsanî şaristanî qebûl nedikirin. Ev ezbet kengî tengav bûn berê xwe dan Rojavayê. Hûnên Rojava di salên 400'î P.Z. de li Ewrûpaya Navîn û heta bi Romayê li qadeke berfireh hebûna xwe dewam kirin. Lê ew jî di nava şaristaniyê de heliyan. Li Rojhilat şaristaniya Çînê, li Rojavayê jî şaristaniya Slavan ew timî asîmîle kirin. Beriya vê pêvajoyê bi dînên Hindû û Manîheîzmê xwestin wan bişkînin, lê şikestina bingehîn bi Îslamiyetê pêk tê. Hê berê di salên 550 û 740'î de ceribandinên dewletavakirinê yên Gokturk û Uygur ji konfederasyonê wêdetir naçin.

Pro-Tirkan bi awayekî bingehîn bi Îslamiyetê re gavavêt şaristaniyê. Bi awayekî ciddî têkilîdanîna wan bi Îslamê re û di sedsala 9. de qebûlkirina wan a Îslamiyetê destpêka şaristanîbûna wan e. Pirsgirêkên Tirkîtî û demokratîkbûnê yên bi Qerexaniyan dest pê kirin û heta roja me ya îro dewam kirin bi vê pêvajoya şaristaniyê re ji nêz ve têkildar e. Şaristaniya Tirk-Îslam a Rojhilata Navîn bi giştî bi Selçûk Beg û Begtiya wî tê destpêkirin. Pro-Tirkan berê jî di nava şaristaniyên Rojhilata Navîn de hewl dane xwe nîşan bidin. Lê baş tê zanîn ku cara pêşî weke girse û ezbetan bi Selçûk Beg û kurên wî li Rojhilata Navîn bi cih bûne. Selçûk Beg bi xwe wexta gav diavêje Rojhilata Navîn û hewl dide ji xwe re welatekî bibîne bi du ekolên dînî re rûbirû ye: Ew jî Mûsewîtî û Muhammedî bûn. Navên Mûsewî yên li çar kurên xwe kirine, nîşan dide ku di destpêkê de ji Dewleta Tirk a Yehûdî Hazara bi awayekî ciddî bi tesîr bûye. Ji lewra mirov nikare tê derxe, bê ka çiqasî misilman bûye. Mumkîn e ku mirov Tirkîbûnê bi Misilmantiyê ve girê bide. Ji ber ku hê berê, ji bilî Goktirkan ku temenê wan kin e, em li ti şaristaniyeke din a bi navê Tirk rast nayên. Mirov dikare texmîn bike ku ev nav ji aliyê Ereban ve li wan hatiye kirin. Lê divê mirov baş zanibe ku berî serdema milliyetgiriyê dest pê bike, civakan nasnameyên xwe ne bi paşnavên xwe, bi navê dînên xwe

diyar dikirin. Hingê yan mirov dibûn Îslam an jî dînekî din. Ji ber ku rastiya civakî welê hatibû avakirin.

Begtiya Selçûkî ji sedsala 11. û pêve hewl dide li ser ezbetên di bin destê xwe de serweriyeke hişk bimeşîne. Ezbet bi dijwarî li ber vê radibin. Li gorî ku di dîrokê de hatiye nivîsandin, ezbetên pêşî yên Oguz-Tirk ên di sala 1071'ê de derbasî Îranê bûn, ji serwerî û serektiya hişk gilî û gazin kirine. Ev girseya pêşî ya li derdora pênc hezarî heye, xelasiya xwe di çûna xwe ya li Îranê de dîtiye. Eşkere ye ku ezbetên derbasî Rojhilata Navîn dibin hê ji destpêkê ve li dijî şaristaniya weke bajarbûn-çînîbûn-dewletbûnê pêk tê bi dijwarî li ber xwe didin. Ev ezbetên qebîleyan ên weke Tirkmen têne binavkirin, şaristanî dixwaze wan bike serf û zilmê li wan dike. Ev ezbetên behsa wan tê kirin, pêşiyên gelên îro ne. Ezbetên arîstokratîk Tirkmen piçûk didîtin û nedixwestin xwe jî weke Tirk bi nav bikin. Li şûna vê zêdetir navnasên weke Ereb û Fars, Şah û Siltantî tercîh dikirin. Tirkî ji bîr kirin. Ji Erebî, Farisî û hemûyan Osmaniyeke şikestî bi kar dianîn. Zuriyet û ezbetên resen ên Tirkîtiyê li cem ezbetên Tirkmenan man.

Eger em vê dîrokçeya kin di çarçoveya pirsgirêka demokrasiyê de şîrove bikin, em dikarin weha bibêjin:

Bi gavavêtina Rojhilata Navîn di nava ezbetên Tirk de ji sedsala 11. û pêve di warê çînî de cihêbûneke ciddî pêk tê. Mirov dikare vê pêvajoyê weke destpêka pirsgirêka demokrasiyê qebûl bike. Ezbetên Tirkmenan Siltanê Selçûkî yê dawî Siltan Sencer[2] heta mirinê di qefesekê de li cem xwe girtin, ya rastî ev baş rave dike ka çiqasî azadî û jiyana demokratîk ji bo wan bi qîmet e.

---

[2] **Siltan Sencer:** Siltanê Selçûkiyan e. Kurê Melîkşah e. Di sala 1086'an de li Sincarê ji dayik bûye. Di 1157'an de wefat kir. Dema wefat kir 91 salî bû. Li tirba xwe ya bi xwe dabû çêkirin li Mervê hat veşartin. Arîşeya di navbera begên Oguz û Selçûkiyan de mezin bû. Li ser vê, di navbera Oguz û Selçûkiyan de li wilayeta Belxê di sala 1153'an de şer qewimî. Di encama şer de Selçûkî şikestin û têkçûn. Siltan Sencer di şer de êsîr ket destê Oguzan. Lê Oguzan Siltan bi roj datanîn ser textê wî û bi şev jî dibirin dixistin qefeseke hesinî. Siltan xwe li vê ranegirt û berî wefata xwe bi salekê ji vê esareta sê salan dewam kirî reviya.

Ezbetên Tirk bi Îslamiyetê re dabeşî du komên bingehîn bûn û ev cewherê pirsgirêka demokrasiyê pêk tîne. Arîstokrasî, bi gotineke rastir eskerî, arîstokrasiya dînî û xwediyên erdan di nava dewletê de civiyan û yekdestdariya desthilatdariyê pêk anîn. Xizanên li derveyî sîstemê jî têne hiştin an weke ezbetên berê yên koçer ji zomekê diçin zozanekê ji zozanekê diçin zomekê yan jî weke xizanên bajar û gundan debara xwe bi cotkarî û zenaetkariyê dewam dikin. Di nava tevahiya gelên Rojhilata Navîn de dabeşbûnên bi vî rengî pêk hatine û rê li ber gelek serhildan û re-van vekirine. Dabeşbûnên mezhebî jî bi vê rastiyê ve girêdayî ne. Mezhebê Sunnî weke mezhebê tebeqeya jor fermî dibe. Mezhebên muxalif ên weke Elewîtî, Şîîtî, Îşraqiyûn, Mewlewîtî û Bektaşîtî bi awayekî nîv-veşartî hewl didin hebûna xwe dewam bikin. Di serdema navîn de têkoşînên demokratîk di çarçoveya van fenomenên mezhebî de tê pêşkêşkirin. Hewldan hene demokratîkbûna demê bi van mezheban were pêkanîn. Herweha mirov dikare jiyana qebîleyên koçer jî weke têkoşîna demokratîk binirxîne. Şêweyekî herî rast ê ravekirinê ye ku mirov cewherê berxwedanên tevahiya qebîleyên serdema navîn weke têkoşînên demokratîk şîrove bike.

Eger mirov Îslama fermî weke îdeolojiya yekdestdar şîrove bike, mirov dikare îdeolojiyên mezhebî yê nîv-veşartî jî weke vegotinên demokratîk binirxîne. Ev tevgerên gel ên demokratîk ku heta serê sedsala 19. hatin, bi tehekuma modernîteya kapîtalîst li Rojhilata Navîn dikevin pêvajoyeke nû. Li aliyekî rejîmên împaratoriyê ku hêzên hegemonîk ên berê ne, bi gavavêtinên dewletdariyên netewe belav dibin, li aliyê din, dewletên netewe yên piçûk ên şûna împaratoriyan digirin pirsgirêka demokrasiyê girantir dikin. Dewletên netewe duqat xerîbketinekê temsîl dikin: Li aliyekî weke desthlatdariya ji şaristaniyên berê mayî xerîbketin, li aliyekî din jî xerîbketina bi rengê dewleta netewe ye ku modernîteya kapîtalîst ferz dike. Yekdestdariya desthilatdariyê ya qat bi qat dikeve serhev, li ser çanda gel rejîmên ku qirkirinê bidin meşandin, pêk tînin. Tirkiye bi sedsala 20. re wê vê pêvajoyê têra xwe bibîne. Tevgera xwe weke Cemiyeta Îttîhad û Teraqî bi nav dike vê rastiyê îfade dike.

Bi tevahî nîşane didin xuyakirin ku Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê prototîpa Partiya Faşîst a Îtalya û Partiya Sosyalîst a Nas-

yonal a Elmanyayê ya di salên 1920'î de ye. Li gelek welatên ku dereng bûn kapîtalîst, bûyerên bi heman rengî xweber neqewimîn, ev bi pêkhatina hebûna modernîteya kapîtalîst re têkildar e. Di vê de berpirsiyariya bûrjûwaziya burokratîk diyarker e. Ji ber ku ew wer hesab dike ku ji krîza modernîteyê ya kûr dibe, bi tenê dikare xwe bi şerên dijwar ên çînî û qirkirinan bi hêz bike.

Herweha di vê de divê mirov para tevgera sosyalîzma pêkhatî jî piçûk nebîne. Ji ber ku hêmanên modernîteya dixwest bibe sîstem, dewleta netewe û îndustriyalîzm weke hedefa bingehîn hilbijartibû. Ne tenê demokrasî, demos, ango gel jî weke çand gihiştiye qonaxa li ber man û nemanê. Mirov dikare demên di wext û navbera herdu Şerên Cîhanê de weke dînbûna hegemonya modernîteya kapîtalîst ji bo ji sedî sed pêkanîna hersê hêmanên (kapîtalîzm, dewletdariya netewe û îndustriyalîzm) xwe li nava dinyayê, şîrove bike. Li gelek netewe, çand û gelan heta bi nava dilê wan vê dînîtiyê gef xwarin û yên karîbûn keysê lê bînin ji bo jê rizgar bibin xwe zêde mezin kirin û di encamê de jî xwe radestî sîstema serdest kirin. Enternasyonala III. ya ji modernîzmê nebihurî, bereya gel û kedê ya di sala 1930'î de xwest pêşde bibe û ezmûnên bereya antîfaşîst pirr zêde tiştek li demokrasiyê zêde nekirin. Di dema şerê sar ê piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn de demokrasiya lîberal û demokrasiya gel a sosyalîzma pêkhatî bi xwe înkara demokrasiyê bûn. Meşandina şerên hegemonyayê bi cîla demokrasiyê bi tenê meseleyeke taktîkî bû. Hilweşîna sosyalîzma pêkhatî, ya rastî hilweşîna lîberalîzmê jî bû. Dinya piştî salên 1990'î bi krîza sîstemê ya avabûnê ku her diçû kûr dibû, diçelqiya, li nav hev diket, pirsgirêka demokrasiyê jî bi tevahiya giraniya xwe diket rojevê. Demokrasiyê li nava tevahiya dinyayê hewl da xwe ji aliyê naverok û şêweyê ve ji nû ve terîf bike û weke modernîteya demokratîk sîstematîze bike.

Di vê pêvajoya çelqiyayî û tevlîhev a dinyayê de Tirkiye li aliyekî bi pirsgirêka man û nemanê re rûbirû bû, li aliyê din jî weke Komar gihişt wê şensê ku destpêkeke nû bike. Mirov dikare şexsiyeta dîrokî ya ev destpêk da kirin Mistefa Kemal Paşa û Komarê weke hebûnên wekhev şîrove bike. Di roja me ya îro de jî analîzkirina van herdu hebûnan hê girîng e. Mistefa Kemal bi xwe diyar dike ku wî fikra komarê weke sirr û razekê veşartiye û roja munasib îlan kiriye. Ya rastî wexta vê dibêje, girîngiya em behsa

wê dikin destnîşan dike. "Komar li dijî çi û çawa pêk hat?" pirseke din heye ku weke vê pirsê hînê bersiva wê nehatiye dayîn û hê bê xwedî ye û ew jî ev e, "Komarê çavkaniya xwe ji kîjan gerdûnîbûnan digirt?" Gelo weke peyv demokrasî bû yan jî demokrasî nebû? Eger ne demokrasî bû çima gihişt vê rewşê? Ev pirsên bingehîn in ku divê rast bersiva wan bê dayîn. Di roja me ya îro de ji bo mirov li pirsgirêka demokrasiyê ya tevahiya jiyana li Tirkiyê kilît dike, bi temamî serwext bibe, divê mirov rastiyên di bin van pirsan de ji hev derxe.

Ji bo mirov vê mijarê ji hev derxe û zelal bike, lêkolîna dîroka nêz a Tirkiyê bi serê xwe têrê nake. Weke her welatê li dinyayê, rewşa li Tirkiyê û welatên mîna wê, mirov dikare bi şaristaniya hegemonîk a Ewrûpayê ve têkildar serwext bibe. Di vê demê de sîstema hegemonîk gava xwe ya herî mezin û bi hêz a globalbûnê diavêje. Mirov bûyerên li quncikeke herî dûr diqewimin ji sîstema hegemonîk serbixwe bigire dest, eşkere ye ku wê kêm bimîne. Duyemîn xusûsa girîng ew e, têkiliyên muhtemel ên veguherînên Tirkiyê bi gavavêtinên orjînal ên Ewrûpayê re. Di vir de têgîna kilît Jakobenîzm e. Jakobenîzm bi awayekî herî eşkere di Şoreşa Franseyê de derekt holê û hebûna xwe di tevahiya şoreşên modernîteyê de da hiskirin. Ji lewra em heta li Jakobenîzmê serwext nebin, em nikarin li Jakobenîzm û encamên wê yên li goşeyên din ên dinyayê û nexasim jî li ya li Tirkiyê û encamên wê serwext bibin.

Berê pêşî divê mirov qebûl bike ku Jakobenîzm weke fenomenekê dibe gerdûniya modernîteyê. Ji bo mirovatî ji rêûresma teokratîk a mohra xwe li şaristaniya navendî ya 5.000 salî daye bibihure, Jakobenîzm bi rola navendî rabûye. Ji aliyê çînî ve beşa navîn a dixwaze bibe desthilatdar bûrjûwaziyê temsîl dike. Beşa radîkal a îhtîlalkariya bûrjûwayê ye. Hem îdeolojîk hem çalakî radîkalîzmê îfade dike. Ji bo wan şertên desthilatdariyê yên herî di cih de atmosfera dagirkeriyê ye ku hêzeke biyanî tê hesibandin rê li ber wê vekiribe. Eger atmosfereke eşkere ya dagirkeriyê nebe şensê desthilatdariyê yê bûrjûwaziya Jakoben nîne, yan jî hema bêje tineye. Kengî tevahiya civakê dagirkeriya eşkere weke felaketekê qebûl kir, hingê xwedê daye Jakobenan. Ji bo weke desthilatdariyekê derkevin ser dika dîrokê atmosfer heta dawiyê di cih de ye. Civak li xelaskarekî digere. Monarşiyên teokratîk ku

xwediyên desthilatdariya ji rêûresmê ne, bihêlin ew pêşiyê li dagirkeriyê bigirin, ew ji mêj ve bi rola hevkartiyê rabûne. Ji ber ku ew berjewendiyên xwe bi tenê bi hevkartiyeke xurt a bi hêzên biyanî re dikarin biparêzin. Lewma di nava civakê de cih li wan teng bûye. Ew êdî rewa nayên dîtin. Di rewşeke welê de ji bilî tebeqeya jor a hevkar, beşa helwesta wê ya îdeolojîk û rêxistinî herî di cih de tebeqeya navîn e. Di nava van tebeqeyan de hêza herî baş xwe perwerdekirî û rêxistinkirî jî bûrjûwaziya Jakoben e. Mirov dikare prototîpa Jakobenan di Şoreşên Hollanda û Brîtanyayê de bibîne. Mînak, Crommwell di salên 1640'î de, ango gelekî berî Şoreşa Franseyê, lîderê şoreşa herî mezin a Jakobenên Brîtanyayê ye ku serê qralê xwe firandine. Ya rastî, şoreşa herî mezin a Jakoben a sala 1792'an a li Franseyê pêkhatî nîne, ev şoreşa li Brîtanyayê ye. Franse versiyona duyemîn an jî sêyemîn a vê modelê ye.

Bi awayên cuda be jî mirov dikare Hollandayê weke welatê şoreşa rastî yê lê Jakobenîzm meyiyaye, şîrove bike. Jakobenîzm ne bi tenê bi sedema ku tebeqeya ji rêûresmê ya jor nikare bi rê ve bibe dibe tevgera dehilatdariyê, lê belê di heman demê de bi sedema ku tebeqeya xizanan a herî jêr jî ji aliyê îdeolojîk û rêxistinî ve têra xwe xwe bi gurçûpêç nekiriye. Kengî li hersê welatan şert û mercên bi heman rengî pêk tên, Jakobenîzm bi sloganên herî dijwar ên serxwebûnxwazî, azadîxwazî û wekhevîxwaziyê xwe çeng dike pêş û beşê herî mezin ê civakê bi pêşengiya xwe radike ser piyan. Kêliya nazik û krîtîk, ev kêlî ye ku pirraniya civakê ji bo desthilatdariyê rabûye ser piyan. Ev kêlî di heman demê de ew kêlî ne ku guhertinên herî mezin ji bo pêkhatinê dikevin malzarokê. Her tişt heta bi mejiyê hestî diricife. Ji bo ya nû bizê hewcedarî bi vê ricif û lerzê heye. Ev kêliya krîtîk ji bo Franseyê di Nîsana 1792'an de destpê dike. Qralê hevkar ne bi tenê bi tevahiya arîstokrasiya Ewrûpayê re hevkarî kir, di heman demê de bi vî awayî li dijî şoreşa di sala 1789'an de destpêkirî ket nava hewldaneke dijşoreşê û tevî vê jî direviya. Beşa nerm a çîna navîn Jîronden ji gavavêtinên radîkal xwe dûr nagirin. Kominîstên li herî jêr Babeufî di rewşeke gelekî jar û lawaz de ne. Rewş ji bo Jakobenan heta dawiyê li cih e. Axir di dîrokê de yek ji demên herî mezin ên terorê di van şert û mercan de pêk hatiye. Lîderê Jakobenan Robespierre kengî di Tîrmeha 1794'an de birin giyotînê

ev pêvajo bi dawî dibe. Salên 1792-1794'an di heman demê de dema Komara Şoreşger a Yekemîn e. Herçiqasî piştî 1794'an bi demên cuda derbas bibe jî ya lê tê gerîn nîzama nû ye. Ev lêgerîn heta roja me ya îro bi Komara Pêncemîn hatiye, û hê jî dewam dike.

Di analîzkirina Jakobenîzmê de divê mirov hin xalên sereke bi xetên stûr diyar bike. Ya yekê, ne tevgereke hindikayî, tevgereke girseyî ye. Ya dudiyê, herçiqasî sloganên azadîxwazî û wekhevîxwaziyê gelekî bi kar bîne jî ya rastî tevgereke desthilatdariyê ya radîkal a çîna navîn e. Mirov dikare ji vê demê re dema dîktatoriyel jî bibêje. Ya sisiyan, piştî ku bi tevahî talûkeyên hundir û derve ji bo welat û civakê ji holê radibin tevgera Jakoben jî serberjêr diçe. Bi giştî cihê xwe ji hêzên herî rasta xwe re, pirr kêm were dîtin jî ji hêzên çepa xwe re dihêlin. Çawa ku sala 1870'î di Komina Parîs û beriya wê de, sala 1848'an di şoreşên hin welatan de li cem hin tevgerên temenkin hat dîtin.

Xusûseke din a girîng ku bi Jakobenîzmê ve girêdayî ew e, çawa ku radibe ser piyan ango dibe desthilatdar xwe nû, tevahî netewe û dewleta netewe îlan dike. Ya rastî ev netewe û dewletdariya netewe, navê şêwe û pîrozbûna nû ye ku dikeve şûna forma civakê ya rêûresmê ekumenîzm, ummetgerî û gerdûniyê. Netewe û dewletdariya netewe ya tê îlankirin dînê nû ye. Li şûna dînê berê weke dînê nû tê fêhmkirin. Ji bo bibe desthilatdar şert e ku civakê weke pîroztiyeke nû ji aliyê şêweyê ve îlan bike. Naxwe wê ummeta berê wê bi ser serî de bîne xwarê. Dewletdariya netewe ya Franseyê gelekî hişk pêk hat, ji ber ku şert û mercên îhtîlalê zêde hatibûn terorîzekirin. Terorîzebûna îhtîlalê yek ji xisletê radîkalîzma çîna navîn e. Li gorî desthilatdariyê carnan ji bo pêkhatinê pêdivî bi dijwarbûn û bêrehmbûnê heye. Dîsa ji ber heman sedeman wexta şensê wê yê bibe desthilatdar namîne bi lez ber bi pasîfîzmê ve diçe. Wexta ku hêviya desthilatdarbûnê namîne, şert û mercên wê qels dibin, beşa herî zû ditepise û bi pirranî xwe teslîmî hêzên li rasta xwe dike dîsa ji nava Jakobenan derdikevin. Beşekî wan ê pirr kêm, radîkal dibe û tevlî kominîstan dibe an jî bi xwe vediguhere tevgera kominîstan. Li Ewrûpayê û paşê di pêvajoya tevahiya şoreşên dinyayê de mirov dikare vê çerxê her bibîne. Di rewşa berbiçav a Ewrûpayê de xusûseke din a divê were zelalkirin têkiliya faşîzm û Bolşevîzmê bi Jakobenîzmê re ye.

Bêguman Jakobenîzm di sala 1794'an de neqediya, hebûna xwe dewam kir. Bi awayên cuda mohra xwe li tevahiya şoreşên piştî xwe xist. Bi rola bavê du çînên radîkal ên desthilatdarperest û neteweprerest radibe. Neteweperestiya Elman û şêweyê wê yê herî radîkal Nazîzm çiqasî bi koka Jakobenîk bin, neteweperestiya Rûs û Bolşevîzm jî ewqasî bi koka xwe Jakobenîk in. Kokên faşîzma Îtalyayê bi awayekî eşkeretir digihîjin Jakobenîzmê. Nazîzm û faşîzm (mirov dikare tevahiya şêweyên faşîzmê li vê zêde bike) şêweyê herî terorîstbûyî yê desthilatdariya bûrjûwa ya bûye yekdestdar a Jakobenan, Bolşevîzm (mirov dikare ji bo yên mîna wê hemûyan jî bibêje) jî terorîzma beşên li ser navê tebeqeya jêr bûne desthilatdar îfade dike. Di herduyan de netewe û dewletdariya netewe bi awayekî gelekî zêde hatine avakirin û îfadekirin, lê li ser navê çînên cihê. Lê belê kes nikare înkar bike ku kokeke wan a hevpar a Jakoben heye. Li vir xusûsa girîng a divê were rohnîkirin ew e, Bolşevîk bi rastî çiqasî bûn kominîst. Ez bi xwe yeqîn dikim ku Bolşevîk tevî hemû îdealên xwe bi koka xwe Jakoben in, û bi temamî nebûne kominîst û nikarîbûne xwe di warê kominîstbûnê de veguherînin. Ji ber ku desthilatdarparêz û netewegirên çînî ne, xwe weke dewleta netewe dihûnin, dadimezrînin. Dewleta netewe jî rejîma bingehîn a dewletê ya kapîtalîzmê bû ku li ber radibûn. Dîsa ji ber ku ji îndustriyalîzmê re pêşengiyê dikin bivênevê weke modernîstên radîkal derdikevin holê û ji şoreşê tiştek li pey wan namîne. Di serî de Sosyalîzma pêkhatî ya Yekîtiya Sovyetê û Çînê ezmûn in ku di vî warî de vê rastiyê piştrast dikin.

Têkiliya Jakobenîzmê bi lîberalîzmê re bêhtir eşkere ye. Jakobenîzm bi rola ekola terorîst a şoreşger a lîberalîzmê radibe. Ango bazkê radîkal ê lîberalîzmê ye. Divê mirov li lîberalîzmê weke extepotekî bifikire; ne bi milekî, bi gelek milan tevdigere. Du tevgerên lîberalîzm nagire nava xwe hene, ew jî fikra dinya Katolîk û kominalîstên demokratîk in.

Fikra lîberal a awayên cuda yên îdealîzm û materyalîzma objektîv û sûbjektîv a îdeolojiya pozitivîst bi kar tîne, hegemonya îdeolojîk a analîza wê herî zehmet e. Ji ekolên herî radîkal ên mîna anarşîstan bigirin heta bi tevgerên herî aktuel ên mîna feminîst û ekolojîk ekolên pirr dijber xuya dikin û şêwazên jiyanê di nava

moderníteyê de dihelînin. Ev jî piştrast dike ku yek ji çavkaniyên rastî yê hêzê yê kapîtalîzmê hegemonya îdeolojîk a lîberalîzmê ye.

Bi vî awayî pirr baş derdikeve holê, divê mirov çêbûna Tirkiya modern di çarçoveya rastiyên global û Jakobenîk ên kapîtalîzmê de ji hev derxe. Kapîtalîzmê di salên 1870'î de gavavêt qonaxa yekdestdar a emperyalîst. Împaratoriya Osmanî li hemberî vê kapîtalîzmê bi Konferansa Berlînê ya di sala 1878'an de têra xwe ket pêvajoya ji hev belavbûnê. Ekolên dewletdariya netewe ji derve û hundir saziyên kevin ên rêûresmê yên împaratoriyê dihejandin. Tevdîrên reformê di pêşîgirtina li vê rewşê de bi tesîr nedibûn. Hedefa sereke rizgarkirina împaratoriyê bû. Ekola weke Tevgera Jon Tirkan dihat binavkirin, milê ekola bi pêşengiya Mazzînî ya li Ewrûpayê bû û di nava împaratoriyê de xwe nîşan dida. Weke milê neteweperest ê Jakobenîzmê şikil girtibû.

Yek ji van ekolan Îttîhad û Teraqî ye. Mirov dikare wê weke milliyetgiriya Osmanî binirxîne. Xisletên wê yên xweser balê dikişînin. Xisleta wê ya yekê ew e, ekol an jî tevgerek e ku ne di nava civakê de lê belê di nava dewletê de xwe bi rêxistin kiriye. Xisleta wê ya girîng a dudiyê jî ew e, ji destpêkê ve xwe bi şêweyekî neteweperestiya dewletê bi rêxistin kiriye. Xisleta wê ya sisiyê, bi destê dewletê weke bûrjûwa û kapîtalîzm sîstem veguherandiye. Ev hersê xislet, karekterê rastgir ê faşîst ê Jakobenîzma Îttîhad û Teraqiyê eşkere radixe pêş çavan. Tevî ku nazîzma Elman û faşîzma Îtalyayê weke tevgerên girseyî destpê kirine û paşê weke dewletê xwe bi rêxistin kirine jî, Îttîhad û Teraqî bi her tiştê xwe di nava dewletê de pêk hat. Ev jî milliyetgiriya Jakoben a herî paşverû nîşan dide, ya rastî karekterê wê yê faşîst ê ji Jakobeniyê derketiye, diyar dike. Di nava dewletê de bi dewletê re paralel weke dewletekê xwe bi rêxistin dike û ev jî nîşan dide ku rêxistineke bêhempa ye ku kêm mînakên wê têne dîtin. Li gorî dewleta ji rêûresmê, ne derketina dewleteke pêşverû lê belê dewleteke faşîst sembolîze dike. Bi vê rewşa xwe yekemîn e, diyardeyeke mînak e. Badilhewa nîne ku Hîtler paşê ew ji xwe re weke model hilbijart. Modela pêşî ye ku nîşan dide, dewlet çawa di nava dewletê de pêk tê.

Ya hê balkêştir ew e, bi destê dewletê di nava dewletê de neteweperestiyek ava kiriye. Çar damezrînerên pêşî yên rêxistinê bi koka xwe Tirk nînin. Tevî vê jî hewl didin neteweyeke Pro-Tirk

ava bikin. Ev nîşaneyên pêşî yên pirsgirêka demokrasiyê ne ku wê paşê girantir bibe. Netewe û dewleta paralel a ku wan ava kir, ji serî ve hem bi dewleta rêûresmê , hem jî bi rastiyên sosyolojîk re li hev nedikir. Bi temamî li hev hatiye çêkirin û hûnandin. Xisleteke diyar a karektera faşîst bi vî awayî xwe derdixe holê. Cemiyetê di serê sedsala 20. de berê xwe da komîtakariyê. Avakirina komîtayan dihat maneya şerê navxweyî. Di nava dewletê de şerê navxweyî, mirov dikare bi komîtakariya çekdarî ya sala 1906'an bide destpêkirin. Di nava dewletê de pêkhatina şerê navxweyî jî mînakeke gelekî balkêş e, û kêm caran mînakên wê hatine dîtin. Ev gavavêtin wê paşê ji darbekariyê re bibe model, wê rê nede demokrasiyên mîna yên li Rojavayê jî pêk bên.

Weke kakilê ne fermî dewleta fermî bi kar tîne û ev jî tê wê maneyê ku demokratîkbûn bi awayekî pirr giran tê binpêkirin. Ya ji vê jî xirabtir, dewlet ji dewletbûnê tê derxistin. Rengê herî eşkere yê dewletê ew e, fermiyeta wê heye û bi rêzik û pîvanên diyar civakê bi rê ve dibe. Tevî qusûrên wan hemûyan, rêûresma siltanên Osmaniyan a rêvebirina dewletê gelekî diyar bû. Exlaqekî wan ê diyar û di karektera dînî de be jî rêzik û pîvanên wan hebûn. Di kêm rewşan de serî li taktîka bêbextiyê didan, ew jî di encama hin tevgerên şexsî de pêkan bû. Şêwazê rêvebirina hem civakê hem jî dewletê ya Îttîhad û Teraqiyê ji serî heta binî bi bêbextî û darbekariyê bû. Ev rastî derketina ji dewletbûnê îfade dike. Di ketina Şerê Cîhanê yê Yekemîn de jî ev rastî şûtî tazî li ser kar e. Wexta ku mirov hûrûkûr binêre wê bibîne, ya rastî Jakobenîzm bi rêbazên xwe yên herî faşîst û riziyayî dewletê rizgar nake lê wê tesfiye dike. Çetebûna dewletê tê wê maneyê ku dewlet ji holê radibe. Meşrûtiyeta Yekemîn û Duyemîn, tevî hemû niyetên baş, berevajî armancên xwe bi kêra têgihiştineke ne meşrûtiyetkar, dewleteke çetekar an jî bêdewletbûnê hatiye. Çetekariya burokratîk kiriye ku dewleta nû xweziya xwe bi dewleta kevin bîne.

Têkçûna faşîzma Elman a di sala 1945'an de, di sala 1918'an de li ser navê Tirkîtiyê bi serê faşîzma Îttîhad û Teraqiyê de hat. Jixwe nedibû ku bi awayekî din jî bibûya. Dewlet bi çetebûna di nava xwe de ji mêj ve têkçûbû. Di sala 1918'an de li Anatolya û Mezopotamyayê ne bi tenê dewlet, civak jî bi dagirkeriyeke eşkere re rûbirû bûbû. Krîza dewlet û demokrasiyê bi awayekî herî kûr

pêk dihat. Li hemberî vê rewşê hêzên civakî û saziyên dewletê yên mayî ji bilî nefsî mudafa ango xweparastinê çareyeke din nedîtibûn. Li beramberî vê tabloyê pêşengtiya Mistefa Kemal eşkere xisleteke Jakoben tîne bîra mirov. Dagirkeriya eşkere gav bi gav pêş dikeve. Elîta rêveber a ji rêûresmê ji zû ve bi hêzên biyanî re ketiye nava hevkariyê. Tevgera komînîst a gelekî zelûl e, pozîsyona wê ya pêşengtiyê nîne. Bi tenê li dawiyê alternatîfek dimîne, ew jî li ser navê çîna navîn a herî zêde radîkal û rêxistinkirî ye û şensê wê heye li ser navê tevahiya civakê bikeve nav tevgerê. Mistefa Kemal hem weke şexsiyet ji aliyê şêwazê gihiştin û mezinbûnê ve hem jî ji aliyê îrade û serwextbûnê ve li gorî van şert û mercan pêşengek bû, peyda nedibû. Dîsa ji ber ku bi Fransî dizanîbû jêre hêsan dibû ku li Sêyemîn Komara Fransî ya prensîbên Jakobenîzmê qebûlkirî baş serwext bibe. Li komargeriya Jakoben baş serwext bûye. Ji aliyê rêxistiniyê ve jî helwesta wî girîng e. Hem ji ber ku bûye muxalifê rêveberiya Îttîhad û Teraqiyê, hem jî bi sedema bi belavbûna vê rêveberiyê re koma xwe ava kiriye, gelekî bi kêra pêşengtiya Jakobenîk hatiye. Ya di vê rewşê de dimîne bê kirin gavavêtina di warê pêşengtiya pratîkî de ye.

Tê zanîn Mistefa Kemal di sala 1919'an de çawa dest bi pêşengtiya pratîkî kiriye. Li vir pirsa bingehîn a divê were kirin ev e, gelo ji fermandariya dagirkeriyê ya Ingilîz û Siltan Wehdedîn çawa bihurî ye. Bersiva vê pirsê ya ji gelek spekulasyonan re bûye babet, bi gavavêtina peşengtiya pratîkî re girîngiya xwe namîne. Pêvajoya di sala 1920'an de bi îlana Meclîsa Millet a Mezin a Tirkiyê re (TBMM) destpê dike, ya rastî ji dijberiya dagirkeriyê wêdetir şoreşeke civakî îfade dike. Wesf û hedefên meclîsê vê rastiyê piştrast dikin. Xusûsa herî girîng a divê were diyarkirin ew e, di vê şoreşê de hêzên bi rola bingehîn rabûn ne hêzên dewletê yên belavbûyî, hêzên civakî bûn. Eger hêzên civakî destek nedana, saziyên dewletê yên têra xwe têkçûyî û bi nexweşî nikarîbûn tevgera şoreşger bimeşanda. Wer xuya dike ku Mistefa Kemal li vê rewşê gelekî baş serwext bûye û lewma mirov fêhm dike ka çima çavkaniya bi tenê ya rewa meclîsê dibîne. Herçiqasî meclîs têra xwe xurt nebe jî haya xwe ji şert û mercên îhtîlalê heye. Bi pirranî hêzên civakê temsîl dike. Wesfê demokratîk ê meclîsa pêşî eşkere ye. Bi şêweyê xwe yê avabûnê yê dînî, millî û çînî rewşa sînorên Mîsaq-î Millî ya ji xwe re esas dibîne zelal dike. Heta dawiyê li ber

dagirkeriyê radibe. Xisleta dînî ya civakê li pêşiya xisleta millî ye. Kurd û Tirkên misilman hêzên bingehîn ên civakî ne. Li beramberî kominîzmê dijmin nîne. Di şexsê Lenîn de bi Kominîst Enternasyonalê re dost e. Mohra çîna navîn li ser heye. Beşekî girîng ê eşrefan û burokrasiyê ji vê çînê bûn û tevger ji pirsgirêka manûnemanê re weke çare didîtin. Eger em hinekî din berbiçav bikin, em dikarin bibêjin, hêzên li Meclîsa Millet a Mezin a Tirkiyê hatine cem hev bi koka xwe ji çîna navîn in; ji milliyetgirên Tirk ên laîk, ji ummetparêzên Îslamî yên ji eşraf û eşîran pêşengên Tirk û Kurdan, ji tebeqeya jêr sosyalîstên sempatiya wan ji Bolşevîzmê re hene. Herçiqasî pirr diyar û berbiçav nebûbin jî ev ekol û nûner di şertên dagirkeriya eşkere de weke hêzên civakî ketine nav tevgerê.

Erê gelekî li ber da û pirr pê mijûl bû, lê pêşengtiya Mistefa Kemal hat qebûl kirin. Bi vî awayî di senger û mewziyan de bi cihkirina hêzên civakî rê li pêşiya dagirkeriya eşkere girtiye. Dema navbera salên 1920-1922 pêvajoya şoreşekê ye ku aliyên wê yê şîddet û eskerî xwedî giraniya ne. Weke pêvajoyeke Jakobenîk serketî derbas bûye. Ji aliyê demokratîkbûnê ve vê demê firsendeke girîng afirandiye. Bi îlana komarê di sala 1923'an de vê firsendê dewam kiriye. Lê belê bi Destûra sala 1924'an ji Destûra 1921'ê gelekî paşve çûne. Bi hilbijartinên di sala 1923'an de pirrdengiya li Meclîsa Millet a Mezin Tirkiyê hat tepisandin, di sala 1925'an de bi bahaneya isyanê Kurd li derve hatin hiştin û bi vî awayî ev firsenda dîrokî hatiye berevajîkirin, sîstemeke hegemonîk a tek partî hatiye tercîhkirin.

Hînê jî rojeveke girîng a guftûgoyê ye; çawa û çima ketin vê pêvajoyê. Lê axir di Çileya sala 1921'ê de bi bêbextiyekê kuştina lîderê Partiya Kominîst a Tirkiyê PKT'ê Mistefa Suphî û kadroyên pêşeng ên partiyê, di sala 1923'an de mişextkirina du şexsiyetên girîng ên tevgera Îslamî Saîd-î Nûrsî û Mehmet Akîf, sedem û hêzên li pişt wê çi dibin bila bibin di sala 1925'an de provakasyon û komployên di isyana Kurd de, eşkere piştrast dikin ku hevgirtina demokratîk têkçûye û pêvajoya hegemonîk esas hatiye qebûlkirin. Eger mirov di nirxandina pêvajoya hegemonîk de Mistefa Kemal berpirsiyar bibîne, wê ev bihêle ku mirov sedemên esasî piştguh bike. Mistefa Kemal di pêşîgirtina li dagirkeriyê û îlana komarê de têra xwe bi rola xwe ya dîrokî rabûye. Lê nikarîbûye hevgirtina demokratîk a Komarê biparêze û pêşî li xirabûna wê bigire. Di vê

de sedemên derve û hundir ji rola şexsan zêdetir bi bandor bûne. Li hundir ên Isyana Kurd proveke kirin û hevkarên seltenatê, ji bo Kurd li derve bêne hiştin bi roleke girîng rabûne. Ma ne Meclîsa Millet a Mezin a Tirkiyê di sala 1922'an de bi dengdaneke bi dizî li beramberî 63 dengên dijber bi 373 dengan biryara damezrandina meclîsek e ku xwe bisipêre otonomiyê, ji bo Kurdan qebûl kiribû. Mistefa Kemal bi xwe serê sala 1924'an di beyanatên xwe de ji bo Kurdan projeyên xwe yên çareseriyê yên bi awayekî bêne maneya xweseriya demokratîk anîbûn ziman.

Lidervehiştina Kurdan, ji biryareke kokqelandina etnîk a Mistefa Kemal bi zanebûn kirî wêdetir, bi provakasyonên Brîtanyayê bi alîgirên seltenetê re li ser Mûsil-Kerkûkê kirî ye. Tevî ku Mûsil-Kerkûk di nava sînorên Mîsaq-î Millî de bûn xwestin wan li derve bihêlin û ji bo vê jî provokasyon pêkanîn. Ango bi awayekî eşkere ev hatiye kirin: Di berdêla Mûsil û Kerkûkê de li ser peyameneke tesfiyeyê li hev kirine. Çawa ku heman tişt li ser Rûm û Ermaniyan jî kirin. Komarê li dijî Brîtanyayê şerê serxwebûnê meşand û çawa çêbû ku komarê bi tawîzên dan Împaratoriya Brîtanyayê Kurd li derveyî sîstemê hiştin? Ev ji şaşiyeke dîrokî wêdetir bi tercîhekê re têkildar e. Difikirin ku pêdivî bi hevgirtina bi Kurdan re nemaye. Herweha fikarên wan hene ku Ingilîz destekê bidin Kurdan. Lihevkirina wan dişibe peymana bi Yewnan, Rûs û Fransiyan re kirî. Di vê rewşê de mirov dikare bibêje, Komarê di gavên pêşî yên damezrandina xwe de yek ji gavên girîng ên antîdemokratîk di mijara Kurdan de avêtiye. Encam, heta roja me ya îro êş û elemên mezin, zirar û ziyana maddî ye, û kiriye ku Komar timî bi awayekî antîdemokratîk biçilmise.

Xirabûna hevgirtina bi ummeta Îslamî re duyemîn gava girîng a antîdemokratîk bû. Herçiqasî di bin navê laîkgiriyê de li dijî ummeta Îslamî kampanyayeke îdeolojîk û pratîk were meşandin û pirsgirêk bi şêweyê pêşverûtî-paşverûtî were pêşkêşkirin jî ya pêk tê tercîha hegemonîk a sîstemê ye. Girse û têgihiştina ummeta Îslamî ji aliyê civakî ve xwedî giranî ye. Wê dixin bin hegemonya xwe. Ev pêngaveke antîdemokratîk a modernîteya kapîtalîst e. Jixwe ketine nava modernîteya kapîtalîst. Di vê de, di serî de Împaratoriya Brîtanyayê rola hêzên sereke yên hegemonîk ên Ewrûpayê girîng e. Li ser erêkirina wan jî ev tercîh hatiye kirin. Ji hundir û derve ve weke armanceke stratejîk xwestin Komara

Tirkiyê ya nû ji ummeta Îslamî qut bikin û di vê çarçoveyê de tevgeriyan û li gorî vê tercîha xwe kirin.

Hewl dan nûnerên beşên emeleyan jî hê ji destpêkê ve li derveyî sîstemê bihêlin. Ne bi tenê kuştina Mistefa Suphî û hevalên wî, hertim qedexekirin û girtina wan, ji tercîha sîstemê ya li derve hiştinê pêk dihat.

Em behsa hegemonyayeke bûrjûwa dikin ku dixwaze xwe di bin bazkên parêzvan ên Komarê de pêk bîne. Hevgirtiyên xwe yên stratejîk bi kar anîne û bi vî awayî ji modernîteya kapîtalîst destûr wergirtiye ku di bin hegemonya wê de bibe desthilatdar. Wexta ku hê nû komar tê îlankirin bi Kongreya Îqtîsadê ya Îzmîrê kapîtalîzmê tercîha xwe eşkere nîşan daye, bi şoreşên medenî modernîteyê tercîha xwe daniye holê. Em li vir behsa dewleteke nû dikin ku hevgirtiyên xwe avêtine derveyî sîstemê û bi awayekî eşkere helwesta xwe li cem şaristaniya Rojava nîşan daye. Di vê de ji şexsiyeta Mistefa Kemal wêdetir têgînên dema avabûnê û konjonkturel diyarker in. Ji bo Komara hatibû îlankirin li ser piyan bigirin diviyabû dostaniya Împaratoriya Brîtanyayê bikin. Herçiqasî bi rêveberiya li Moskovê re peymaneke dostaniyê hebe jî dostaniya bingehîn divê bi bereya Brîtanyayê re pêk bê.

Vê rastiyê mohra xwe li polîtîka derve ya Mistefa Kemal daye. Wexta ku mirov rastiya Mistefa Kemal tîne ber çavê xwe, zehmet nîne ku fêhm bike çi diqewime. Eşkere divê mirov bibêje, ji bo Komar li ser piyan bê hiştin pêdivî bi lihevkirina bi Împaratoriya Brîtanyayê re heye û ev jî tê kirin. Mirov dikare behsa pêkhatineke siyasî bike ku bi temamî bi polîtîkayên wê demê yên Brîtanyayê re li hev dike. Destûr hatiye dayîn ku Komar bibe dewleteke netewe û di berdêla vê de jî Kurd, Îslamî û Sosyalîst li derve hatine hiştin. Eger bi polîtîkaya Brîtanyayê re lihevhatin nebûya, Komarê nikarîbû hevgirtiyên xwe yên bingehîn paşguh bikirana. Di tercîhkirina dewleta netewe de çûyîna demê ber bi rejîmên konjonkturel, otorîter û faşîst ve bi bandor bûye. Nexasim piştî salên 1930'î ev tercîh bêhtir diyar e. Komar demeke dirêj tercîha xwe bi awayekî eşkere ji bo şaristaniya Rojava dike. Tercîha Sovyetê û ji nû ve vegera li şaristaniya Îslamê ti carî neanîne rojevê.

Di Komara Tirkiyê de hewl dan dewleta netewe bi milliyetperestiyeke gelekî dijwar bimeşînin û ev jî ji her cure

gavavêtinên demokratîk girîngtir hat dîtin. Çawa ku yeqîn tê kirin, Mistefa Kemal di vê ezmûnê de li herî pêş nîne. Tecrûbeya wî ya sala 1930'î ya Firqeya Serbest û eleqedariya wî ya hûrûkûr der barê Sumer û Hîtîtan de nîşan didin ku lêgerîna wî ya welatparêziyeke demokratîk û ne nijadperest a xwe disipêre dewlemendiya çanda Anatolyayê heye. Bernameya dewletdariya netewe bi zêdegaviyên xwe hemûyan û bi lez hat meşandin û ev bi hêza Îttîhatgirên ji rêûresmê re têkildar e. Hema hema ji bilî Mistefa Kemal ê bi vê rêûresmê re têbikoşe nîne. Berevajî vê, di serî de Îsmet Înonu, Fevzî Çakmak û Kazim Karabekir, beşekî mezin ê burokrasiya sivîl û eskerî yên giregir bi koka xwe ji Îttîhat û Teraqiyê bûn û hê jî gelekî zêde bi vê rêûresmê ve girêdayî bûn. Cudahî bi tenê ew bû, alîgiriya Elman cihê xwe bi alîgiriya Ingilîz guherî bû. Bûyerên piştî hewldana reşkujiya li Îzmîrê qewimîn nîşan didin ku bi temamî dor li Mistefa Kemal hatiye girtin. Mistefa Kemalê piştî salên 1926-1927'an bi temamî di nava çerxên burokrasiyê de li Çankayayê asê maye. Wexta ku em dibêjin ne hukmê şexsan, ê konjonkturê li ser kar e, girîngiya vê rastiyê tê destnîşankirin. Divê mirov bi girîngî ji bîr neke ku di vê pêvajoyê de Tevgera Siyonîst a bi Împaratoriya Brîtanyayê ve girêdayî heta sala 1947'an damezrandina Îsraîlê ji Cihûyan re Tirkiyeya nû weke welat pêşniyar dikir.

Bi kurtî, dema Komarê ya heta bi mirina Mistefa Kemal Atatirk bi îdeolojiya dewletdar a netewe ya radîkal û hişk a rêûresma Îttîhatgir û kirinên wan ên antîdemokratîk û pêkhatineke hegemonîk çêbûye. Tevî ku kapîtalîzma dewletê û îndustriyalîzm li pêş hatin girtin jî dîsa pêşketina wan bi sînor pêk hat. Modernîteya kapîtalîst a jêre şaristaniya Rojava ya hemdem tê gotin, karîbû hegemonya xwe bi tenê di bin rejîmeke otorîter a yek partî de bimeşîne. Pirsgirêka demokrasiyê têra xwe giran bûye, piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn bi mezinbûna hêza nû ya hegemonîk a sîstemê ango Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê ve girêdayî Partiya Demokrat (DP) di salên 1945-50'î de gav avêt û gelekî pêşde çû. Bi Partiya Demokrat re beşek ji eşrafên Îslamgir li sîstemê zêde bûn. Bûyera jêre tê gotin di laîktiyê de paşveçûyîn heye ya rastî kêmbûna para kurtêlan a bûrjûwaziya burokratîk di nava dewletê de ye. Şer ji bo kurtêlan bi navê laîktiyê tê kirin.

Çepgiriya hatiye tepisandin jî dixwaze di vê dema nû de bilive. Tevgera Kurd gavên gelekî piçûk diavêje. Sê tevgerên demokratîk ên ku faşîzma Îttîhatgir ew tepisandine, hewl didin yek bi yek bi ser xwe ve bên, ha di vê demê de Komara Tirkiyê ya di bin hegemonya DYE'yê de ketiye NATO'yê ji bin bazkên Ingilistanê dikeve bin bazkên DYE'yê. DYE vê hîmaye û parastinê bi teşkîlata Gladio dike. Di navbera salên 1950-2007'an de tevahiya avahiya eskerî-siyasî di bin destê Gladio de dixebite. Ji aliyê pirsgirêka demokratîk ve gelekî girîng e ku mirov fêhm bike, ji bilî dema Jakobenîk a salên 1920-22'an tevahiya pêvajoyê di kontrola modernîteya kapîtalîst de meşiya. Serxwebûn utopyayeke bûrjûwaziya piçûk e, lê rastiyê îfade nake. Sîstemek e ku modernîteya kapîtalîst têde hegemonya xwe ya dinyayê avakirî, ti welat û dewlet nikare serbixwe bibe. Komara Tirkiyê ji ber xisletên xweser ên Anatolyayê ew dewlet e ku di tora sîstemê de tê hiştin û pêve girêdayî ye.

Teşkîlata Gladio ya piştî şerê sar girîngiya wê nema, bi sedema PKKê heta sala 2007'an li Tirkiyê bandora xwe dewam kir. Li Tirkiyê Gladio'ya NATO'yê ya di bin navên cûrbicûr de xebatan dimeşîne, bi awayekî bûrjûwazî jî şens nade demokrasiyê. Komara Tirkiyê di navbera salên 1925-1990'î de, heta jihevbelavbûna Sovyetê bi roleke antî-Sovyetîk rabû, lê piştî salên 1990'î di modernkirina rêûresma Îslamî de xwestin weke welatekî model bi kar bînin. Di evqasî bikaranîna Komara Tirkiyê de roleke mezin a avahiya komîtakar-darbekar a di nava dewletê de heye. Li dijî hev bikaranîna klîkên cûrbicûr vê firsendê diafirîne. Şerê çeteyan di nava dewletê de ji yeqînan jî wêdetir pirsgirêkên civakî giran dike. Ew tevgereke demokratîk a muhtemel weke tinebûna xwe dibîne, lewma liveke herî piçûk a demokratîk jî dipelixîne.

Komara Tirkiyê ji bo şaristaniya Rojava tê çi maneyê. Komara Tirkiyê di warê ewlekariyê de bi kêra wan tê û di warê ekonomiyê de jî bazar û hêza erzan a kar pêşkêş dike. Rola Tirkiyê ji bo Rojava bi vê bi sînor e. Têkoşîna PKKê li dijî Komara Tirkiyê bi tenê ev polîtîkayên sîstemê dernexistin holê, wê herweha nakokiya PKKê ya bi sîstemê re jî piştrast kir. Dîsa hat fêhmkirin ku ji hev cihêkirina Kurd û Tirkan armanc nîne. Derxist holê ku li Tirkiyê di têkoşîna rastî ya demokrasiyê de cara pêşî rastiyên sîstema serdest hatin deşîfrekirin û bi vî awayî têkoşîna demokratîk rengekî radîkal girt. Gelekî girîng e ku mirov fêhm bike, şerê PKKê

ne bi Komarê re, bi antîdemokratîzma wê re ye. Li dijî dewletdariya netewe derketina ji tengeva dewletdariyeke netewe tê maneya gavavêtinên hevgirtî yên demokratîkbûnê. Ev jî tê wê maneyê ku pirsgirêka demokrasiyê ya giranbûyî dikeve pêvajoya çareseriyê.

Weke encam mirov dikare bibêje, pirsgirêkên ezbetên Oguzan ên di serê sedsala 11. de zêde bûn bi Îslamiyetê xwestin çareser bikin û ev destpêka pirsgirêkên demokratîkbûna Komara Tirkiyê ya îro pêk tînin. Hiyarerşiya jor a ezbetan bû dewlet û bi vî awayî hewl da pirsgirêkên xwe çareser bike, beşa jêr a xizan jî di bin navê Tirkmen de li Rojhilata Navîn belav bû û hewl da bi demokrasiya destpêkê û xwezayê jiyana xwe dewam bike. Xisletên etnîk ên tebeqeya jor di nava çanda Ereb û Fars de heliyan, lê ezbetên Tirkmen xisletên xwe yên etnîk heta roja me ya îro anîn. Arîstokrasiya ezbetan weke rêveberên dewletan û fermandarên eskerî di nava şaristaniya navendî de cih girtin, Tirkmen jî bi giranî bi jiyana xwe ya koçeriyê ya berê ketin nava jiyana nîv-bicîhwarbûyî. Bi pirranî bi gelên cîhwarbûyî pev keliyan. Çi di dema Selçûkî û Atabegan de, çi jî di dema Osmaniyan de rejîm bi şêweyê şaristaniya hevpar a arîstokrasiya feodal pêşde çû û ji aliyê gelan ve jî rewşa di nava hev de bi awayekî xwezayî dewam kir.

Herçiqasî di navbera pêşiyên Kurd û Tirkên îro de hin nakokî çêbûbin jî hay jê hebûn ku têkiliya stratejîk xwedî roleke heyatî ye. Em dibînin ku hê ji sedsala 11. ve di vekirina deriyên Anatolyayê li ezbetên Oguz û li dijî artêşên Xaçperestan de herdu gel di nav tevgereke stratejîk de bûn. Ev têkiliyên stratejîk ên qewmî yên ji begtiyên Kurd û Tirk bihurîn, ne bi tenê bi dijberiya Împaratoriya Bîzansê ma, ne tenê li dijî seferên Xaçperestan bi sînor bû, li dijî siltantiyên Ereb û Fars, şahtî û mîrtiyên wan jî hebûna xwe dewam kir. Yekem car di dema Selçûkiyan de Eyaleta Kurdistanê hat pêkanîn û ev jî vê rastiyê piştrast dike. Di dema Xanedaniya Eyûbî ya Kurd de ya balkêş ew e, ev têkilî hebûna xwe di dema Artûkogullari, Qereqoyûnlûler û Aqkoyûnlûleran de jî didomîne. Împaratoriya Osmanî di dema belavbûna xwe ya ber bi Îran, Erebistan û Qefqasan de ji pirsgirêkên pêre rûbirû bû, di encama hewldanên dûrûdirêj ên Îdrîs-î Bedlîsî de bi yekîtiya bi begtiyên Kurd re pêkanî, bihurî. Împaratorî du qat zêdetir mezin dibe. Hevgirtina stratejîk di vê demê de bêhtir eşkere ye. Kurd û Tirk

weke qewm bûne kakilên sereke yên Împaratoriyê. Asîmîlasyona xwezayî ya di navbera herdu civakan de wekhevbûnek pêk aniye û xisletên çandî yên hevpar gelekî çêbûne. Tirkmenên bi koka xwe Kurd, û Kurdên bi koka xwe Tirkmen zêde bûne.

Moderniteya Ewrûpayê ya di serê sedsala 19. de bi Napolyon veguherî pêngaveke stratejîk ket nava çanda Rojhilata Navîn; mêtingerî û dagirkeriya wê ya her çû pêş ket balansên heyî ji binî ve hejandin û dane guhertinê. Çand û jiyana moderniteya kapîtalîst ku li cem gelên Xirîstiyan zûtir pêş ket, meylên dewletdariya netewe sor kiriye. Moderniteya sedsala 19. û 20. çanda Rojhilata Navîn a xwedî yekparebûneke hezar salan bi hêmanên dewleta netewe parçe kir û rê vekir ku ber bi alozî, krîz û şeran ve biçe. Împaratoriya Osmanî bi vê projeya dewleta netewe ya moderniteya Rojava hatiye parçekirin û hilweşandin. Cemiyeta Îttîhad û Teraqî ku ji bo di nava dewletê de paralel dewletê pêk bîne xwe li komîtakariyê rakişand, di sala 1906'an de gav avêt qonaxa komîtakariya çekdarî û bi vî awayî krîza dewletê kûrtir kir. Li ser navê rawestandina meyla moderniteyê ya dewleta netewe berê xwe daye avakirina neteweperestiyeke herî paşverû, faşîst û şoven. Ekola Tirkîtiyê ya pirranî ji yên ne Tirk pêkhatî, çi di hilweşîna împaratoriyê de, çi di derbasbûna pêvajoya bi êş a Komarê de, çi jî di antî-demokratîkbûn û xetimînê de bi rola diyarker rabûye. Bi qasî dewletên netewe yên hevrik ên parçebûn pêk anîne û rê li ber xetimînê vekirine, diyarker û rolgir bû.

Sazî, têgîn û teoriyên Komara Franse ya Sêyemîn a Mistefa Kemal ji xwe re weke model hilbijart di sala 1919-1922'an de (ji aliyekî ve li dijî dagirkeriya biyanî ya zêde dibû, ji aliyekî din ve jî li dijî hevkartiya seltenetê) bi şoreşa Jakobenîk bi cih hatin anîn û bi sînor be jî di krîza dewletê de rê li çareseriyê vekirin. Krîza komîtekariya Îttîhad û Teraqiyê kûr kir Împaratoriya Osmanî bir parçebûn û hilweşînê û li ser xirbeyên wê Komara Tirkiyê hat avakirin. Beşek ji pirsgirêka dewletê hat çareserkirin, lê pirsgirêkên civakî kûrtir bûn. Projeya Komarê projeyeke moderniteyê bû. Hêzên hegemonîk ên Rojava ev proje li Lozanê erê kirin û hewl dan bi cih bînin. Şoreşa Jakoben di sala 1920-1922'an de dibû ku bi tenê ji krîza dewletê bi komarê nebihurîbûna û bi vê bi sînor nemana. Heke hêzên hevgirtî ango milliyetgirên Tirk, sosyalîst, ummetgirên Îslamê û nûnerên civaka Kurd bi

provakasyon û komployeke hê jî naveroka wê ya rastî nayê zanîn li derve nehatibûna hiştin, komar dikarîbû bi hêsanî ber bi demokrasiyê ve biberidiya. Ma ne serketin bi hevgirtina van hêzan pêk hatibû. Lidervehiştina bi provakasyon û komployan mirov bi Mistefa Kemal ve girê nede ji bo analîzeke rast girîng e. Ji ber ku li dijî Mistefa Kemal jî komplo, reşkujî û provakasyonên ciddî hatibûn pêkanîn. Di vê de para kadroyên Îttîhadgir ên dor li Mistefa Kemal girtine, diyarker e. CHP weke nav guheriye, lê bi xwe şêweyê nû yê Partiya Îttîhad û Teraqiyê ye. Mistefa Kemal di sala 1930'î de bi Firqeya Serbest hewl da yekdestdariya CHPê bişkîne, lê bi ser neket. Piştî 1935'an bername û rêziknameya CHPê bi awayekî eşkere Partiya Faşîst a Îtalyayê weke model qebûl kir û Atatirk nerazîbûna xwe ji vê yekê bi awayekî eşkere nîşan da.

Divê mirov bi girîngî bîne ziman ku piştî sala 1926'an ne giraniya şexsî ya Atatirk, ya kadroyên Îttîhadgir heye, ji ber ku ew gav bi gav Komarê dixin destê xwe û li ser bingehê dewletdariya netewe hewl didin zêhniyeta faşîstkirinê bi sazî bikin. Bi awayekî pirr eşkere Atatirk dixwest artêşê li derveyî siyasetê bihêle û dewleta bi qanûnan dimeşe ava bike. Herweha pêkhatineke li ser esasên çîn û zumreyan red dikir, li dijî derve helwesta serxwebûnê û siyaseta azadiyê diparast, lê kadroyên dor li wî girtibûn bi polîtîkayên îmtiyaz û komployan ew pûç kirin û hewl dan vê siyasetê bi darbeyan heta roja me ya îro bimeşînin. Li vir a behsa wê tê kirin ew e, Îttîhadgir bi darbeyên nava qesrê, bi komplo û darbeyan dewlet ji dewletbûnê derxistin, xwe li bidestxistina dewletê rakişandin û hewl dan li ser civakê rêûresma rêveberiya despotîk bidomînin. Li hemberî vê, ji bo dewlet bi rastî bi xisletên dewletê dewam bike têkoşînên gelekî girîng hene. Avakirina Komarê ji aliyê Mistefa Kemal ve yek ji van hewldanên sereke ye.

Di pêvajoya moderrnîteya Rojava de ev herdu têgihiştinên xwe li hev rakişandin hertim dewlet di nava krîzê de hiştin, civak xistin nav pirsgirêkên giran û li bicihanîna demokratîzmeke hevgirtî pêşî girtin. Komar nikarîbûye nebe deriyê kurtêlxuriya yekdestdariyên olîgarşîk, xwediyên îmtiyazan û darbekaran, nikarîbû bibe dewleteke rastî ya huqûqê, ya civakî û demokratîk. Bêguman sedema vê ya bingehîn jî ew bû ku konsensusa demokratîk a civakî ya di serê sala 1920'an de hatibû damezrandin hatibû tesfiyekirin û hewldanên hegemonîk ên yekdestdariyên olîgarşîk, xwedî

îmtiyaz û darbekaran bû. Şerê di nava dewletê de hatiye kirin têkiliya xwe bi têgînên dewleta huqûqê, civakî, laîk û demokratîk re tineye, ji bo bidestxistina kurtêlxuriya zêde ya desthlatdariyê ye.

Em vê pêvajoyê tevahiya dîroka Komarê dikarin dabeşî sê dewran bikin. Dewra yekemîn dema navbera salên 1926-1950'î ye; mirov dikare vê demê weke dema olîgarşiya burokratîk otorîter a tek partiyê karekterîze bike. Dewra duyemîn dema navbera salên 1950-1980'î ye; xwediyên erdan, bûrjûwaziya bazirgan û pîşesazên xwe disipêrin derve dixwazin bibin hevparê olîgarşiya burokratîk, ji bo kurtêlên dewletê ji nû ve parve bikin di vê demê de gelekî dijwar xwe li hev rakişandine, li dijberî hev darbe pêkanîne. Dewra sêyemîn dema navbera salên 1980-2010'an e; bi awayekî yekser mudaxeleya kapîtala fînansê ya global a kurtêlên dewletê vê pêvajoyê diyar dike. Xisleta hevpar a van hersê deman ew e, dewlet û yekdestdariyên kapîtal ên taybet ku bi pêş dikevin rêveberiyên hişk ên olîgarşîk li ser civakê û beşên gel ava kirin, lewma ev pêvajo bi gelek pevçûnên sendîka û partiyên armanca wan bidestxistina dewletê bû, derbas bû. Hêza hegemonîk a vê pêvajoyê ji derve kontrol dike ji 1925an heta bi salên 1945'an bi awayekî bingehîn Împaratoriya Brîtanyayê ye, û di dema 1945-2010'an de jî DYE ye. Ji salên 1950'î ve jî qismî YE, IMF û Bankeya Cîhanê, bûn hevparê pêvajoyê. Gladio'ya NATO'yê rêveberê esas e.

Hêzên hevgirtî yên di demazrandina Komarê de cih girtin jî li dijî hegemonyadariya wan hedef digire bi awayekî xwezayî timî di pozîsyona berxwedanê de man. Herçiqasî tevahiya hersê deman ji hev belav bin û ji hev qut bin jî em hem berxwedana wan dibînin û hem jî dibînin ka çawa bi ser sîstemê ve dibin. Rûsya Sovyetê, sosyalîst û kominîstên bi ser wê ve di dema damezrandinê de bi bandor bûn, lê yên pêşî ji hêza hegemonîk derb xwarin, kirin qurban û tepisandin dîsa ew bi xwe bûn. Pêvajoya îmhayê ya bi tevkujiya Mistefa Suphiyan destpê kir, di sala 1927'an de bi tevqîfata Partiya Kominîst, girtina Hîkmet Kivilcimli û Nazim Hîkmet kûrtir bûye. Piştî salên 1950'î zordestî û tevqîfat ji bo ketina NATO'yê weke sedem hatin zêdekirin. Ji bo ji nû ve bi ser xwe ve bên û gavên demokratîk geş bikin, sosyalîstan Darbeya Burokratîk a 27'ê Gulana 1960'î weke firsend qebûl kirin, lê bi darbeya 12'ê Adara 1971'ê dubare hatin tepisandin. Herçiqasî hewl dan berxwedana xwe heta sala 1980'î dewam bikin jî bi

darbeya 1980'î pişta wan hat şikandin û heta roja me ya îro careke din bi ti awayî bi ser xwe ve nehatin. Hînê jî weke demokrasiya radîkal nikarîbûne xwe weke avahiyeke pirrdengî/pirrrengî û yekbûyî bi rêxistin bikin ango bi awayekî belav, bêberpirsiyarî û gelekî lawaz hewl didin hebûna xwe dewam bikin. Li gorî potansiyela wan wezîfeya wan e ku gavên demokratîkbûn û çalakbûnê biavêjin.

Ummetgirên Îslamî ku li darbe, tevqîfat û mişextkirinên bi heman rengî rast hatin, kêm li ber xwe dan, lê di nava xwe de hêrs û nerazîbûn kom kirine. Di salên navbera 1923-50'î de berxwedana rewşenbîrî ya di şexsê Mehmed Akîf, Saîd-î Nûrsî û Necîp Fazil de hewldanên modernbûna Îslamiyetê ne. Bi awayekî ji biratiya Misilman a Tirkiyê û ji şîroveya ji nû ve ya berxwedana Îslamî re pêşengî hatiye kirin. Di navbera salên 1950-1980'î de hem li hundir hem jî li derve bi hin hêzên hegemonîk ên serdest re têkiliyên xwe pêşde birin û bi vî awayî li ser kurtêlên desthilatdariyê ango dewletê bûn hevpar û bi rêya kapîtalîzma taybet jî ketin pêvajoya yekdestdarbûna sermayeyê. Tevgera Erbakan tevgereke tîpîk a Îslamî ya demê ye. Berjewendî û hesretên ji bo nûneriya desthilatdariyê ya gelek ekolên heyî îfade dike. Tevgera Saîd-î Nûrsî ya weke Nûrcîtî dewam dike hê di binî re û ji çend milan ve dimeşe. Li piştperdeya dîrokî, li pişt hemûyan Neqşîbendîtiya sedsala 19. heye. Tevî ku bi xwe re sîstemeke bi sînor a demokratîk pêşde biribin jî nikarîne bibin xwediyê helwesteke demokratîk a sîstematîk û hevgirtî. Herçiqasî salên 1980-2010'an di şexsê Turgut Ozal de banekî xwe di binî de biparêzin dîtibin jî di pêvajoya desthilatdarîbûn û sermayedarîbûnê de timî ji aliyê olîgarşiya burokratîk ve gef li wan hat xwarin. Nexasim têkiliyên bi DYE, YE, IMF, Bankeya Cîhanê û hin derdorên sermayeyê yên Ereb re danîn ew kirin hevparê sîstemê û piştî serokwezîrtiya bi sînor a Necmedîn Erbakan piştî salên 2000'î di dema serokwezîrtî û lîdertiya R.T. Erdogan de vê hevpariyê rengekî hê mayînde werdigirt.

Hêzên behsa wan tê kirin, bi pirsgirêkeke giran a demokratîkbûnê re rûbirû ne. Li hemberî olîgarşiya burokratîk timî xwe di tehlûkeyê de dibînin. Ji vê tehlûkeyê yan wê bi demokratîkbûneke temam bibihurin, yan jî ev pêngav pêk neyê wê bi darbeyeke mîna ya çepgiran xwarî û operasyoneke parçekirinê –

dadgehkirina Ergenekonê vê rastiyê îfade dike- statuya xwe ya heyî ji dest bidin.

Li hemberî olîgarşiya burokratîk beşa rewşa xwe herî trajîk û krîtîk hêza hevgirtina di damezrandina Komarê de cih girtiye Kurd in. Tevî ku di damezrandina Komarê û Şerê Rizgariyê de Kurd hêmanê bingehîn ên bivênevê ne, rewşa wan a ketinê gelekî tarî ye û bi gelek komplo, provokasyon û tevgerên tenkîlê ve girêdayî ye. Berê polîtîkaya paqijkirina Anatolyayê ji Ermenî û Rûman hatibû meşandin. Polîtîkayeke bi heman rengî di dema navbera 1925-1950'î de li ser Kurdan hat ferzkirin û polîtîkayeke bêKurdhiştinê hat meşandin. Ji lewra mirov dikare pêvajoya isyanên 1925-1938'an bi vê polîtîkayê ve girêdayî fêhm bike. Rola Împaratoriya Brîtanyayê di vê de bi ya wê ya di tesfiyekirina Ermenî, Rûm û Asûriyan de heman rol e. Têkiliya bi Împaratoriya Brîtanyayê re di zûbirina Komarê ber bi rejîmeke otorîter ve û girêdana wê bi modernîteya kapîtalîst de diyarker e. Herweha mirov dikare bibêje, kadroyên di bin destê Mistefa Kemal û Îsmet Înonî de bi dijwarî xwe li hev rakişandine û vê yekê di çûyîna Komarê ber bi rastgirî û statuya antîdemokratîk de rol girtiye, li hemberî dostaniya Mistefa Kemal bi Sovyetê re û helwesta wî ya serxwebûnxwaz, aliyê din ji gelek aliyan ve bi Împaratoriya Brîtanyayê re di nava têkiliyan de ye.

Piştî isyanê mîna ku pirsgirêka Kurd bi dawî bûye tevgeriyan. Li deverekê liveke piçûk jî bihata dîtin mîna mirî ji nû ve ruh pê hatibe şîrove dikirin û yekser diviyabû bipelixînin. Ji lewra dema nevbera 1950-1980'î ji bo Kurdan pêvajoyeke welê ye ku Kurd her hewl didin hebûna xwe îspat bikin. Bi tevahî berxwedan û guftûgo li derdora pirsa "Kurd hene yan tinene?" zîvirîn. PKK'ê ji bo derketina ji vê guftûgoyê û ketina pêvajoya rizgariyê bi awayekî berbiçav gav avêt û li ser navê muxalefetê hemûyî di dema 1980-2010'î de xwe gihand statuya aktorê demê. Di vê demê de bi darbeya 12'ê Îlona 1980'î pirsgirêka demokratîkbûnê têra xwe giran dibe, li nava dinyayê mafê mirovan tê binpêkirin û di nava dewletê de çetetî serwer dibe. Ha di vê demê de ji tevgera Ergenekonê ya xwe weke Gladio'ya Tirk bi gewde dike DYE desteka xwe vedikişîne û bi vî awayî ev dem bi encam dibe. Di mijdara 2007'an de DYE'yê û Komara Tirkiyê li hev kirin. Li gorî vê, di berdêla tesfiyekirina PKK'ê de wê Gladio'ya Tirk jî were

tesfiyekirin, yên li ber xwe bidin wê bidin destê dadgeriyê û hêmanên wê yên din jî wê bikişînin nava saziyên bi nîzam (konvansiyonel) ên dewletê. Ha tam jî di vê nuqteyê de em di dîroka Komarê de li guftûgoya herî mezin a demokratîkbûnê û ji nû ve veguherandina Komarê ber bi komareke destûrî ya demokratîk ve şahidiyê dikin.

Ev krîza herî mezin a di dîroka Komarê de hem di nava dewletê de û hem jî di nava civakê de hê bi hemû leza xwe dewam dike û bi helwesta hêzên heyî wê derketina ji nava wê diyar bibe. Guftûgo û lêgerîna li destûra demokratîk hem sedem û hem encama vê krîzê ye. Ya rastî, herdu jî di nava dînamîzmeke çalak de ne ku hevdu diafirînin. Di vê rewşê de pirsgirêka Kurd bi rola sereke radibe. Esas, ev rastî têkiliya xwe bi prensîbeke kûr a dîrokê re heye; ew jî ev e, pirsgirêkên civakî bi darê zorê nayên tepisandin, çawa ku firsendê bibînin ji her demê zêdetir bi awayekî dijwar xwe didin hiskirin. Dema 1920-1925'an ji vî alî ve demeke herî balkêş a dîrokê ye û mîna ÇERXEKê ji nû ve werdigere pêk tê, lê vê carê ne ji bo tepisandina tevahiya hevgirtiyên damezrîner, lê weke ku ji bo komara demokratîk a di dema xwe de nehatiye damezrandin ji nû ve damezrînin bang li wan tê kirin. Xeta zirav a di navbera niha û dîrokê de û şîrovekirina vê weke çerxeke werdigere, dihêle ku mirov bi awayekî rasttir li vê rastiyê serwext bibe û ji bo mirov bi rola xwe ya dîrokî rabe şens û firsendê dide.

## DERKETINA JI KRÎZÊ û ÇARESERIYA DESTÛRA BINGEHÎN A DEMOKRATÎK

Di nav tevahiya aliyên civakî de li ser demokratîkbûna Tirkiyê lihevkirineke zimnî pêk hatiye. Lê ya tineye ew e, wê ev xwesteka zimnî û dîrokî çawa veguhere îradeyeke eşkere û pêk tê. Destûra demokratîk dibe heqîqet û îfadeya cewherî ya vê rastiyê. Ev beşa duyemîn a nirxandinê, nexasim beşa prensîban çarçoveyekê pêşkêş dike ka ji vê daxwaza dîrokî û demokratîkbûnê re bi kîjan destûra bingehîn a demokratîk wê bersiv ê bê dayîn. Ev prensîb xwe disipêrin teorî û têgînên zanistî, ji bo derketina ji krîzê û li ser bingehê destûra demokratîk ji bo ji nû ve avakirina Komarê mirov dikare wan pirr kurt û cewherî ji nû ve îfade bike.

**Neteweya Demokratîk:** Bi qasî ku ji her çand, etnîsîte û dînî (di çarçoveya têgihiştina nasnameya serê wê vekirî û nerm de), herweha ji ferdên maf û azadiyan bi awayekî wekhev parve dikin pêk tê û bi vî awayî li ser hîmê mafên kolektîf û ferdî yên ji hev nabin neteweya demokratîk tê terîfkirin û ev terîf bi awayekî bi terîfa welatê hevpar re li hev bike yekparebûna herî berfireh pêk tîne.

**Welatê Hevpar (Welatê Demokratîk):** Bêyî ku bibe malê ti koma etnîk û dînî, bêyî ku kes kesî bike yê din, mirov dikare weke mekanê welatiyên demokratîk ên ji ferdên azad û civaka demokratîk, ekonomîk û ekolojîk pêkhatî terîf bike. Ev terîf di warê yekparebûna herî berfireh de bi serê xwe xwedî naverok û maneyeke dewlemend e.

**Komara Demokratîk:** Civaka demokratîk weke pêkhênerê diyarker ê wesfê civakî, huqûqî û laîktî yê dewletê divê weke bingeh bê qebûlkirin û Komara Demokratîk vê îfade dike. Li civaka demokrasî lê bimeşe, şêweyê herî îdeal ê dewletê komar e. Li komareke bi vî awayî wesfên civakî, laîktî û huqûqî weke encam derdikevin holê.

**Çareseriya Demokratîk:** Hebûna saziyên Komarê û saziyên civaka demokratîk di nava aştiyê de bi hev re bingehê çareseriya demokratîk in. Di çarçoveya vê danasînê de yekdestdariyên dewleta netewe, kapîtalîzm û îndustriyalîzm, neçar in li ser bingehê lihevkirineke aştiyane bi saziyên civaka demokratîk konfederalîzma demokratîk, kominalîzma ekonomîk û ekolojîk jiyanekê qebûl bikin. Eger mirov bi awayekî eşkere bibêje; bi qasî ku dewleteke bêdemokrasî tê redkirin, demokrasiyeke bêdewlet jî nayê ferzkirin.

**Jihevnebûna Mafên Ferdî û Kolektîv:** Civak hebûnên welê ne, bi qasî ku kolektîv in, ewqasî jî ferdî ne, bi qasî ku ferdî ne, ewqasî jî kolektîv in. Jihevcudakirina herduyan tewşomewşotiyeke lîberal e, û armanca wê mêtinkarî û zordestî ye. Ji bo pêşîgirtina li vê dekûdolabê divê mafên ferdî û kolektîv weke goşt û hestî bi hev re pêk bên.

**Azadî û Serxwebûna Îdeolojîk:** Mirov bi giştî ji hegemonya îdeolojîk a şaristaniya çînî û bi taybet jî ji hegemonya modernîteya kapîtalîst nikaribe bibihure wê çareserkirina pirsgirêkên demokratîkbûnê seqet û kêm bimînin. Nexasim gelekî zehmet e ku mirov bi pozitivîzma Ewrûpayê çanda Rojhilat û Rojhilata Navîn bi awayekî azad ji hev derxe û bigihîne çareseriyên demokratîk. Yên van analîz û çareseriyan karibin bi awayekî azad bi xwezaya xwe ya civakî û dîroka xwe bi sazî, teorî û têgînan ve bikin, dikarin jiyana azad pêk bînin.

**Nihatî û Dîrokîtî:** Bi qasî ku dîrok şertên kêliya niha destnîşan dike, niha jî dîrokê berbiçav dike. Cudahiya di navbera wan de ew e, dîrok derfet û îmkanê destwerdanê dide nihayê ango şensê azadkirinê pêşkêş dike. Çawa ku dîroka bê niha nabe, nihaya bê dîrok jî nabe. Hewldana modernîteyê ya bê dîrok hiştinê, hewldana wê ya bê bîr û hafiza hiştin, bê exlaq û bê polîtîka hiştina civak û ferd e. Ev şerekî welê ye, bi vê rê ferd û civakê bi hêsanî dikişîne nava mêtinkarî û zordestiyê, û bi hêsanî ferd û civakê hînî vê yekê dike. Lewma divê ev yek bi tevahî bê redkirin.

**Exlaq û Wijdan:** Ji bo ji hev derxistina pirsgirêkên civakî û ji bo pêkanîna demokratîkbûnê nêzîkatiyên ekonomîk û polîtîk bi serê xwe têrê nakin. Weke hebûnekê civak û tevahiya dîroka wê timî bi exlaq û wijdan re di zikhev de pêk hatine. Şerê modernîteyê li dijî exlaq û wijdan daye destpêkirin bi armanca rewakirina mêtinkarî û zordestiyê ye, û ji ber vê helwestê çareseriyên ekonomîk û polîtîk bi xwe pêkan nînin, berevajî pirsgirêkên civakî girantir dikin û hewldanên demokratîkbûnê jî pûç dikin. Prensîba exlaq û wijdan di çareserkirinê de cih nade prensîba hêzê, lewma di çareserkirina demokratîk de divê ji sedî sed mirov serî li prensîba exlaq û wijdanê bide.

**Xweparastina Demokrasiyan:** Ne tenê hebûnên zindî, hebûnên ne zindî têne hesibandin jî her tim û li her deverê bi sîstema xweparastinê ditebitin û ev jî tespîteke zanistî ye. Lewma ji bo ku ferd, civak û saziyên demokratîk li beramberî hêmanên modernîteya kapîtalîst (dewleta netewe, kapîtalîzm û

îndustriyalîzm) xwedî xweparastineke temam bin û karibin bi awayekî azad û wekhev bijîn hewcedariya wan bi sîstema xweparastinê heye û dest jê nabe.

Ez yeqîn dikim ku ev nirxandinên dîrokî yên kurt ên li ser riya demokratîkbûyîna Tirkiyeyê û çareseriya pirgirêka Kurd û prensîbên ku hewl tê dayîn ji bo komara demokratîk a destûrî cewherê wan were diyarkirin, rohnîker û çareserker in. Li ser vî hîmî mumkin e ku mirov ê karibe pirsgirêka Kurd hêsantir di nava yekparetiya demokratîk a Tirkiyê de rûnîne, analîz bike û modeleke baştir a çareseriyê yan jî modelên muhtemel ên alternatîf pêşkêş bike.

**Beşa Çaremîn:**

## PIRSGIRÊKA KURD û ÇARESERIYÊN MUHTEMEL

Belkî jî pirsgirêka pêşî ya bi şaristaniya çînî destpê kir bi kokên Kurd re têkildar be. Di dema mezinbûna şaristaniya Sumer de têgînên weke Kurtî, Hûrrî, Gûtî û Arî yên gelek caran li ber çavên me dikevin, timî heman kokê bi bîra mirov dixin. Ev têgîn têne maneya 'Çiyayî' û 'Qewmê Çiyê'. Tê zanîn ku ji bo Kurdên îro jî navnasên bi heman rengî têne bikaranîn. Şaristaniya Sumer weke antîteza civaka neolîtîk pêk hat. Bi gotineke din, Mezopotamya Jêr bi newalên deştî yên Dîcle-Firatê, li dijî newalên bi girik û çiyayî yên Dîcle-Firatê yên Mezopotamya Jor bi rola alternatîf radibe. Pirsgirêkên civaka neolîtîk bi vê mezinbûnê re têkildar in. Bêguman wê nebe tespîteke zanistî ku mirov bibêje, civaka neolîtîk û Kurdîtiya roja me ya îro wekhev in. Lê belê wekheviyên di navbera mîrateya civaka neolîtîk a beriya 10.000 salan pêkhatî û civaka îro de xweber nînin. Dîroka civakî dibêje, divê tayên navbera xelekan şidandî û xurt bin. Arkeolojî û etîmolojî behsa vê wekheviyê dikin û dibêjin, ev wekhevî xurtir e. Gelekî pêkan e ku wesfên civaka li qûntara rêzeçiyayên Zagros-Torosê Pro-Kurd bin.

Dema ji salên 5.000 B.Z. heta bi belavbûna Îslamê weke Serdema Destpêkê tê qebûlkirin. Di civaka vê demê de di serî de hiyarerşî, xanedantî, dewlet, bajar, çîn, bazirganî, cotkarî, zenaet, malbat, jin, koletî, dîn, nivîs, zanist, wêje, heykel, mîmarî û pîşesazî gelek awayên hilberînê û saziyên bingehîn ên pêwendîdarî şaristaniyê bi qasî xweliyê zêde dibin. Pêşdeçûna bûyerên bi vî rengî di heman demê de dihat wê maneyê ku pirsgirêkên civakî jî mîna xweliyê zêde dibin. Pro-Kurd di navenda van pirgirêkan de cih digirin. Ji bo çareseriyê rêyên sereke yên peydakirine cotkarî û xwedîkirina heywanan in. Giraniya xwe dane van herdu qadan. Ji bo ji dijminê xwe jî rizgar bibin xwe avêtine baniyên çiyan. Ev herdu xislet îro jî ji bo Kurdan du hêmanên bingehîn ên hebûnê ne. Hiyarerşiya serwer a Pro-Kurdan timî di nava şaristaniya dewletên li ber serê xwe de heliyan û bi vî awayî pirsgirêkên xwe çareser kirin. Lê komên kedkar ên mayî weke ezbetên eşîr û qebîleyan ên neqediyan, timî di navbera deşt û çiyê de bi koçerî, cotkarî û xwedîkirina heywanan di şerê manûnemanê de li ber xwe dan da

ku tine nebin. Bi giştî yên li çiyê, cotkarî û heywan xwedî kirin Kurdî bûn. Bêguman îstîsna vê pîvanê pûç û betal nakin. Bazirganî û zenaetkariya bajaran jî bi giştî pîşeyê Ermenî û Suryaniyên îro bû. Mîna ku bi awayekî xwezayî kar li hev hatibû dabeşkirin. Gelên bingehîn ên Dîcle-Firatê bi diyalektîkeke jiyanê bi vî awayî bi hevdu ve hatibûn girêdan.

Gelên bingehîn ên em behsa wan dikin cara pêşî bi Xirîstiyantiyê ji hev gelekî cihê bûn. Gelekî beriya vê jî xwedayê têgînî yê Brahîm Yehova cihêbûneke bi koktir temsîl dikir. Divê mirov ti carî ji bîr neke ku pirsgirêkên civakî yên ji nava şaristaniyê derdikevin timî xwe bi dîn û xwedayên nû îfade kirine. Çiqasî têgînên dîn û xweda yên bi nakok pêk hatine, pirsgirêkên civakî jî ewqasî pirr cure û mezin bûne. Dînê Zerdeştî li Zagrosan cotkarî û heywan xwedîkirinê mezin û pîroz dike ango xwedatiya wan îfade dike. Lê xwedayên Sumer, Babîl, Aqad û Asûran bajêr, bazirganî, dewlet û xanedaniyê nîşan didin. Vê jî eşkere dibêjin. Wexta ku Xirîstiyantî cara pêşî weke dînê mezlûm û xizanan bi gewde bû, ya rastî vê yekê dîsa lêgerîna çareseriyê bi ziman û dînê xwedê ji bo pirsgirêkên civakî îfade dikir. Wexta ku Mûsewîtî weke dînê qebîleyê derket holê, Xirîstiyantiyê jî jê weke dînê gel şax berda. Ev dibe gava herî mezin a pêşî ber bi ummet û ekumentiyê ve tê avêtin. Muhammedîtî di dema derketina xwe de herçiqasî gel û ummetê esas bigire jî di pêvajoya seltenetê de hegemonya çîna serwer weke dînê şaristaniya dewletê ava dike.

Kurdîtiya serdema navîn mîrateya xwe didomîne. Ango Kurdîtiya ji derketina holê ya Îslamê salên 600'î heta bi salên 1800'î ketina modernîteya kapîtalîst a Rojhilata Navîn. Tebeqeya jor a pêkhatî, mîr, beg, reîs û şêx bi şaristaniya serwer re (Ereb, Fars û Tirk ferq nake) dibin yek û di berdêla wê de xeftanê Kurd diterikînin. Li gorî berjewendiyên wan nîne ku Kurdîtiyê weke dewlet bijîn. Berjewendiyên wan dike ku ew bibin Ereb, Fars û Tirkekî baş. Bi vî awayî pirsgirêkên civakî ji bo Kurdan qat bi qat zêde bûne. Hem weke nasnameya bindest hem jî weke nasnameya çandî ya bêbextî lê hatiye kirin pirsgirêkên wan kûr bûne.

Gelo Kurd bûbûna dewlet wê pirsgirêkên wan ên serdema navîn çareser bibûna? Di dema sosyalîzma pêkhatî de fikreke bi vî rengî çêbibû. Fikreke welê pêkhatibû ku bibin dewlet wê pirsgirêka gelan û nasnameyan heta dawiyê çareser bibe. Ji ber ku

sosyalîzm jî bi dewleta proleter re wekhev hatibû dîtin, divê mirov li ber vê fikrê matmayî nemîne. Me xem dixwarin ka çima dewleteke me jî çênebûye. Lê ya rastî, fikra şaristaniya demokratîk piştrast dike ku dewlet bi xwe çavkaniya derdên mezin e. Tiştekî bi navê dewleta Ereb, dewleta Fars û dewleta Tirk tinebû. Ev leylanên xapînok ên dewleta netewe bûn; hem jî di nava sedsala dawî de! Dewleteke hevpar a Îslamê hebû. Herçiqasî carnan di çarçoveya berjewendiyan de şer bikin jî hukemayên hakim di nava yekîtiyê de bûn. Îslamiyet wekî din gelê xwe û ummeta xwe hebû. Dinya wan ji hev cihê bûbû. Dinyaya pirsgirêkan bû ku her diçû mezin dibû. Bi vî awayî du qutbên bingehîn hebûn. Bi qasî çareseriyan pirsgirêk jî hevpar bûn. Bi navê xwedê û dîn dihatin îfadekirin û hewl didan çareser bikin. Herçiqasî Kurdîtî, Erebtî, Tirkîtî û Farstî weke çandekê hebin jî pirsgirêkên wan bi referansa dînan, mezheb û dînê hevpar dihatin ziman. Ne Emewî û Abbasî bi tenê bûn dewleta Ereb, ne jî Selçûkî û Osmanî bi tenê bûn dewleta Tirk. Rêûresma dewleta Farsan jî ne dewleteke nijad û zuriyetê bû. Bi dewletbûna tebeqeya jor a qewmî û etnîk hebûna xwe ya çînî bi hêz dike û hemnijadên xwe yên mayî jî diavêje geroneka pirsgirêkên civakî. Kurd, Ermenî, Asûrî, Rûm, Tirkmen, Bedewî û Farsên nebûne dewlet rastiyên çandî bûn avêtibûn nava geroneka pirsgirêkên bi vî rengî.

Dema ku modernîteya kapîtalîst bi hêmanên dewleta netewe, kapîtalîzm û îndustriyalîzmê ket Rojhilata Navîn, weke ku naqosên mirinê lê bidin ji bo gel û nasnameyên çandî yên ku di serdema navîn de hatine şêlandin û hilhilîne, û çanda wan her diçe bêhtir di bin zext, mêtinkarî û bindestiyê de bû. Ev gelên ji zû ve ji aliyê hakim û hukemayên xwe yên tebeqeya jor ve li xiyanetê rast hatine, mîna qadeke nû ya nêçîrê ya modernîteya kapîtalîst in. Ji serê sedsala 19. ve pêşî li ser navê dewletokên netewe ew bi hev dan qirkirin. Tevî vê yekê jî di karên îndustriyalîzm û kapîtalîzmê de ku bi hêrsa karê ti astengiya li pêşiya xwe nas nakin, ji heywanan xirabtir hatin xebitandin. Ew veguherandin kar û sermayeyê. Xerîbketin bû sê qatî: Xerîbketina serdema destpêkê, serdema navîn û serdema nû.

Milliyetgiriya li ser her çandê hat ferzkirin, Kurdan jî ji felaketên wê para xwe girt, hem jî pareke herî zêde! Dewletokên wan ên netewe bi serketinê bi encam nebûn. Tebeqeya jor dîsa bi

şêwazekî hêjayî mîrateya xwe di nava dewletokên netewe de cihê xwe girt û di berdêla vê de xiyanetkirina li çanda gel a ji rêûresmê, rewa dît. Van kesan bi helwesteke ji qral bêhtir qral in, îdea dikirin ku ji Ereb, Fars û Tirkan baştir Ereb, Fars û Tirk in, ji bo vê jî ketibûn nava pêşbaziyê. Çiqasî xiyanet li nirxên çandî û nasnameyan bihata kirin, ev xiyanet vediguherî ewqasî berjewendî, pere û mûçe. Kurdan wer bawer dikir ku bi xwesipartina çandinî, keriyên heywan û çiyayên xwe ku bi hezaran sal in ji dema Pro-Kurdan heta niha du sedemên hebûnê yên pîroz in, wê karibin li beramberî tinebûnê hebûna xwe biparêzin.

## A- DI TÊKILIYÊN KURD-TIRKAN DE DIYALEKTÎKA DÎROKÎ

Di çarçoveya vê vegotina giştî de mirov hê ji nêz ve li têkilî û nakokiyên dualîteya Kurd-Tirk binêre û bi awayekî berbiçav binirxîne, pirsgirêkbûyîna wan û çareseriyên muhtemel wê zelal bike. Di geroneka dijwar a zorê de mirov ne dikare li pirsgirêkan û ne jî li rêyên çareseriyê baş serwext bibe. Eger serwextbûn û rohnîbûn bi xwe nêzî heqîqetê bin, mirov dikare bibêje nîvê çareseriyê pêk hatiye. Jixwe nîvê din jî li ser rêya hatiye vekirin bi gavavêtinên di cih de temam dibe.

Selçûkî weke ezbet û beg wexta gihiştin sînorên Kurdistanê (Bi îhtîmaleke mezin gotina Kurdistanê Siltanên Selçûkiyan ên gihiştin sînorên çandî yên Kurdan çêkirine, yan jî kirine were bilêvkirin), bi sîleha biratiyê ya Îslamê şerê li dijî Bîzansan pêşniyar kirin. Ji ber ku pirraniya Kurdan bi xwe jî Îslam qebûl kiribûn û li hemberî Bîzansan gelek caran paşve ketibûn, destek dan pêşniyara şerê hevpar were meşandin. Siltan Alparslan di Gulana 1071'ê de li paytexta Kurdan a wê demê Meyafarqînê (Silîva îro) li cem beg û eşîrên Kurdan li rêya hevgirtinê digeriya. Hem ji beg hem ji ezbetan hêzek li hêza xwe zêde kir û tê texmînkirin nîv bi nîv ev hêz ji Kurdan pêk dihat. Bi vê hêzê gihişt serketina xwe ya di Tebaxa 1071'ê de ku qonaxeke nû ya dîrokî tê hesibandin. Heta rola hêzên beg û ezbetên Kurdan di vî şerî de rast neyê analîzkirin, wê têkiliyên di navbera beg û ezbetên Kurd û Tirkan de têra xwe ji hev neyên derxistin. Serketin stratejîk bû. Deriyê Anatolyayê li beg û ezbetên Tirkan heta ser piştê vedikir. Ji bo ezbet û begên Kurdan jî tehlûkeya Bîzansê û encamên wê ji holê radikir. Gelekî girîng e

ku têkilî li ser vî bingehî bêne danîn, ji ber ku di diyarkirina siberojê de bi roleke esasî radibe.

Paşê ezbet û begên Tirkan bi Nava Anatolyayê, Rojavayê Derya Spî û Derya Reş ve gavavêtin û bi vî awayî li Anatolyayê zêde bûn. Di vê demê de ezbet û begên Kurdan jî ji berfirehkirina cih û mezinkirina hêza xwe paşve neman. Ezbet û begên Tirkan ti wextî li xwe danenîn û nefikirîn ku deverên Kurd lê bi cihbûyî û serwer, rêûresmên wan ên çandî yên li van deveran bi dest bixin û bikin yên xwe. Hevgirtina stratejîk a di navbera wan de, çanda jiyana hevpar û piştgiriyê ev ji wan dixwest. Di vê navberê de gelên Ermenî û Asûrî zêdetir li bajaran hebûna xwe bi dostanî dewam kirin. Di navbera wan û Bîzansiyan de pirsgirêkên mezhebî hebûn. Ji lewra di dûrketina Bîzansê ji herêmê de zêde zirara wan nebû.

Herçiqasî di vê demê de li Kurdistanê hin begtiyên Tirkan bi navê Artûkî, Qerekoyûnî û Akkoyûnî hatibin avakirin jî temenê van begtiyan kin bûye û ezbetên jê dihatin jî pirranî bi awayekî xwezayî di nava çanda Kurdî de asîmîle dibûn û diheliyan. Mirov îro jî dikare şopên vê rastiyê bibîne. Kurdan jî di dema Îslamîk de tevî gelek begtiyên xwecihî jiyana xwe ya civakî bi eşîrî û qebîleyî bi pirsgirêkên xwe yên giranbûyî dewam dikir. Wesf û rengê wan ê qewmî pêş dikevin, diguherin. Lê çawa ku li cem ezbetên Tirkan jî em dibînin tebeqeya jor begtiyên xwe di xizmeta şaristaniyên cûrbicûr de pêk tînin, beşên jêr jî weke Kurmanc (Kurdmanc) dabeşî kategoriyeke cihê dibin. Dualîteyeke mîna Tirk-Tirkmen, Ereb-Bedewî di vê demê de bi heman awayî li cem Kurdan jî weke Kurd-Kurmanc bi lez pêk tê. Ezbet û begên Kurd û Tirk heta bi dema seltenetiya Osmanî (li derdora serê salên 1.500'î) bi awayekî zimnî be jî di têkiliyên xwe de ji huqûqên hev re rêzê digirin, li dijî gef û tehlûkeyên ji derve bên, herdu beşên sereke xwedî stratejiyeke hevpar in, û bi giranî bi vê ve girêdayî tevdigerin. Aliyê erênî yê têkiliyê ji aliyê neyênî xurtir e. Di navbera wan de demeke şer û nakokiyên sîstematîk xuya nake.

Di têkiliyên Kurd û Tirkan de duyemîn qonaxa girîng a stratejîk bi belavbûna Împratoriya Osmanî li Rojhilata Navîn destpê kiriye. Di serê sedsala 16. de li Îranê li ser bingehê Şîatiyê Xanedaniya Sefewî rabû. Di navbera vê Xanedaniyê û begtiyên Kurd de tengezariya zêde dibû bi nakokiyên mezhebî zêdetir dibû û bandora vê yekê li ser Anatolyayê xurt bû. Heman nakokî bi

siltanên Memlûkî yên li Misrê re jî pêk dihat. Bandora Memlûkiyan li ser Derya Spî û Başûr-Rojhilat zêde dibû. Pozîsyona begtiyên Kurd xwedî roleke stratejîk bû. Kîjan aliyî bigirin ew alî wê li Rojhilata Navîn bibe hêza hegemonîk. Encamên dîrokî yên helwesta Siltanê Osmanî Yawiz Selîm a hevgirtina stratejîk a ku mîna di navbera du hêzên wekhev de pêk hatibe, bi lez derketin holê. Li gorî hevgirtina pêkhatî, begtiyên Kurdan dibûn xwedî otonomiyeke berfireh û dibûn xwedî erk ji bo hukûmetekê damezrînin. Ji hevgirtinê wêdetir, mîna Împaratoriya Awisturya û Macaristanê rê li ber Împaratoriyeke Kurd û Tirk vedikir. Çavdêrekî baş ê bi baldarî li dîrokê binêre, di ezmûnên pêşî yên şaristaniyên Hîtît-Hûrrî-Mîtanî yên serê salên 2000'î B.Z. de wê naveroka stratejîk a hevpariya Anatolya-Mezopotamyayê bibîne. Yek bêyî ya din nabe. Têkiliyên ekonomîk-polîtîk bi lez dibin yek. Di sedsala muhteşem a Osmaniyan de ev diyardeya dîrokî xwe ji nû ve piştrast dike.

Statuya nû, giraniya begtiyên Kurd ên Sunnî di nava Împaratoriyê de zêde dikir, lê rewşa Kurdên Êzîdî-Elewî û pirsgirêkên beşê Kurmanc girantir, nakokiyên mezhebî û çînî pirr dikirin. Ev statuya hevpar a bi qasî sêsed salan dewam kir, di serê sedsala 19. de bi ketina modernîteya kapîtalîst a Rojhilata Navîn destpê kir, xira bû. Împaratoriya Brîtanyayê ku bi rêya Iraq û Misrê bandora xwe ya li herêmê zêde kir, hewl da milliyetgiriyeke navenda wê Silêmanî ye, pêşde bibe. Isyana pêşî li devera Silêmaniyê ji aliyê lîderên eşîra Baban hat kirin. Ev pêvajoya ku bi qasî dused sal in, bi awayekî diberide, reng diguherîne heta îro tê, li Başûrê Kurdistanê bi pratîka nîv dewleta netewe dewam dike. Isyanên Kurd ên sedsala 19. ji ber wesfên wan ên çînî pro-kapîtalîst milliyetgir in. Bi tevahî milliyetên di nava Împaratoriyê de li ser bingehê dewleta netewe cihê bûn, lê çawa ku hat diyarkirin cihênebûna Kurdan ji Tirkan sedemên xwe yên dîrokî hene. Serê dewleta Împaratoriyê xwe disipêre zêhniyeteke dewletê ya hevpariya tebeqeya jor a ji du milliyetan pêkhatî. Sedemên stratejîk ji dema derketina dewletê ve li ser her şaristaniya li herdu qadan hiltê, ferz dikin ku bi awayekî hevpar tevbigerin. Naxwe wê berjewendî û hebûna civakan li herdu qadan jî bikeve tehlûkeyê. Her pêkhatina siyasî û ekonomîk a derdikeve holê nirxa bêhempa ya hevpartiyê îfade dike.

Ezmûnên siltantiyên Tirk a Selçûkî û Osmanî careke din vê diyalektîka dîrokî piştrast dikin. Têkiliyên di navbera siltan û begên herî li jor de bi demê re veguherîn têkiliyên şêx, axa û bazirganan. Bi Siltan Mehmûd ê II. re (1808-1839) ev têkilî bi temamî têkçûn. Bandora têkbir a moderniteyê nakokiyên di navbera herdu aliyan de her zêde kir û tevahiya sedsalê ji serî heta binî veguherand sedsala isyanan. Negihiştina encamê ya isyanan û hewldanên ji nû ve avakirinê yên Împaratoriya Osmanî li ser bingeha dewleta netewe wesfê rêûresmî yên têkiliyên di navbera herdu milliyetan de xira kirin. Kengî Osmaniyên Ciwan, Jon Tirk û beşê herî milliyetperest Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê (1889) dewletdariya netewe ya Tirk pêşî sergirtî paşê jî eşkere parastin, pêvajoya qutbûnê bi lez bû. Li hemberî vê milliyetgiriya Kurd jî destpê kir xwe nîşan da. Bi awayekî modern pirsgirêka Kurd li vê demê rast tê. Kengî Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê dest bi komîtakariyê kir û li şûna milliyetgiriya Îslamî eşkere berê xwe da Tirkperestiyê, hingê pirsgirêk girantir kirin. Du beş pêk hatin: Milliyetgiriya Tirk a Nijadperest û Milliyetgiriya Îslamî. Kurdan hewl da bihevrebûna xwe ya rêûresmê bi milliyetgirên Îslamî re dewam bikin. Şêxên Neqşî, Mewlana Xalid û Saîd-î Nûrsî weke ekola sereke nûneriya vê meylê dikirin. Li ser împaratoriyê û li ser wesfê dewleta paşê pêk bê bi israr bûn. Îdeolojiya Îslam û ummetê dihat modernîzekirin û ji bo vê armancê dihat bikaranîn. Piştî began (1878) di pêşengiya civakî de rol û bandora terîqet û şêxan zêde bû û wan ev xeta behsa wê tê kirin heta roja me ya îro meşand.

Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê jî nexasim piştî têkçûna xwe ya di Şerê Balkanan de (1912-1913), bêyî ku guh bide hevpartiya dîrokî ya li Anatolya û Mezopotamyayê, di nava dewletê de milliyetgiriyeke nijadperest meşand. Di vê milliyetperestiyê de cih ji Kurdan re tinebû. Mîna Ermeniyan wê ya erdên xwe biterikandana yan jî wê bi awayekî bihatana tinekirin. Çavkaniya vê polîtîkayê pozitivîzma Fransî bû. Bi tenê mafê yê bi hêz hebû bijî; wan hewl dida determînîzma Darwîn a “Yê bi hêz dikare bijî” mîna rastiyeke zanistî be, pêk bînin. Hovîtiya moderniteya kapîtalîst di vir de dehşeta xwe hemûyî nîşan dide. Ne bi tenê ya Ermenî, Rûm, Suryanî û Kurdan, vê îdeolojiya hişk a pozitivîst rewşa Tirk û Ereban jî kir ku nikaribin bijîn û vê jî kir ku

Împaratorî di destê Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê de bi dawî bibe. Lê bandorên wê serdestiya xwe di Komara Tirkiyê de jî dewam kirin. Ji ber ku wesfê Jakobenîk ê şoreşa Komarê, hevgirtinên xwe sipartibûyê û pêşengiya Mistefa Kemal di beşên berê de hatibû nirxandin hewce bi dubarekirina wan nîne. Mîna hevgirtiyên din Kurd jî hêmanên damezrîner ên Komarê bûn. Çawa ku di tevahiya dîrokê de bû, dîsa weke hevparekî stratejîk hem di rizgariya ummetê de û hem jî di avakirina Komarê de Kurdan cih girtiye.

Di berdêla Mûsil-Kerkûkê de ji Împratoriya Brîtanyayê destûr hat wergirtin ku di nava sînorên mayî yên Mîsaq-î Mîllî de dewleta netewe were avakirin û bi vê hem parçekirina li çar beşan a Kurdan pêk hat, hem jî li ser beşê di hundir de mayî polîtîkayên ji bo tinekirina hebûna wan bi lezeke bêrehm destpê kir û ev polîtîka timî bi heman lezê hatin meşandin. Di vê navberê de divê ez vê jî bibêjim, Peymana Qesr-î Şîrîn a di sala 1639'an de bi Xanedaniya Sefewî ya Îranê re hat mohrkirin, li gorî hevgirtina stratejîk a di navbera herdu milliyetan de nebû. Bi giranî Kurd di nava sînorên Împratoriya Osmanî de bûn. Sînorên Mîsaq-î Mîllî ji sedî sed li ser bingehê yekîtiya Kurd û Tirkan hatibûn destnîşankirin. Peymanên bi Ingilîz û Fransiyan re hatibûn mohrkirin, ji sedî sed li gorî Mîsaq-î Mîllî nebûn. Ev peymanên ku Kurd bi pirsgirêka herî mezin a manûnemanê ya dîroka wan ve kilît kirin, ji sedî sed li dijî biratî û hevpartiya gelekî behsa wê tê kirin a hezar salan a di navbera Kurd û Tirkan de ye. Lê pirsa nayê pirsîn ev e, ji van peymanên li gorî hevgirtin û biratiyê nînin, kî berpirsiyar e? Tu yê bi bahaneya Kurd bi hin hêzên hegemonîk re ketine nava têkiliyan di berdêla hin tawîzan de hebûna wan bikî çar parçe, hem jî tu yê bibêjî “Hin Kurd biratiya hezar salan xira dikin!” Ev helwesta ku çi qasî îronî be, ewqasî jî rastiyan paşguh dike, pirsgirêka Kurd di tevahiya dîroka Komarê de anî ber qirkirina çandî û tinekirinê.

Bi rastî, pirsgirêka Kurd ji ber têgihiştin û kirinên ruhê dostaniya stratejîk a hezar salan didin aliyekî û înkar dikin, ji pirsgirêkeke bi tenê ya ekonomîk, civakî, siyasî û eskerî derket, veguherî meseleyeke çandî ya manûnemanê. Isyanên 1925-1940'î çavkaniya xwe ev pirsgirêka manûnemanê bûn û ji bo vê armancê jî hatin bikaranîn. Eşkere ye ku zêhniyeta Îttîhadgir, hem dixwest Kurdan li derveyî dewletê, hem li derveyî civakê bihêle, hem jî ferz dikir ku Kurdan ji civakbûnê derxe. Ji lewra ev polîtîka salên

dûrûdirêj veguherî pirsgirêka “Gelo Kurd hene yan tinene?” Kurd ji hêmanê damezrîner ê Komarê derxistin û kirin pêvajoya tinebûnê. Eger piçekî empatî were kirin, wê were fêhmkirin ka bi vî awayî bi ser Kurdan de çûyîn çiqasî bi dehşet e, û mirovî matmayî dihêle. Pirsgirêka Kurdan pirsgirêka parçebûnê nîne, Kurd dixwazin ji pêvajoya tinebûnê derkevin û car din hêjayî dîrokê xwe bigihînin statuya stratejîk a dostanî, hevpartî û biratiyê. Serwextbûna li vê rastiyê, bi tenê bi têgihiştineke empatî ya bi wijdan pêkan e.

## B- XETIMÎNA PROJEYA KOMARÊ YA MODERNÎTEYA KAPÎTALÎST û DERKETINA HOLÊ YA PKK’Ê

Hêzên di avakirina Komarê de bi rola bingehîn rabûn, nûneriya lihevkirineke demokratîk dikirin. Pêşengtiya Mistefa Kemal hem sedem hem jî encama vê lihevkirinê ye. Destûra 1921’ê û rengê avabûna yekemîn Meclîsa Millet a Mezin a Tirkiyê jî vê lihevkirinê pirr eşkere rave dike. Hebûna ummeta Îslamî û pêdiviya parastina wê timî tê destnîşankirin, timî tê diyarkirin ku Kurd û Tirk du hêmanên bingehîn ên millet in (bi Erebî maneya ummetê millet e), behsa antîemperyalîzmê û dostaniya bi Sovyetê re tê kirin. Di nivîsên Meclîsê de jî şopa van diyardeyan têra xwe heye. Sosyalîstbûn û Kurdistanîtî bi awayekî xwezayî têne dîtin. Eşkere ye ku dema şoreşa Jakobenîk a Komarê, konsensusa giştî ya civakê îfade dike. Împaratoriya Brîtanyayê di vê demê de hedefa bingehîn e. Lê piştî ku bi şoreşê pêşî li dagirkeriyê hat girtin û dor hat tercîha nîzameke nû, ji kadroyên Îttîhadgir komeke alîgirên Împaratoriya Brîtanyayê çi bi provokasyona Şêx Seîd, -yekser hewldana reşkujiyê jî di navê de- çi jî bi gelek komplo û provokasyonan hewl da Mistefa Kemal bêtesîr bike û ji sala 1925’an ve di vî warî de ji gelek qonaxan bihurî, bi pêş ket. Koma em behsa wê dikin di dema serokwezaretiya Îsmet Înonî de bi hêztir bûye. Mistefa Kemal ji mirina wî re kêm wext bimîne Înonî tesfiye dike, lê ev yek encamê neguherîne.

Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn hegemonya dinyayê ket destê DYE’yê û vê yekê karê vê komê hêsantir kir. Îsmet Înonî tevî ku xwe bêalî nîşan dide jî nêzî vê komê ye. Jixwe ne Partiya Demokrat, pêşengiya Înonî têkiliya stratejîk a bi DYE’yê re pêk aniye. Dewleta

Tirk hê nebûyî endamê NATO'yê di sala 1944'an de koma pêşî ya serbazan şandin DYE'yê û li wir perwerde kirin. Têkilî di dema DP'ê de bi lez bûne, sala 1952'an di nava artêşê de yekser bi pêşengiya DYE'yê rêxistina Gladîo ya bi ser NATO'yê ve, hatiye avakirin. Gladio li Tirkiyê xwe pêşî bi navê Desteya Tetkîk a Seferberiyê bi rêxistin kiriye. Lêçûn û rêveberiya wê ji aliyê DYE'yê ve hatine amadekirin. Qadên ekonomîk, civakî, polîtîk, eskerî û çandî jî di navê de rêxistinê li tevahiya qadan reh û şax berdane û xwe li wan bi rêxistin kiriye. Çawa ku tevahiya partiyên siyasî yên legal kontrol kirine, ji bo çîna karker jî bixe kontrolê di sala 1952'an de bi Gladîo'yê re Tirk-Îş saz kir û bi vî awayî çîna karker kiriye kontrolê. Li sendîka û Partiyên Kominîst ên li ser xeta Sovyetê zordestiyeke bêrehm hatiye kirin. Jixwe armanca wê ew e, piçûk be jî tiştekî kominîst û sosyalîst biçizire, bikeve nava Tirkiyê divê tavilê were pelixandin. Ji ber ku Kurdîtî jî bi kominîzmê ve girêdayî dihat hesibandin heman zordestî aqûbeta wê bû. Di vê navberê de, Îsraîl nû tê damezrandin û di navbera wê û Tirkiyê de têkiliyên stratejîk û veşartî mewzûbehs in. Di nava Kurdan de jî bi malbat û şexsiyetên paşverû û dîndar ên ji rêûresmê têkiliyên bi şêwazê Gladîo'yê pêşde dibin. Bi monarşiyên Îran û Iraqê re jî têkiliyên bi heman rengî datînin. Rêxistina CENTO bi rola ban a van têkilyan radibe. Li Rojhilata Navîn bi modeleke bi vî rengî hewl didin pêşî li kominîzmê bigirin.

Eşkere ye ku ev modela bi pêşengiya DYE'yê hat pêşdebirin, rengê nû yê modernîteya kapîtalîst e ku ji salên 1950'î ve bi şerê sar girtiye. Komara Tirkiyê modernîteya bi DYE'yê re hatiye nûkirin ji bo di serî de li welatê xwe û li Rojhilata Navîn bi cih bike bi rola sereke radibe. Modernîteya Mistefa Kemal dixwest bi rê ve bibe cuda bû. Nêzî şêwazê Sovyetê bû û xwe disipart dostaniya stratejîk a bi Yekîtiya Sovyetê re. Heta ku em vê cudahiya navbera wan nebînin, emê nikaribin hêmanên modernîteyê yên salên 1950'î û heta salên piştî 1925'an tevî hebûna Mistefa Kemal hatin pêşdebirin, baş analîz bikin. Di herdu modernîteyan de pêkanîna hêmanên dewletdariya netewe, kapîtalîzm û îndustriyalîzmê ji aliyê çînî, siyasî, dîplomatîk û ekonomîk ve xwedî tercîhên cuda yên ciddî ne. Di encamê de, di têkoşîna hegemonîk de pêşî Împaratoriya Brîtanyayê, paşê jî DYE bi ser ket. Jixwe di navbera herduyan de girêdaneke stratejîk hertim heye. Bi pêkanîna vê

modernîteyê, bi tenê lihevkirina demokratîk a Komarê tesfiye nekir, di şerê li beramberî hemûyan de destpêkirî, hêzên bingehîn ên hevgirtî jî kirine dijminên hev. Nuqteya Mistefa Kemal nedikarî lê serwext bibe ev e. Ji ber ku gelekî di bin bandora îdeolojiya pozitivîst de ye nikare li vê rastiyê serwext bibe. Herçiqasî xwesteka wî ya ji bo serxwebûn û azadiyê, rêz û hurmeta wî ya mezin ji çanda xwecihî û çanda Anatolyayê re karibe pêşiyê li rola hê texrîbkar a pozitivîzmê bigire jî nikarîbûye pêşiyê li bandora wê bigire.

Dogmatîzma pozitivîst a li şûna dogmatîzma dînî hat bi cihkirin li Tirkiyê hê jî li ser beşê milliyetgir ê laîk xwedî bandoreke mezin e. Ev laîsîzm weke tê bawerkirin, komargeriyeke demokratîk, heta komargerî nîne, berevajî despotîk û dîktatoryel e. Şêweyê tîpîk ê pêkanîna wê Îttîhadgirî û CHPgirî ye. Tezên Fîlozofê huqûq û siyasetê Carl Schmitt li ser teolojiya dînî û siyasî ya Elmanya salên 1920 û 1930'yan ji bo Trikiyê îro bêhtir di cih de ne. Beranberê tevahiya têgînên siyasî yên modernîteyê di serdema navîn de û heta li gorî min di teolojiya serdema destpêkê de hene. Orjînalên xwe Sumerî ne. Ya pozitivîzmê kirî çî ye, bi cîla modernîteyê boyax kiriye û li ser navê 'zanistî' xistiye piyaseyê û li ser navê kapîtalîzmê pêşkêş kiriye. Guman û dudiliyên Mistefa Kemal hene. Gelekî tengezar e, heta sibehan pirtûkên li ser şaristaniyan dixwîne. Ji ber ku nakokî û wekheviyên di navbera pozitivîzm û dîn de dibîne. Bi ya min mirov rewşa Mistefa Kemal bi vî rengî şîrove bike wê ev zêdetir rast be û zêdetir rewşê zelal bike.

Der barê modernîteyê de cehaleteke kûr û bêbaweriya tevî dogmatîzmê ya tevahiya kadroyên elîtîst ên Komara Tirkiyê hebû. Serwextbûna li vê rastiyê gelekî girîng e. Ev rastî ji bo tevahiya dualîteyên çepgir-rastgir, Elewî-Sunnî, Tirk-Kurd û hwd. di cih de ye. Di demên Komarê de şerên di navbera ummetgirên Îslamî, sosyalîst, milliyetgirên Kurd û heta şerê beşek milliyetgirên Tirk bi hêmanên modernîteya kapîtalîst re baş ji hev nehatiye derxistin ka bê çawa şerên behsa wan tê kirin rê li ber wan hatiye vekirin. Nexasim ji aliyê DYE'yê ve bi rêdana ber Gladîo'yê encamên xeternak derketine holê. Ev qederê sed salî ye ku rêxistin û têgihiştinên darbekar û komîtakar ên di nava dewletê de têkiliyên xwe bi hêmanên modernîteya kapîtalîst re hene û heta ev têkilî ji hev neyên derxistin mirov nikare ne li krîzên dewletê ne jî li krîzên

civakê, tengezarî û şeran serwext bibe. Têkiliyên hêzên hegemonîk ên sîstemê, nexasim rola Brîtanya û DYE di van şeran û tengezariyê de divê were zelalkirin û ev yek hem di warê demokratîkbûnê de û hem jî di warê çareseriya pirsgirêka Kurd de xwedî rolekeke heyatî ye. Ji bo mirov karibe fêhm bike ka çima Mistefa Kemal û yên xwe pêre dilsoz hesibandin tevî hemû hewldanên xwe yên azadîxwaz û serxwebûnxwaz bêkêr mane û heta berevajî encam dane, divê mirov fêhm bike ku di projeya modernîteyê ya Komarê de kîjan hêzên hundir û derve bi bandor bûne û divê mirov li pêkanînên ekonomîk, civakî, siyasî û eskerî yên hegemonyayên ew bi wan ve girêdayî ne serwext bibe. Darbeyên eskerî û dewamên wan ên sivîl jî di nava guloka van şer û nakokiyan de cih digirin û jê wêdetir bi ti roleke din ranabin. Tespîta hevpar a civaknasan e ku bi tevahî hewldanên van ên xelaskariyê rewşê hê girantir û asê dike. Projeya modernîteyê ya Komarê ji serî ve seqet çêbûbû. Ev seqetiya divê bi israr were destnîşankirin ew e, Komar bi sê hêmanên hêzê yên bingehîn ên rizgarî pêk anîne û Komar ava kirine xistine nava nakokiyê û bi hemûyan re dane şerkirin. Eger li gorî rêzê em bînin ziman, rêza salên 1925-26, 1930, 1937-38, 1945-50, 1960, 1970, 1980, 1997, 2001-2002 jî seqetiya binyewî eşkere nîşan dide.

Hêmanên bingehîn ên damezrîner ên Komarê di dema 1965-1980'î de ji nû ve xwestin hay ji hebûna wan çêbibe. Bereya hêza hegemonîk a ji rêûresmê û olîgarşiya li dijî xwe hê baş nas nekiribûn, ji hev dernexistibûn, ji bo gera li hebûna xwe bi hêrs gav avêtin. Çawa ku tê îdeakirin di pozîsyona şoreş an jî dijşoreşê de nebûn, lê wer hatin nîşandan. Wexta serê xwe rakirin, serê beşekê ji wan şikandin, yên mayî jî ketin nava wan, çizirîn nava wan û ew kedîkirin. Heyf û mixabin, hêzên li dijberî hev hatin bikaranîn di wê rewşê de nebûn ku li rola Gladîo'yê serwext bibin. Bêguman li vir cudahiyeke mezin di navbera yên ji dil û bi bawerî ji bo serxwebûn, azadî û wekheviyê têdikoşin û dijberên wan de heye û ev ne ya guftûgoyê ye. Lê têkiliya wan a bi darbeyan re jî rastiyek e. Di vê demê de rêxistiniyên milliyetperest û Îslamîgir ên antîkominîst têkiliya wan bi taktîkên Gladîo re berbiçavtir in. Bandora van hêzan li ser jiyana çandî û ekonomîk jî girîng e. Ji hêmanên modernîteya kapîtalîst rêveberiya jor a Gladîokaran li ser tevahiya qadên jiyanê diyarker e. Di vê de kontrola li ser avahiyên siyasî û artêşê li rêza pêş e. Bi vî awayî bikaranîna rêveberiya

Komarê, eşkere nîşan dide ku ev dewama komîtakariya Îttîhad û Teraqiyê ye. Ji bo têkbirina vê, hewldanên M. Kemal Atatirk têrê nekirine. Ji lewra heta rêûresma komîtakarî û darbekariyê li dawiyê nemîne, wê wesfên Komarê yên huqûqî û demokratîk, herweha aramî û nîzama wê pêk neyên. Di çarçoveya van analîzan de mirov dikare pirr baş fêhm bike ku avahiya Komarê ya xetimî ye, û timî pirsgirêkan diafirîne di derketina PKK'ê de bi rola diyarker rabû ye. Salên 1970'î bi rastî demeke welê ye, gavavêtinên demokratîk bi hêz dibin. Darbeya 12'ê Adarê di wê hêzê de nebû vê pêvajoyê rawestîne. Hêzên civakî yên di damezrandina Komarê de bi bandor bûn ji nû ve derdikevin ser dika dîrokê; sosyalîzm, Îslamîgirî û milliyetgiriya Kurd di nava Komarê de ji xwe re li meşrûiyetê digeriyan. Bi daxwazên demokratîk têra xwe barkirî bûn. Eger ev daxwaz bi kirinên faşîstane û darbeyê nehatibûna tepisandin, bi demokratîkbûnê dikarîbûn bigihiştina çareseriyê. Lê belê tercîh kirin ku krîza li cem hêmanên modernîteyê û şerê sar bi rêbazên zordesttir û her diçe dibin faşîst, dewam bikin. Komara Tirkiyê bû welatekî welê, herî zêde lê kontrola Gladîokaran bi şêwazekî dijwar meşiya. Rejîma 12'ê Îlonê weke mînaka vê kontrolê ya herî zêde mirovan bibizdîne pêk hat.

Ji ber şêweyê pêkhatina navxweyî ya Kurdan û ji ber aloziya li Rojhilata Navîn PKK bi temamî nehat tepisandin. Darbeya 12'ê Îlonê hema bêje di nava bîstûçar saetan de naverast bêdeng kiribû. Lê di mijara Kurdan de xapiyabû, ji ber ku sedemên hûrûkûr ên civakî hebûn. Bawer dikirin ku Kurd weke civak û gel qedandine. Piştî pelixandina isyanan û demeke asîmîlasyonê ya gelekî hişk pêk hatiye, yeqîn dikirin ku Kurd wê careke din bi ser xwe ve neyên. Nexasim di serî de çîna navîn û burokrasiya li ser bingehê hêmanên modernîteya kapîtalîst pêk hatibûn û mantalîteya (zêhniyet) nû ya civakî, difikirî ku Kurd ji nava pelên dîrokê hatine rakirin. Rola wan a di dîrokê de ji bîr kiribûn. Tek tûk ên mayî bi mexlûqên hov re wekhev didîtin. Tebeqeya jor ji zû ve bi helwesta ji qral bêhtir qral radibû û bi vî awayî bi hosteyî rola xizmetkariya desthilatdariyê dewam dikir. Hêmanên terîqetgir û mîlliyetgir ên bi DYE'yê re di nava têkiliyê de, ji pêwendîdanîna bi berxwedan û azadiyê re zêdetir li ser zemînekî dijber dihatin bicihkirin. Di van şert û mercan de herçiqasî zirar û ziyaneke mezin li PKK'ê bûbe jî

dikarîbû bi gundî û xizanên bajarî yên Kurmanc ên hêza civakî ya Kurd pêk tînin, têkiliyê deyne. Ji hestên welatparêzî, Kurdîtî û awayê wan ên çandî sûd werdigirt û heta ew ji nû ve diafirandin. Tevî hemû pelixandin û parçebûnê di xwezaya civaka Kurdan de hêmanên avabûnê hebûn. Ya pêdivî pê hebû, bi kêmanî hestên welatparêziyê û hin têgînên serwextbûnê bûn. Li cem PKK'ya wê demê ev têgîn û hestên bi bandor têra xwe çêbibûn. Ji bo wê ya hewce kadroyên dîplomatîk û siyasî yên asta jor nebûn, ya girîng ew bû, diviyabû ev têgîn û hest bi lez biketana nava tevgerê. Hinek çalakiyên bi sînor têrê dikirin ku ev ast bihata bidestxistin.

Bi gavavêtina salên 1970î heta serê salên 1980'î bi vî awayî hat. Ji ber ku rejîma 12'ê Îlonê zêde zor bi kar anî, hêzên din ên çepgir û muxalif zû tepisandin û kengî rastiya Zindana Amedê bi çepergirtina li Rojhilata Navîn re bû yek, wê êdî destpêkirina pêvajoya 15'ê Tebaxa 1984'an zehmet nebûya. Ya rastî mirov dikarîbû vê pêvajoyê di dema 1982'an de jî bida destpêkirin. Ji ber ku hin hêmanên li çiyê wezîfeya xwe baş bi cih neanîn pêngav paşve hat xistinî Tebaxa 1984'ê. Şerê Îran-Iraqê jî alîkarî kir ku ev çarçove pêk bê. Lê tevger ti demê ji Bakurê Kurdistanê kêm nebû, hebûna xwe her parast. Mirov nikare behsa gerîllatiyeke hosteyane bike. Karîkaturê gerîllatiyê derket holê. Dewlet li benda pênvgava 15'ê Tebaxê nebû û ev ji bo tevgerê avantaj bû, lê ev jî xirab hat bikaranîn. Tevî ku dewletan û hêzên Başûrê Kurdistanê muxalefet dikirin û destê xwe dixistin navê, çepergirtina li Rojhilata Navîn têrê dikir ku alîkariyê ji tevahî beşên Kurdistanê yên hatine parçekirin û Kurdên li Ewrûpayê bigire.

Kengî şêwazê destwerdana rejîma 12'ê Îlonê encamên bi kêr bên dan, bi desteka NATO'yê dema Rewşa Awarte û JÎTEM'ê destpê kir. Gladîo'ya NATO ya bi pêşengiya Elmanyayê ji 1985'an ve bi awayekî bi bandor ket dewreyê. Komployên Papa û Palme, herçiqasî di nava hesabên giştî de cihê xwe hebin jî yekser an jî neyekser girêdana xwe bi derketina gerîllayên li Kurdistanê re hene. Di pêvajoya derketina holê ya PKKê salên navbera 1973-1983'an de aliyê îdeolojîk, siyasî sereke bû, aliyê çekdarî piştre dihat ango di rola duyemîn de ye. Di gavavêtina 1984'an de aliyê wê yê çekdarî sereke bû, lê pêşketina xwe ya îdeolojîk û siyasî jî dewam dikir. Divê mirov gelekî li ser rola JÎTEM'ê û Rewşa Awarte bisekine. Tê zanîn ku di nava tevgerê û li derveyî wê de gelek

çalakiyên birizînin pêk anîne. Çalakiyên di wan de li zarok jinan jî nehatine rehmê, pêk anîne, beşên divê nebin hedef bûne hedef, meylên heta dawiyê li gorî xwe û kêfa xwe û xwedîderneketina li wezîfeyên herî piçûk, mirov dikare di vê çarçoveyê de bihesibîne.

Lê ya seyr û balkêş ew e, çiqasî hewl didan PKK'ê şeytanî nîşan bidin ewqasî jî PKK bi hêz dibû. Bi vê yekê jî mirov bi hêsanî didît ku gelê Kurd çiqasî tî bûye. Tevî ku ji Ermenî, Rûm û Suryaniyan zêdetir Kurd koçber kirin û ji tevahiya pêkanînên li wan kirin qatbiqat zêdetir bi serê Kurdan de anîn jî ev bi awayekî erênî li PKKê vedigeriya. Bêguman şert û mercên cografî û dîrokî di vê de bi tesîr bûn. Bersivdana daxwazeke dîrokî ango xwedîderketina li rûmeta mirovatiyê û parastina hebûna civakî, di pêşketinê de hêmana bingehîn a diyarker bû. Bi serê xwe meşa xwestekên dîrokî divê piçûk neyê dîtin.

Serokkomar Rêzdar Tûrgût Ozal ji 1992'an ve polîtîka wî ya der barê Kurdan de nedihat payîn. Em hinekî dereng li girîngiya wê hayil bûn. Şensê çareseriyê yê bi awayekî ciddî derket holê û bi mirina wî re hat pûçkirin, ez ji bo xwe timî weke zirareke dîrokî bi bîr tînim. Şensê çareseriya demokratîk ê Komarê pêkan bû, lê li gorî min hin hêzên Gladîoyê bi zanîn ev firsend nedan. Serokê Fermandariya Giştî ya Artêşa Tirk ê wê demê Dogan Gureş di serê salên 1990'î de wexta ji Ingilistanê vedigeriya got "Ji bo îmhayê lampeya kesk ji min re vêxistin". Ev gotina wî beşekî vê rastiyê îfade dike. Piştî mirina Tûrgût Ozal darbeya Tansû Çîllerê ket rojevê û bi vê re di nava artêşê û li derveyî wê de bêhejmar û li pey hev komplo pêk hatin, yek ji girêka sereke divê were vekirin ev e. Ji ber ku ajantiya CIA'yê ya Tansû Çîllerê belgekirî ye, ev girêk hinekî sist bûye û ji hev hatiye derxistin. Kuştina gelek rewşenbîrên rastî yên Atatirkparêz û rûsipiyên Kurd, bi hezaran kuştina mirovan bi awayekî mêrkujên wan nediyar, valakirina gundan, bi awayekî cebanî mezinkirina Hîzbûllahê, li gorî min yek ji komployên herî mezin ên li ser Komarê ye. Dema Komarê ya isyankar û komploker a serdema Mistefa Kemal a salên navbera 1924-1927 bi bîra mirov dixe. Di van salan de jî hêmanên demokratîk ên di bingehê Komarê de hatin tesfiyekirin. Ev rewş hê jî nehatiye zelalkirin. Lê eşkere ye ku di vê rewşê de yên bi serketin Împaratoriya Brîtanyayê û modernîteya kapîtalîst in. Di serê 1990'î de şensê çareseriya demokratîk bi komplo, isyan û kuştinên bi heman rengî û tesfiyeya

Kurdan bêencam hiştin û di vê de rola xurt a hegemonya û hevkarên derve divê piçûk neyê dîtin. Kêm mînak hene ku karibin weke alozî, tevkujî, provakasyon û tevgerên demokratîk ên di navbera salên 1993-1997'an de nîşan bidin bê ka kontrola hegemonîk li ser Komarê tê çi maneyê.

Em behsa demekê dikin ku têra xwe balkêş e, û mînakên wê kêm têne dîtin. Ji ber ku di vê demê de wesfên dewletê yên huqûqî, civakî, demokratîk û laîk hatine tesfiyekirin, kontrol ketiye destê JÎTEMê, bi tevahî avahiyên yekdestdar ên hêmanên moderniteya kapîtalîst ji bo xizmetê di hewarê de hatine. Di dawiya vê demê de bi rêya Serokkomarê Sûrî Hafiz Esed rêzdar Necmedîn Erbakan û bi rêya Brukselê li ser navê Beşa Têkiliyên Civakî beşek ji nava artêşê li têkiliyê geriyan û bersiveke erênî ji van lêgerînên wan re hat dayîn. Di navbera aliyan de danûstendina name û agahiyan pêk hat. Lê bi xistina Necmedîn Erbakan û bi derketina min a ji Rojhilata Navîn ev pêvajo jî bi ser neket. Li gorî min divê rola derdorên Gladîokar ên derve û hundir di vê serneketinê de piçûk neyê dîtin. Mumkîn bû ku pêşî li şerê di asta nizm de, pevketin û krîza mezin a Komar hê jî di navê de ye, bihata girtin. Çi agirbesta yekalî çi jî rewşa têkiliyan derfet û îmkan dida vê yekê. Ev hewldan hatin tepisandin û bi zanîn ev pêvajo hat pûçkirin. Bi vî awayî jî şensê çareseriyê ji holê hat rakirin.

Paşê derketina min a Ewrûpayê û gera min a li çareseriyê, pirr eşkere bi destê Ingilistanê hat pûçkirin. Ingilistana bi rêveberiya Gladîo ya Atînayê re hevkarî dikir, bi balafireke taybet a ji Swîsreyê rakir ez revandim Kenyayê û ev bûyer vê rastiyê têra xwe rave dike. Bêguman di operasyonê de welatên Ewrûpa yên endamên NATO'yê hemû hene, lê mejiyê rêveber Ingilistan bû. DYE'yê jî operasyon bi awayekî fermî pêk dianî. Îsraîlê jî rê nîşan dida û mayîna min a li Moskovê jî wê asteng kir, ya rastî berê hem li Kenyayê hem jî li Rojhilata Navîn eşkere ji min xwestibû ez xwe biavêjim wan û penaber bibim. Lê ez pê ewle nebûm û ti carî jî nefikirîm pê ewle bibim. Di şexsê min de dixwestin şensa azad a Kurdan teslîm bigirin. Ez di vê mijarê de ji xwe piştrast bûm ku ez jî di navê de divê ti kesî curetî vê nekirana û lê nefikiriyana. Gelekî balkêş e; dixwestin lîstikên li ser rêveberiya komarê li ser min bilîzin û bi rêya PKK'ê jî li ser Kurdan. Dîsa yên li ser kar, hêmanên

modernîteya kapîtalîst bûn ku bi hezar û yek benî bi hev ve girêdayî bûn.

Ji bûyerên di pêvajoya Îmraliyê de qewimîn min ders girt, lewma ez aram û bi sebir bûm. Di pêvajoya jêpirsîn, dadgerî û girtinê de jî ez xwedî li vê helwesta xwe derketim. Kesên di jêpirsînê de cih digirtin bi taktîkên rojane nêzîk bûn. Bisebirbûn û aramiya min şaş şîrove kirin. Heman şîroveyên şaş di nava rêxistinê de û li derveyî wê jî dihatin kirin. Lê tevî şîroveyên şaş hemûyan jî min sekin û helwesta xwe xira nekir. Di sala yanzdehmîn de jî Ez hê bi tena serê xwe xwediyê vê helwestê me. Tevahiya vê demê ez ji pêvajoyeke parastinê ya çar qonaxî bihurîm.

**Qonaxa Yekemîn a Parastinê:** Di dema dadgehkirinê de min bi pirtûkeke piçûk hewl da **'Manîfestoya Çareseriya Demokratîk'** bînim ziman. Herçiqasî min baş neanîbe ziman jî ev pirtûka min ji bo çareseriya demokratîk di wê astê de bû ku kevirên çarqozî yên quncikan destnîşan bike. Heyf e ku ev ji aliyê derdorên siyasî û hukûmetê ve nehate nirxandin. Pêvajo bi temamî bi serê xwe hat berdan û bawer kirin ku wê bi awayekî xweber çareser bibe. Serokwezîrê demê Rêzdar Bulend Ecevît hewl da ku hin gavên çareseriyê biavêje, lê ji aliyê hevparê wî yê koalîsyonê MHPê ve hat pûçkirin. AKP'ê tew nexwest pirsgirêkê hîç fêhm bike. 'Nexşeyeke Rê' ya belkî berê hatiye xêzkirin di çarçoveya Bakurê Iraqê (Başûrê Kurdistanê) de kafî didît. Ji nameyên ku min ji rêveberiya jor û weke serokwezîr min ji Rêzdar Abdullah Gul û Recep Tayyîp Erdogan re şandin û parastinên min ên ku di nava yanzdeh car cezayê hucreyê di nava hucreyê de kirî, bersiv negirtin. Heta bi sala 2005'an wext badilhewa çû. Pêvajoyeke nû ya çalakiyan xwe ferz kir.

**Qonaxa Duyemîn a Parastinê:** Ev parêznameya min ji du cildan pêk dihat û ji rûniştina pêşî ya doza li Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê re bi navê **'Ji Dewleta Rahib a Sumer Ber Bi Şaristaniya Demokratîk Ve (Ber Bi Komara Demokratîk Ve)'** hat pêşkêşkirin. Min bi vê parêznameyê xwe hûrûkûrtir li çareseriyê ceribandibû.

**Qonaxa Sêyemîn a Parastinê:** Ev parêznameya min bi navê **'Parastina Gelekî'** hat weşandin û ji Avahiya Mezin a Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê re hat pêşkêşkirin. Ev qonaxa sêyemîn

bû. Di vê de pêkhatina pirsgirêka Kurd û çareseriyên wê yên muhtemel hatin berbiçavkirin.

**Qonaxa Çaremîn a Parastinê:** Ez vê pêvajoyê weke pêvajoya çaremîn û dawî bi nav dikim ku ez hê jî di navê de me. Di vê pêvajoyê de li bin navê **'Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk'** min çar cildên parêznameyan temam kirin û cilda pêncan jî ez ê hewl bidim temam bikim. Ez niha bi navê **'Nexşeya Rê'** pirtûkeke piçûk amade dikim ku ev weke şêweyê pêş ê cilda pêncemîn e. Çar cildên parêznameyan li gorî rêzê bi van navan hatin amadekirin: **1-Şaristanî, 2-Şaristaniya Kapîtalîst, 3-Sosyolojiya Azadiyê, 4-Li Rojhilata Navîn Şaristaniya Demokratîk.** Cilda pêncan jî wê navê xwe ev be: **Pirsgirêka Kurd û Çareseriya Neteweya Demokratîk (Parastina Kurdên Di Nava Pencê Qirkirina Çandî de).**

Mirov dikare dema 25 salên dawî (1984-2009) ya têde têkoşîna çekdarî bi rola sereke rabû weke dema şerê heqîqetan binirxîne. Ji ber ku ji şerê rizgariya civakekê wêdetir, derxistina holê ya rastiyan îfade dike. Li nava dinyayê heqîqet berbiçavtir bûne. Pirsgirêkên civakî û dîrokî çiqasî heqîqetên der barê xwe de darî çav bikin, ewqasî jî dikevin ser rêya çareseriyê. Jixwe serketinên eskerî heta nebin şerê rewa yên parastinê, bi tevahî dibin çavkaniya pirsgirêkan. Ji serketin an jî binketina şerê bîstûpênc salan wêdetir, ya girîng ew e, ev şer çiqasî bi roleke çareserker rabûye. Divê mirov bipirse, Şerên Sedsalê yên di navbera Ingilîstan û Franseyê de ji bilî ku piştrast bike Derya Manşê sînor e, wekî din bi kêra çi hatiye. Çaryekê sedsala bihurî di piştrastkirina hebûna Kurdan de diyarker bû. Di dema pêşî de ji hedefên PKK'ê bû ku hebûna Kurdan bi dewleta netewe tacîdar bike. Lê di dawiya demê de hat fêhmkirin ku ev tac hîç hewce nake, berevajî vê, ji sedan ezmûnî hat fêhmkirin ku wê bibe çavkaniya pirsgirêkên nû. Lewma pêkanîna siyaseta demokratîk a civakê manedar û çareserker bûye.

Serwextbûna li pêvajoyên veguherîn û pêşketina PKK'ê di heman demê de dihêle ku mirov bi awayekî têkûz li xwe jî serwext bibe. Di atmosfera şerê sar ê cîhana salên 1970'î de em difikirîn PKK'ê jî di nava bereya sosyalîzma pêkhatî de bihesibînin. Bi kêmanî niyet wisa bû. Jixwe çeperên têde cih girtibû jî ev îfade dikir. Lê asta wê ya entelektuel, hestên şoreşgerî û asta wê ya

têgînan, rê nedida ji vê astê bibihure. Xwezaya civakî ya Kurdan jî materyalê wê di wê rewşê de nebû ku bi têgîn û teoriyên modern were ravekirin. Îradeya şoreşgerî bêhtir diyarker bû. Ji îdeolojiyê zêdetir jiyana azad îlham dida. Ji lewra wexta ku sosyalîzma pêkhatî ji qîmeta xwe ket, pirr jê bi tesîr nebû. Ji partiyeke çepgir a modernîst wêdetir dişibiya tevgereke li ser hîmên exlaqî û baweriyê. Ne ku teorî tinebû, lê nirxa bingehîn a mirov bi hev ve girê didan exlaq û bawerî bû. Li cem civaka Kurd a di pêvajoya şer de belkî sermayeya herî girîng, hêza exlaq e ku hê jî pê hebûna xwe diparêz e, cesareta wî ye, û xweragirtina wî ye ku şert û mercên dijwar ên jiyanê diyar dikin. PKK'ê weke mînakên din modela partiyeke çepgir a modernîst zêde qebûl nekiribû û belkî ev jî yek ji sedemên bingehîn ên hilberînerî û pêşketina wê bû. Cihêbûn û veqetînên ji PKKê nikarîbûn pêşiyê li pêşketina wê bigirin, di vê de jî hêmana herî girîng ew e, xwe ti carî zêde ber bi bayê partiya çepgir a modernîst û şêwazê wê yê jiyanê nexist. Ne bi tenê civak bi rengê PKKê pêk hat, ji ber rastiya civakî ya jê tê û bi hêza di nava wê de azadbûnê dayê, şerekî xurt ê navxweyî jî di nav refên wê de qewimî. PKK'ê herî zêde şerê civakî di nava xwe de meşand. Partiyeke modernîst nikarîbû xwe li şerekî bi vî rengî yê navxweyî ragirtana, lê ji bo pêşketina PKK'ê têkûztir bibe bi tesîr bû.

Kengî PKK'ê dev ji hedefa xwe ya dewletbûnê berda û ket ser rêya siyaseta demokratîk, ev bû veguherîna bingehîn. Ne ku zehmet bû, dev ji avakirina dewleteke netewe ya sosyalîzma pêkhatî dihat berdan. Ji ber ku şêwazekî jiyanê hebû ti cudahiya xwe ji şêwazê jiyana kapîtalîst a li tevahiya cîhanê tinebû. Yan wê li dinyayeke din derfet û îmkanên jiyanê bidîta yan jî wê weke sosyalîzma pêkhatî ya jihevdeketî belav bibûya. Alîkariya herî mezin a pêvajoya Îmraliyê ew bû, li derve ez bi sînor li ser çareseriya demokratîk radiwestiyam. Bi vê pêvajoyê re ev yek hûrûkûr hat meşandin. Axaftin û parêzname vê meşa hûrûkûr bi awayekî balkêş nîşan didin. Dewlet jî PKK jî demeke dirêj li vê rastiyê serwext nebûn; mîna guhertineke taktîkî hesibandin. Hinekan ev bûyera guhertinê bi awayekî mîna destpêka pêvajoya tesfiyeyê fêhm kir. Lê ya rastî, di teoriya siyasetê û agahîgirtina civaknasiyê de em hûrûkûr diçûn. PKK bi veguherîneke berfireh re rûbirû bû. Kesên bêberpirsiyarî ango kesên ji exlaq mehrûm ev kêliya veguherînê ji bo reva xwe kirin bahane û xwe ji vê dûr

nekirin. Li hemberî ciddiyeta veguherînê di revên piştî salên 2000'î de qelsiya exlaqî hêmanekî diyarker e.

Dewlet û derdorên çepgir li bendê bûn ku PKK xwe bi xwe tesfiye bike. Ev helwesteke gelekî şaş û bêberpirsiyarî bû. Eger dewlet bêhtir bi berpirsiyarî rabûya piştî 1999'an veguherînên demokratîk ên dîrokî pêkan bûn. Ji ber ku bi awayekî hêja bersiva hewldanên yekalî nedihat dayîn, bi rastî firsendeke dîrokî badilhewa ji dest diçû. Çepgirî bi ferdperestiya lîberal a pê diherifî ji dewletê zêdetir bêberpirsiyarî tevdigeriya. Ji bo revê ti pîvana exlaqî nedibû ku bihata qebûlkirin. Civak demeke dirêj nayên xapandin û ev yek careke din bi awayekî hêvî nedihat kirin di civaka Kurd de pêk hat. Êş û azarên pêk dihatin bi awayekî dijwar mirov hîn dikirin. Dilsoziyeke ji rêzê têrê dikir ku civak ji bo yekîtî û azadiyê li ser piyan bimînin. Eger PKK bihata tinekirin jî civakeke her kêlî ji bo azadî û anora xwe rabe ser piyan hatibû avakirin, gel û ferdên azad pêk hatibûn.

Weke encam; pirsgirêka Kurd nehatibû çareserkirin, lê derfet û îmkanên çareseriyê têra xwe zêde bûbûn. Gotin di cih de be civak rabûbû ser piyan û li benda çareseriyê bû. Herçiqasî PKK'ê nikarîbû çareseriyên xwe bi awayekî yekalî pêşde bibe jî şensê çareserkirinê bi hêz dewam dikir. Çaresariya dewleta netewe êdî şert nebû, lê li çareseriyên siyasî yên demokratîk ên naveroka wan têrûtijî pêşî hatibû vekirin. Dewletê jî çareseriyên xwe yên yekalî ferz nedikirin. Êdî haya wê ji wê hebû ku wê weke berê hebûna xwe bi hişkînkarê nikaribe dewam bike. Çareseriya eskerî jî bû şêwazekî çareseriyê ku betan ji rûyê xwe buhatir be. Hêza bêsînor dikare li xwediyê xwe jî vegere û pêvede. Jixwe rewş gihiştibû wê astê. Cihêbûn û jihevdeketina di nava PKK'ê de bi heman rengî di nava dewletê de jî pêk dihat. Dewletê yekem car curet dikir ku di bin navê Ergenekonê de xwe dadgeh bike. Komara Tirkiyê di dîroka xwe de cara pêşî diket pêvajoya herî ciddî ya jêpirsînê. Bêhejmar rastiyên dihatin înkarkirin êdî dihatin ziman.

Bêguman di vê pêvajoyê de bûyera herî girîng a qewimî, hevdîtina 27'ê Mijdarê di navbera Serokê DYE û Serokwezîrê Komara Tirkiyê de bû. Bi tevahî naveroka vê hevdîtinê nayê zanîn. Lê derket holê ku di berdêla tesfiyekirina têkoşîna çekdarî ya PKK'ê de gihiştin wê biryarê ku şêwazê rêveberiya berê yê Gladîoyê bi dawî bikin. Dadgehkirina Ergenekonê îfadeya berbiçav a vê yekê

bû. Bi awayekî li salên 1923'an vegeriyan. Diwêrîbûn ji şaşiyên heştê û pênc salan vegerin. Avakerên esasî yên Komarê ji nû ve digihiştin hev. Dîsa di demeke nazik a dîrokê de gav dihatin avêtin. Kurdên hatibûn parçekirin yekîtî û yekparebûn dixwestin; hem jî li ser bingehê Mîsaqeke Mîllî ya nûvekirî. Dibe ku li dîrokê neheqiyên mezin bêne kirin, lê ti carî ji bîr nake. Roj tê, alî ji bo van neheqiyan ji holê rakin ji nû ve civanê didin hev. Bêguman çareserî pêk nehatiye, lê ketine ser rêya wê. Hêviyên li serê rê peyda bûne her roja diçe bi hêztir dibin. Potansiyela Komarê heye ku modela xwe ya demokratîk pêk bîne. Eger xwedî li mîrateya dewlemend a şaristaniyan derkevin, hêjayî ruhê yekîtiya bi biratiya hezar salan û ummetê derketiye holê bibin, wê ev potansiyel bi tenê modela xwe pêşkêş neke, ji bo tevahiya gelên herêmê yên bê şens bibe mînak. Di pirsgirêka Kurd de gera li çareseriyê modeleke demokratîk gengaz û ferz dike.

## C- DI PIRSGIRÊKA KURD DE ÇARESERIYÊN MUHTEMEL

Hegemonya modernîteya kapîtalîst ji serê sedsala 19. ve li Rojhilata Navîn dest bi bicihbûnê kir. Bi vê re pirsgirêkên civakî û îhtîmalên çareseriyê gihiştin qonaxeke nû. Pirsgirêk û rêyên çareseriyê yên xweserî serdema destpêkê û navîn ji nû ve, lê bi awayekî navenda wan guherî, ji aliyê şaristaniya hegemonîk a Rojava ya bi hêmanên nû bi gewde bûye, veguhezîn rojeva dîrokê. Pirsgirêka giştî ya Rojhilata Navîn ku jê re pirsgirêka Şerqê jî tê gotin û bi xwe em dikarin weke pêvajoya parçebûna Împaratoriya Osmanî bidin nasîn, li cem her civak, netewe û gelî tevî xisletên wekhev, bi xisletên cihêreng jî ket rojevê. Di serî de Ereb, Fars, Tirk, Kurd, Ermenî, Rûm, Suryanî û Cihû li ser bingeha milliyetan, di serî de Misilmantî, Xirîstiyantî, Mûsewîtî û laîktî li ser bingeha dîn û mezheban, wekî din li ser bingeha qadên bingehîn ên çînî, civakî, aborî, polîtîk, îdeolojîk û leşkerî her ku çû pirsgirêk bi rengekî berfireh qewimîn. Li pirsgirêkên kevin ên herêmê şêwe û naverokên nû zêde kirin, bi vî awayî herêm bû qadek e ku timî lê şer, pevçûn û krîz hebin an jî kirin ku hebin. Serdestiyeke temam a şaristaniya Rojava mewzûbehs bû. Ev serdestî her ku bi hêz bû, li cem tevahiya welat, netewe û civakan bivênevê pirsgirêk û gera li çareseriyê jî zêde bibûya.

Dîrok her tim bi serê xwe pirsgirêkan pêk nayîne; mekan û demên pirsgirêk têde diqewimin bi xwe re çareseriyên muhtemel jî tînin. Ya girîng ew e, mirov rêyên çareseriyê yên muhtemel û çavkaniyên sereke yên pirsgirêkan û çareseriyên wan bi şert û mercên zeman û mekan ve girêdayî bi awayekî rastî terîf bike û wan ber bi bicihanînê ve bikişîne. Ji bo vê jî bi awayekî têrûtijî guftûgokirin û zelalkirin gelekî girîng e. Di rewşeke berevajî de hewldanên ji bo guftûgo û çareseriyê wê bibe şer û pevçûna koran. Di rewşa berbiçav a Rojhilata Navîn de dused salên dawî yên di bin hegemonya modernîteya kapîtalîst de derbas bûn hinekî jî bi awayekî şerê koran pêk hat, pêk anîn. Bi giştî em ji polîtîkayên parçe bike-bi rê ve bibe heta bi taktîkên rojane yên pêşdebirina hegemonyayê di her qadê de, di encama pêkanîna gelek rêbazên cuda de ferd û beşên civakî yên neketibin şewkê nemaye.

Welatê Kurdistanê û civaka Kurd jî di serê wan civak û welatan de tên ku herî zêde ji hegemonya modernîteya kapîtalîst bi tesîr bûne, parçebûne, bi pirsgirêk, îmha û serhildanan xeniqîne. Kurd û pêşiyên wan di serdemên destpêkê û navîn de weke civak û welat pêvajoyên bi heman rengî dîtin, lê wexta mêtinkarî û zordestiya di dema modernîteya kapîtalîst de jî li vê zêde bû, cara pêşî pêvajoyekê destpê kir ku hebûna wan bi awayekî ciddî û sîstematîk ket tehlûkeyê. Bi ketina vê pêvajoyê re demeke welê bi tehlûke wê destpê bikarana ji aliyê çandî û fizîkî ve qirkirin wê timî biketa dewrê. Di nava vê çarçoveya giştî de paralel bi beridîna pirsgirêka Kurdistan û Kurd re, çareseriyên muhtemel ên bi xwe re hildigirtin jî timî beridîn û veguherîn.

Mirov dikare beridîn û veguherînê di bin sê sernavên sereke de binirxîne.

## Çareseriya Îmhaker a Neteweyî ya Hegemonyadariya Modernîteya Kapîtalîst

Ev şêwazê çareseriyê yê sîstema kapîtalîst e. Li metropol û mêtingehan bi şêwazekî dijwar bi şîddetê pêk tîne. Yekdestdariyên dewleta netewe, kapîtalîzm û îndustriyalîzm ku sê hêmanên bingehîn ên modernîteya kapîtalîst in, bikevin binyeya kîjan civaka neteweyî modela homojenkirina civakê pêk tînin û ji lewra timûtim hewce dibînin serî li polîtîkayên îmha û înkarê bidin. Ev polîtîka yan jî şêwazê rêvebirinê, li gorî berxwedana diyardeya

civakî ya li beramberî xwe dikare bibe xwedî şêweyên cihê. Eger bixwaze hebûna civakî ya li beramberî xwe ji holê rake û di nava hêmanên xwe yên modernîteya kapîtalîst de bihelîne, zêdebûna şîddetê dikare heta bi qirkirinê biçe. Carnan civakan dikin hedef, mişextî cografyayên din ên dor li wan girtî dikin ku bi hêsanî asîmîle bibin. Ji gund, ji deşt û zozanan koçberkirina ber bi bajaran ve şêweyekî din ê şîddetê ye. Kampên komkirinê, zindan û tevkujiyên girseyî şêweyên şîddetê yên hê dijwarkirî ne. Ji bo bi hêsanî rêve bibin welatê dapîr û bavpîran parçe dikin ku ev jî şêweyekî din ê şîddetê ye. Çi bi zorê çi jî bi amadekirina şert û mercan, asîmîlasyona tê kirin dikeve kategoriya şîddetê. Operasyon, bê kar û bê tenduristî hiştin, her cure qedexe, xebitandina bi nanozikê şêweyên şîddetê ne ku timî di dewrê de digirin. Tevî vê, civak an jî koma bûye hedef hê li ser piya mabe, lê tesfiyekirina wê bivê, hingê bi qirkirina fizîkî qirkirina çandî wê bê temamkirin.

Li Rojhilata Navîn, hêmanên cihêreng ên modernîteya kapîtalîst, rêveberiyên wan ên yekdestdar û nexasim şêweyên şîddetê yên hatin diyarkirin ji aliyê dewleta wan a netewe ve di şert û mercên zeman û mekanên cihê de li ser Kurdistan û Kurdan pêk anîn. Eger mirov van kirinan bi tenê bi rêveberiyên despotîk û dewletên netewe yên Tirk, Fars û Ereb ve girê bide, ev ê bibe helwesteke qels û kêm. Hegemonyadariya navendî ya kapîtalîst a sereke li ser kar nebe, ti rêveberiya despotîk an jî dewleta netewe bi tena serê xwe xwedî wê hêzê nîne ku şîddeta îmhaker a neteweyî pêk bîne. Eger sîstem destûrê nede, bixwaze jî nikare vê hêzê nîşan bide, eger nîşan bide jî mayînde nabe. Ji serê sedsala 19. heta bi salên 1945’an Împaratoriya Brîtanyayê di tevahiya seferên îmhaker ên neteweyî, tevkujî û parçekirinên li ser Kurd û Kurdistanê de, di polîtîkayên mêtinkar ên xweserî dewletên netewe yên herêmê (Tirk, Îran, Ereb) de aliyek e. Eger Brîtanya û hêzên din ên hegemonîk nebin, statuya dused salên dawî ya Kurd û Kurdistanê destnîşan nabe û bi cih nayê anîn. Lê ev jî nayê wê maneyê ku bi tevahî berpirsiyarî ya metropolên emperyalîst e; hêmanên modernîteya kapîtalîst ên herêmê yên di çarçoveya sîstematîka wan de hatine avakirin, bêrehmtir û îmhakertir bûne. Yê ew xistine vê rewşa paşverû, şêwazê faşîst ê dewleta kapîtalîzmê, dewleta netewe û îndustriyalîzmê ye. Hêmanên behsa wan tê kirin, ji ber ku modernîteya kapîtalîst dereng nas kirine û

mîrateya çanda wan qels e, bi pirranî neçarî rêbazên înkarker û îmhakeriya neteweyî dibin. Kapîtalîzma tê pêkanîn, ji ber ku bi şêweyê yekdestdariya dewletê diberide, talanker e, desteserker e, û heta karkeriya bi heqdest jî nameşîne yekser dimije û karê esas digire, divê bi vî awayî bi rê ve bibe.

Heman şêwazî li ser sektora taybet a hatiye dewlemendkirin jî ferz dikin. Eşkere ye ku ev şêweyê dewletê û sektora taybet a kapîtalîzmê îmhakarî û asîmîlasyona bi darê zorê di dewrê de negire bi hêsanî nikare xwe pêk bîne. Jixwe dewleta netewe bi xwe di rewşa patronê herî mezin ê kapîtalîst de ye. Ji bo li pêvajoyê serwext bibe, gelekî girîng e ku mirov dewleta netewe weke şêweyê herî rêxistinkirî û bihêzkirî yê kapîtalîzmê nas bike. 'Muhendîstiya Civakê' ya dewleta netewe, li ser navê etnîsîteya neteweya serdest weke çerxeke homojenkirina topyekûn heta tesfiyekirina 'yên din', bêrehm digere. Dewletên netewe yên Ereb, Tirk û Fars ên li ser Kurd û Kurdistanê hatine avakirin bi vê fonksiyonê barkirî ne.

Divê mirov îndustriyalîzmê jî weke pêkanîneke yekdestdar û îmhakeriya neteweyî fêhm bike. Ji ber ku civaka cotkarî û gund xira dike, yek ji pêkanînên sereke yên modernîteyê ye ku bi awayekî berfireh qira civakê tîne. Îndustriyalîzma xwe disipêre enerjiya nukleer, komir û avê balansa avhewayê xira dike, hawîrdorê qirêj dike, bi jehrî û radyasyon dike, dihêle ku bi hezaran cihûwar tevî dewlemendiyên xwe yên çandî bêne valakirin û ev çavkaniya tehlûkeyekê ye ku ji qirkirinê wêdetir e. Talan û xirakirina bermahiyên dîrokî yên li Kurdistanê, bi awayekî azad venegotina Kurdan a çanda xwe, qedexekirina nirxên çandî û tinebûna azadiya perwerdeyê nîşan didin ku bi kêmanî bi qasî qirkirina fizîkî aliyên bi tehlûke yên rêveberiya şîddetê di warê qirkirina çandî de hene.

Ev hovîtiya civakî ya jêre çareseriya bi hêzê û eskerî tê gotin têkiliya xwe bi şêwazê pozitivîst ê Darwînîzmê re heye. Li gorî pozitivîzma Darwînîzmê yê bi hêz mafê xwe yê man û jiyanê heye. Kurd yek ji wan civakan e ku çareseriyên îmhaker û zordest ên rêveberiyên hêzên eskerî yên pişta xwe dane hêmanên modernîteya kapîtalîst heta dawiyê dîtine. Ermenî, Rûm, Suryanî, Bedewî û Tirkmen jî bûne qurbanên çareseriyên bi heman rengî. Fikra afirandina neteweya serdest a homojen bi temamî felaket e.

Maneya her neteweya homojen îmhakirina bi hezaran nirxên çandî ye. Li beramberî modernîteya kapîtalîst, bi taybetî jî li beramberî dewletdariya neteweyî serhildan û berxwedanên bi armanca bergiriya rûmet û parastina hebûnê têne kirin, bi sedema bê tewazuniya hêzan bi giştî bi tevkujiyan bi encam bûne. Her tevkujî gaveke çareseriya eskerî hatiye hesibandin. Piştî ku Kurdistan bi Peymana Qesr-î Şîrîn (1639) du beşî kirin, tevî Mîsaq-î Mîlliyê çarparçebûna wê pêk hat û bi vê felaket mezintir bû û vê jî hişt ku çareseriyên bi hêza eskerî zêdetir pêk bên. Li derdora nod salî her parçeyê Kurdistanê ji bo çareseriyên bi hêza eskerî bû cihê ceribandinê. Îmaja 'Kurdê paşverû û asî' pirr bi zanîn afirandin û ji bo seferên xwe yên pelixandin û îmhayê kirin bahane.

Hêza civakî ya bingehîn a li pişt çareseriya bi hêza eskerî, burokrasî û bûrjûwaziya çîna navîn a bi destê hêmanên modernîteyê hatiye pêkanîn e. Çîna behsa wê tê kirin, di nava înkara Kurdan de çavên xwe vekirine. Ji bo mezinbûna wê jî divê mêtingehkirina Kurdan pêk bê û bi awayekî bê berdêl xwîna Kurdan birije. Kurd û Kurdistan ji bo vê çînê ji çavkaniyên malê xam ê xwezayî têne hesibandin. Ti carî hêjayî kirdarî û sûbjetiyê nayên dîtin, timî di rewşa obje de têne girtin û mehkûmî statuyeke koletiyê ya ji ya jinê kambaxtir kirine. Hêzên hegemon ên Rojava li gorî vê çîna navîn polîtîkayeke sist a mêtingeriyê dimeşînin. Çîna navîn a behsa wê tê kirin, li ber hêzên hegemon ên Rojava radibe, ev ji xwesteka wê ya serxwebûn û azadiyê nayê; ditirse wê hêzên Rojava malê xam ji destê wê derxin û di şertên kêrhatîtir de bi rê ve bibin ango dibizde ku li dijî wê bêne bi karanîn.

Ji salên 1920'an û virve li ser Kurd û Kurdistanê di bin siya hegemonên Rojava de, di berdêla tawîzên didin van hêzan de hevgirtineke çaralî ya zimnî û sergirtî mewzûbehs e. Hegemonên Rojava van çar dewletên netewe yên herêmê ango dewleta Tirk, ya Îran, Sûrî û Iraqê ji bo çawa dixwazin bi rê ve bibin di binî re bi Kurd û Kurdistanê dilîzin û vî finasê xwe jî weke marîfetekê dizanin. Mîna ku destekê didin wan xwe nîşan didin, lê kengî digihîjin armanca xwe jî wan li naverastê dihêlin û vê yekê ji bo berjewendiyên xwe di cih de dibînin. Li dinyayê li ser ti gel û welatî evçend hêza eskerî nehatiye bikaranîn û dekûdolab nehatine gerandin. Ermenî, Rûm û Suryanî jî bûne qurbanê dekûdolabên bi vî rengî yên modernîteyê. Di sala 2003'an de bi hilweşîna dewleta

netewe ya Iraqê re rêveberiyên Sûrî, Îran û Tirkiyê bizdiyan û ketin nava panîkê, lewma bi tevahî pirsgirêk û nakokiyên di navbera xwe de dan aliyekî, biratiya dîn a gelî xwe bi benê wê jî digirtin ji bîr kirin û li dijî Kurdan hevgirtina pîroz nû kirin. Hêzên behsa wan tê kirin, hevgirtina ku li dijî ti dijminî pêk neanîbûn, bi lez li dijî Kurd û Kurdistanê pêk anîbûn û bêperwa xwe ji vê kirinê paşve nedabûn.

Kurd weke gelekî bêparêzer û bêhevgirtî li dijî van hegemonya û hevgirtinên qatbiqatî ji wan zêde serî rakirine, lê mîna hemdemiyên xwe ne karîbûne çareseriyên dewletdariya netewe û ne jî karîbûne çareseriyên neteweya demokratîk pêk bînin. Piştî jihevdeketina dewleta netewe ya Iraqê rê li hin hêzên Kurd vebû ku di çarçoveya çareseriya dewleta netewe de dewleteke federe pêk bînin, lê zêde di rewşeke ewle de nîne. Ev pêkhatin ji bo Kurdan ne rizgarî ye, dixwazin ji bo hêzên mêtinkar û hegemonîk weke destikê kontrolê bi kar bînin. Polîtîka hêzê û çareseriya eskerî li ser her parçeyê Kurdistanê û gelê Kurd ji bo gihiştina armancên xwe ji îdeayên xwe nehatine xwarê, lê di hêza xwe ya berê de jî nînin. Ji ber ku gelekî deşîfre bûye, bingehên wan ên hevkariyê jî hildiweşin. Çareseriya bi hêza eskerî ya dewletdariya netewe herî zêde beşê civakî yê pişta xwe pê girê dide hevkartiya Kurd a ji rêûresmê ye. Lê têkoşîn û berxwedana ji sîh salî dibihure maskeya rûyê vê hevkartiyê gelekî aniye xwarê. Lewma rêûresma hevkartiyê deşîfre û teşhîr bûye. Di bêhêzbûna çareseriya eskerî de roleke mezin a dejenerebûna bingehê civakî yê hevkartiya Kurd heye.

Piştî ku hegemonya DYE'yê li Iraqê bi cih bû, pêkanînên kevneşop ên Gladio'ya NATO li ser Kurd û Kurdistanê zemînê xwe teng bû ango rêbazên kontrgerîlla bi şêweyê berê li ser Kurd û Kurdistanê wê nikarîbûna bimeşînin. Tengezariya di navbera Komara Tirkiyê û DYE'yê de li ser helwesta li beramberî PKK'ê û Dewleta Federe ya Kurd de pêk hat, bi lihevkirina Waşingtonê di sala 2007'an de gihişt qonaxeke nû. Mirov wer fêhm dike ku di berdêla çekberdana PKK'ê de, di çarçoveya dewleta netewe de li ser çareseriyeke çandî, siyasî, civakî û ekonomîk a têde çareseriya eskerî bi rola sereke nîne, li hev hatiye kirin. Dadgehkirina Ergenekonê bi vê lihevkirinê re têkildar e. Divê mirov di gavavêtina têkiliyên asayî yên bi Dewleta Federe ya Kurd re para

vê lihevhatinê bibîne. Bi vî awayî pêkanînên rêveberiya dewletdariya netewe ya Tirk li ser Kurd û Kurdistanê neçar man veguherin. Du lingên din ên moderníteyê, rêjeyên karê yên sermayeyê yên tengavbûyî û berjewendiyên wê yên îndustriyel ên li ser ekonomiya Iraqê jî di vê de gelekî bi tesîr bûn. Polîtîkaya nû ya Komara Tirkiyê der barê Kurd û Kurdistanê de giraniya xwe ya bi rêya eskerî kêm kir û giraniya xwe da ser polîtîkayên qadên ekonomîk, civakî, siyasî û çandî yên deriyên wan lihevkirinê vekirî. Bêguman ev bûyer û pêşketineke girîng e; ev bûyer û pêşketineke welê ye, li ser tevahiya Kurd û Kurdistsanê ango li Rojhilata Navîn encamên wê yên girîng dikarin çêbibin.

**Çareseriya Dewletdariya Netewe ya Federalîst a Kurd**

Ev çareseriya xwe disipêre Başûrê Kurdistanê û Kurdên wir, şêwazê çareseriyê yê hêzên hegemonîk ên Rojava nîşan dide. Ji ber ku ev hêz bawer nakin wê çareseriyên dewletdariya netewe ya faşîst a xwecihî demeke dirêj serketî bin û ji ber ku ev şêwazê çareseriyê ji bo bicihbûna wan a herêmê li cih nîne, çareseriya dewletdariya netewe ya federalîst xwe ferz dike. Bi vî awayî, hem bicihbûna wan a li welatê pêwendîdar hem jî dewletdarên netewe yên xwecihî û hêmanên din ên moderníteyê bi xwe ve girê didin û ji bo pêşdebirina vê, ev çareseriya xwe disipêre Kurdên Başûr bi rola qeraseyekî ewle radibe. Di vê çarçoveyê de dewleta netewe ya Kurd a bi temamî serbixwe di cih de nîne û ji ber ku wê bi heman rola qerase ranebe nayê tercîhkirin. Hêmanên moderníteya kapîtalîst a Kurd, ji ber ku polîtîkayên hevkartiyê yên kevneşop têra xwe teşhîr bûne û ji ber ku bersiva berjewendiyên wan nade, ber bi çareseriya federalîst ve gav diavêjin. Divê mirov Dewleta Federe ya Kurd a li Bakurê Iraqê (Başûrê Kurdistanê) bi tenê weke veguherîna bûrjûwaya li herêmê nebîne, di heman demê de divê mirov wê weke veguherîna tevahiya çîna bûrjûwa ya hevkar a li Kurdistanê bibîne. Bingehê wê kevin e. Di tevahiya serhildan û rêxistinên mîlliyetgir de çareseriyên bi vî rengî timî weke hedef hatine diyarkirin. Tevî rewşa wan a belawela û di nava xwe de parçebûyî, mirov dikare rewşa nû ya van hêzan weke moderníteya kapîtalîst a Kurd binirxîne.

Bi taybetî berxwedana sîh salên dawî ya PKK'ê ew jî neçar kirine ku piştgiriya hev bikin û li çareseriyeke federalîst bigerin.

Herçiqasî belawela û pirrserî bin, û dîsa di asta îdeolojîk-polîtîk de qelsiyên wan hebin jî li dora Dewletdariya Netewe ya Kurd a Federe wê di şêwazê xwe yê çareseriyê de israr bikin. Dewletên netewe yên cîran ên xwecihî ango Tirkiyê, Îran, Sûrî û heta dewleta netewe ya navendî ya Iraqê, çiqasî li ber rabin û qebûl nekin jî îhtîmaleke zêde ye ku bi desteka hegemonya kapîtalîst a global hebûna xwe mayînde bikin. Hegemonya global vê modela çareseriyê ji bo berjewendiyên xwe li cih dibîne ku li tevahiya Rojhilata Navîn pêk bîne. Çarenûsa şêwazê çareseriya federalîst girêdayî bûrjûwa dewleta netewe ya serdest û burokrasiya wê ye ku rast li nasnameya Kurd serwext bibin û jêre rêz bigirin. Ezmûna li Iraqê nîşan dide ku hê negihiştiye asta em behsa wê dikin. Helwesta dewleta netewe ya Ereb a Sûrî ew e, Kurdan li derveyî civaka dewletê dihesibîne. Xwe nade ber ku Kurdan weke welatî jî qebûl bike. Mîlliyetgiriya Şîa ya hişk a Îranê ji diyardeya Kurd re xerîb e, û di asîmîlekirina Kurdan de bêkêr e. Ji bo rêveberiya eyaletan a ji rêûresmê li gorî hêmanên modelan veguhere jêre hinekî dem divê. Rêveberiya heyî ji federalîzmê dûr e. Dibe ku bûrjûwaziya çîna navîn a Tirk û burokrasiya wê zûtir ji zêhniyeta înkarker û asîmîlasyonîst rizgar bibe. Ji ber ku giraniya girseya Kurd bi Komarê re û di pêkhatinên berê yên dewletê de bi tebeqeya jor a Tirk re gelekî hevkarî kirine, ev dikare rê li ber şoreşa zêhniyetê veke.

Jixwe zehmet nîne ku şirîkatiya wan a stratejîk di pêvajoya rizgariya Komarê de bi bîr were anîn. Eger li dîroka hevpar serwextiyeke rast bibe, di nava avahiya dewletê de bivênevê di warê qebûlkirina Kurdan de pêşketin ê bibin. Tirk weke millet têra xwe xwedî ezmûn in, pê dizanin di demên krîtîk de bêyî Kurdan mayîn felaketeke stratejîk e. Di demên asayî de federalîst nebe jî bi vê rewşa qebûlê ceribandinên ji bo jiyana hevpar zehmet nebin. Weke civak ketina zikhev bi pêş ketiye û ev dikare ji bo îradeya jiyana hevpar were bikaranîn. Ji ber ku îdeolojiya neteweperest û mîlliyetgir teşhîr bûye û kokên dîrokî yên têgihiştina ummet-millet kûr diçin, pêkan e ku ev ji bo demokrasiya muhafezekar were bikaranîn û di rewşeke welê de hevkartiya Kurd a ji rêûresmê jî wê van refan tercîh bike. Rastiya berbiçav a diqewime jî ber bi vî aliyê me diyarkirî diberide. Herçiqasî çareseriya bi şêwazê eskerî li ber

derî were sekinandin jî bi kêmanî di çarçoveya azadiya fikrê de guftûgokirina federalîzmê mumkîn e.

Hem çareseriya bi hêza eskerî hem jî çarseriya federalîst a bi hevkaran, kapasîteyên herduyan yên civakî teng in. Çareseriyeke li gorî berjewendiyên tevahiya Kurdan û civakên cîran nîne. Ev modelên çareseriyê di navbera tebeqeya jor û modernîteya kapîtalîst de modelên çareseriyê yên li ser li hev kirine, nîşan didin. Çiqasî ji beşê jêr ê civakê bitirsin, ewqasî xwe nêzî pêdiviya bi çareseriyê dikin. Çareseriya li cem tevahiya tevgerên rizgariya neteweyî û sendîkavaniya çîna navîn, çareseriyeke çîna navîn e. Çaresernebûna pirsgirêkên heyî bi vê çîna navîn re têkildar in. Her çînek kapasîteyeke xwe ya çareseriyê heye. Ji bo ku pirsgirêkên civakî ji binî ve û bi kok bêne çareserkirin, divê hêmanên civakî yên demokratîk ên li derveyî hêmanên modernîteya kapîtalîst bikevin dewrê û bi rola xwe ya dîrokî rabin. Ji bo modernîteya kapîtalîst a Kurd pêk bê dîrok derfet û îmkanên pêdivî bi wan hene nadiyê. Lêgerînên çareseriyê yên ber bi dewleta netewe ve di wê hêzê de nînin ku ji federalîzmê bibihurin. Federalîzm bi serê xwe nikare di çareserkirina pirsgirêkên civakî yên Kurd de ku ketine qonaxa krîza akût, têrê bike; bi tenê dikare di çareseriya neteweya demokratîk de bi rola xwe rabe û bi vî awayî dikare fikarên ji kêmmayîna wê çêbûne ji holê rake.

## Çareseriya Neteweya Demokratîk

Xisleta diyarker a çareseriya neteweya demokratîk ew e, li derveyî dewletê li çareseriyê digere. Li derveyî dewletê gera li çareseriyê tê wê maneyê; ne hewl dide dewletê xira bike û li şûna wê yeke din ava bike, ne jî bi ser dewleta heyî ve dibe û di nava wê de dihele. Civak di nava xwe de û di îradeya xwe ya demokratîk de li çareseriyê digere. Dewletê pozitîf an jî negatîf nake hedef. Jixwe çi di tevahiya dîroka şaristaniyan de, çi jî di dema modernîteya kapîtalîst de ji bo tebeqeyên jor çareseriya pirsgirêkên civakî û berjewendiyên çînî bi dewletbûnê ve girêdayî bûn. Derfet û îmkaneke bi vî rengî ya ‘demos’ê çênabe. Li ser navê gelan û kedkaran çareseriya proleter an jî dewleta gel a ku sosyalîzma pêkhatî pêşniyar kir, xapandin û pêxapînek bû. Rastiya jiyanê ev piştrast kir. Şerên ji bo desthilatdarî û dewletê hatin meşandin timî li gorî berjewendiyên elîtan û sermayedaran bûn. Tevahiya dîrokê

çareseriyên neteweyî demokratîk zêde pêş neketin, ev li gorî berjewendiyên yekdestdariyên sermaye û elîtên desthilatdariyê wisa ye. Di çareserkirina pirsgirêkên îro de jî heman rastî mewzûbehs in.

PKK di bin bandora sosyalîzma pêkhatî de mezin bû. Lewma demeke dirêj nikarîbû ji paradîgma dewletdariya netewe bibihure û ev sedema bingehîn a xetimîna wê ye. Komara Tirkiyê jî ji aliyê hêmanên moderniteya kapîtalîst ve hat tengavkirin û ev rewşa PKK'ê jî dişibe ya wê. Armanc veguherandina Komara Tirkiyê bû, wê bibûya komareke sosyalîst. Li Kurdistanê jî wê komareke sosyalîst bihata avakirin, paşê jî di navbera herduyan de wê yekîtiyeke enternasyonalîst bihata çêkirin. Di vê paradîgmayê de ji demokrasiyê û civaka demokratîk re zêde cih tinebû. Nakokiya çînî ya di xwezaya desthilatdarî û dewletê de nedihat dîtin. Çawa ku K. Marks bawer dikir ku civaka safî kapîtalîst dikare were avakirin, herweha bawer dikir ku çîna safî ya dewletê jî dikare bê damezrandin. Lê ya rastî, weke diyarde, ne dewleta çînî ya safî û ne jî civaka safî kapîtalîst pêkan e. Herçiqasî anarşîstan di vê çarçoveyê de rexneyên rast û mafdar kiribin jî nikarîbûn heman rastiyan der barê hedefa civaka demokratîk neteweyî de bi aniya ziman.

Pêvajoya ku PKK'ê di civaka neteweyî demokratîk de gihişt, pêvajoyeke bi êş e. Lê di heman demê de ji nû ve hilatina wê ye. Partîbûna sosyalîzma reel a klasîk red dike. Ji hedefa dewletbûnê vedigere. Di nava partiyên bi heman rengî de ku di vî warî de xwe veguherandin, PKK li rêzên pêş cih digire.

Çareseriya neteweyî demokratîk bi tenê weke çareseriyeke pêkan xweserî gelê Kurd û Kurdistanê nayê pêşniyarkirin. Di serî de civakên Rojhilata Navîn ji bo tevahiya civakan weke çareseriyeke gerdûnî tê pêşkêşkirin. Banê siyasî yê çareseriya neteweyî demokratîk konfederalîzma demokratîk a civaka sivîl e. Ev şêwazê çareseriyê dewlet nîne. Konfederalîzma demokratîk wekheviya xwe bi dewleta federalîzmê yan konfederalîzmê re nîne. Ev diyardeyên cuda ne.

Modela ekonomîk-civakî ya çareseriya neteweyî demokratîk yekeyên kominal in. Yekeyên civakê yên ekolojî, civakî û ekonomîk yên ku ne xwediyê armancên karê ne. Rêzkirina ji pêdiviyên bingehîn re esas e. Herçiqasî bazar hebe jî yekdestdariya li ser wê

hatiye bisînorkirin û di kontrola etîk a civakê de ye. Nirxên etîk û polîtîk ên di civakê de beriya huqûqê tên. Ji civaka huqûqê zêdetir esasên civaka polîtîk û etîk li pêş in. Di meşandina karûbarên civakî û çareserkirina pirsgirêkan de pîvanên demokrasiya rasterast têne pêkanîn. Demokrasiya rasterast bi têgihiştina zanistî ya serdemê re di weznekê de ye, li hev dike. Azadiya ferd û civakê bi têgihiştina zanistî, hunerî, etîkî û hunerê polîtîk di zikhev de pêk bên, çêdibe. Pîvana ferdê azad bi asta azadiya yekeyên kominal ên di nava wan de cih digire diyar dibe. Qutbûna ji civakê nayê maneya azadiyê.

Li cem van xisletên giştî yên çareseriya neteweya demokratîk em dikarin hin prensîbên wê yên bingehîn ji nû ve rêz bikin.

**Neteweya Demokratîk:** Xwe nasipêre etnîsîte, ziman, çîn û dewletê. Pirrzimanî û pirretnîsîteyî ye. Çînan ji hev cihê nake û îmtiyazê nade dewletê. Civaka demokratîk xwe disipêre ferdên wekhev û azad. Neteweya demokratîk ji kom û welatiyên demokratîk pêk tê. Paradîgmaya nerm a neteweyê, ji nasnameyên çandî yên hişk diyarnekirî esas digire.

**Welatê Hevpar (Welatê Demokratîk):** Tevahiya welatên dapîr û bavpîran (welatên bingehîn) ên bi awayekî wekhev û azad têne parvekirin îfade dike ku ti kes kesê din, ti civak cikava din lê nake 'yê din'.

**Komara Demokratîk:** Dewlet li ferd û civaka demokratîk vekiriye. Rêxistiniya dewletê û rêxistiniya demokratîk a ferd du diyardeyên cuda ne, û ji rewabûna hev re rêzê digirin.

**Destûra Bingehîn a Demokratîk:** Li hemberî dewleta netewe bergiriya koman û welatiyê demokratîk dike, bi konsensusa civakî pêk tê.

**Jihevnebûna Mafên Kolektîf û Ferdî:** Çawa ku civaka ji ferdan pêkhatî ji pêkhatina tevahiya ferdan tiştekî cihê be, herçiqasî di navbera wan de cudatî hebe jî mafên kolektîf û ferdî jî du rûyên cuda yên heman civakê îfade dikin. Çawa ku rûyekî bi tenê yê

madalyonê nabe, ferd an jî civak jî nabin ku bi tenê xwedî mafên kolektîf an jî ferdî bin.

**Azadî û Serxwebûna Îdeolojîk:** Heta mirov ji hegemonya îdeolojîk pozitivîst a modernîteya kapîtalîst û koletiya wê ya lîberalîst a weke ferdperestiyê ji nû ve hatiye avakirin nebihure, çareseriya neteweya demokratîk pêk nayê. Serwextbûna li xwezaya xwe ya civakî, şertê serwextbûnê yê çareseriya neteweya demokratîk e.

**Nihatî û Dîrokîtî:** Rastiyên civakî rastiyên dîrokî ne. Rastiyên di dîrokê de qewimîne bi kêm cudahiyan niha jî di rojaneyê de pêk tên. Têkiliya di navbera dîrok û niha de rast neyê danîn, mirov nikare ji zêhniyeta modernîteya kapîtalîst a ferdperestiya bê dîrok û homojenkirî, ya bi kêliyê radibe û rojane dimeşe, bibihure. Serwextbûna rast a li dîrok û nihayê, ji bo çareseriya neteweya demokratîk, yek ji şertên pêş ên hewce ye.

**Exlaq û Wijdan:** Serî li wijdan û exlaq neyê dayîn ti pirsgirêka civakî bi awayekî têkûz çareser nabe. Çareseriyên modernîteyê bi tena serê xwe bi rêya huqûq û hêzê, ji tepisandin û berevajîkirina pirsgirêkan wêdetir ti encamê nadin. Di çareseriya neteweya demokratîk de empatiya çavkaniya xwe exlaq û wijdan şert e.

**Xweparastina Demokrasiyan:** Çawa ku ti hebûn bêxweparastin nîne, hebûna herî pêşketî ya xwezayê civakên demokratîk jî bêxweparastin pêk nayên û nikarin hebûna xwe dewam bikin. Di çareseriyên neteweya demokratîk de divê bersiva pêdiviyên xweparastinê bê dayîn û bê dabînkirin.

Ev nêzîkatiyên prensîbî divê mirov wan zêdetir berfireh bike. Ji ber ku ev nêzîkatî dihêlin ku em çareseriya neteweya demokratîk ji nêz ve nas bikin. Ev prensîbên ku Yekîtiya Ewrûpayê ew hertim qonax bi qonax xistine rojeva xwe, bi giştî ji bo pirsgirêkên civakî yên Rojhilata Navîn û zêdetir jî ji bo pirsgirêkên civakî yên Kurd mîna derman in. Çareseriya demokratîk a li ser vî bingehî û li ser xeta jiyana neteweyî demokratîk li Kurdistanê bê pêkanîn di asta dîrokî de girîng e.

Gavavêtina Tirkiyê ya pêvajoya demokratîkbûnê û di warê çareserkirina demokratîk a pirsgirêka Kurd de gavavêtin mîna du rûyên madalyonekê ne. Rûyek bê rûyê din nabe. Eger em hewl bidin xusûsên der barê çareseriya li Tirkiyê de berbiçav bikin rewş wê zelaltir bibe. Beriya her tiştî prensîbên li jor bi kurtî hatine ziman û dubarekirin nabe ku bêne paşguhkirin. Çareseriyên prensîb û sîstemên wan nediyar hem nayên fêhmkirin hem jî ji dermankirineke birînpêçana rojane wêdetir, nabin tiştekî din. Sîstema hegemonîk kapîtalîst a Rojava hez dike bila dewam bike, hez dike bila belawela bibe, çareseriya em difikirin çareseriyeke pêkan e ku divê di tevahiya vê pêvajoya avakirinê de bi cih were anîn û domdariya wê were parastin. Di vê çarçoveyê de:

**Xusûsa yekemîn ew e,** çareseriyeke welê tê pêşniyarkirin ku ji bo pêvajoya şaristaniya Rojava ye, û heta rê li ber vekiriye ji wê jî bibihure.

**Xusûsa duyemîn ew e,** li Komara Tirkiyê avahî, sazî û yekdestdariya îdeolojîk a li pişt hêmanên modernîteya kapîtalîst çi dibin bila bibin, hebûna civaka neteweyî demokratîk ango hebûna şensê çareseriyê û rewatiya wê qebûl dike. Li vir ji bo hêmanên çareseriya demokratîk ên behsa wan tê kirin, pêşniyar nayê kirin ku bi şoreşê hêmanên modernîteya kapîtalîst (dewletdariya netewe, kapîtalîzm û îndustriyalîzm) tesfiye bikin, her weha jî qebûl nake ku ev hêman ji aliyê polîtîkayên eskerî ve bêne îmhakirin û asîmîlekirin. Li gorî vî şêwazê çareseriyê, du hebûnên sereke hevdu rewa dibînin ango pêşniyar dike ku du entîteyên sereke di nava aştiyê û pêşbaziyeke bêşer de bi hev re bin.

**Xusûsa sêyemîn ew e,** bi herdu xusûsên pêşî ve girêdayî, bivênevê hebûna saziya siyasetê ya demokratîk tê pêşniyarkirin. Civata çareseriyê ya pirsgirêkên derkevin holê û pirsgirêkên heyî siyaseta demokratîk e. Muzakereyên demokratîk û dîplomasî jî di nava siyaseta demokratîk de ne. Bi meşandina siyaseta demokratîk re divê bi tevahî astengiyên heyî jî ji holê bêne rakirin. Ji bo bi awayekî berfireh azadiya fikrê pêk bê, partiyên li ser bingehê demokratîk çêbibin, sendîka, kooperatîf û her cure civakên sivîl ava bibin divê astengiyên heyî ji holê bêne rakirin. Yek ji pêdiviya siyaseta demokratîk ew e, di hilbijartinan de sîstema bendê yan divê gelekî were daxistin an jî bi temamî were rakirin.

**Xusûsa çaremîn ew e,** divê sîstemên bersivê bidin mafê xweparastina herdu entîte û hebûnên sereke bêne pêkanîn. Ya rastî, me hewl dabû van xusûsan hemûyan bi awayekî berfireh di beşa 'Hin Têgîn, Teorî û Prensîban' a Nexşeya Rê-Raporê de bînin ziman. Li vir, bi tenê em hewl didin nîşan bidin ka wê çawa weke modelekê bi cih were anîn.

## Di Asta Nav De Berbiçavkirina Çareseriya Demokratîk: KCK

Mirov dikare di asta nav de jî çareseriya demokratîk berbiçav bike. Li gorî vê çareseriyê sazî û sînorên heyî yên Komara Tirkiyê rewa têne qebûlkirin. Şêweyên wê yên mîna unîterî, federalî û konfederalî nayên guftûgokirin û heta anîna wan a rojevê jî nayê pêşniyarkirin. Di çarçoveya vê çareseriyê de pêşniyar tê kirin ku wesfên welatîbûna Komara Tirkiyê wekhevî, demokratîk û azadî divê ne bi tenê bi qanûnan û destûra bingehîn, bi saziyan jî were bicihanîn û misogerkirin. Ji bo vê jî jihevnebûna maf û azadiyên ferdî ji maf û azadiyên kolektîf ên nasnameyên çandî yên serê wan vekirî tê destnîşankirin û pêşniyarkirin. Di vê çareseriyê de dewlet navend nîne, sîstema demokratîk ji tevahiya civakê re bingeh e. Divê mirov ji sîstema demokratîk çi fêhm bike. Ji bo fêhmkirinê me xusûsên bingehîn di beşa 'Têgîn, Teorî û Prensîban' de û di beşên piştî wê de bi awayekî berfireh analîz kiribûn, lewma hewcedarî bi dubarekirinê tineye. Lê ya mirov li vê zêde bike ew e, mirov dikare di asta nav de vê çareseriyê weke Koma Civakên Kurdistanê KCK'ê diyar bike. Em timûtim tînin ziman ku divê KCK weke KT'yê (Komara Tirkiyê) yan jî alternatîfa wê neyê fêhmkirin. Hem ji aliyê şêweyê hem jî ji aliyê naverokê ve herdu jî pêkhatinên cuda ne. Me hewl da em Komara Tirkiyê ji aliyê prensîb û saziyan, dîrok û rojanetiyê ve analîz bikin. Lewma hewcedarî hîç bi dubarekirinê nîne. Lê hewce dike ku em hem ji aliyê danasînê ve û hem jî ji aliyê asta beridînê ve li ser KCK'ê rawestin. Mirov dikare KCK'ê weke rêxistiniyeke ban a hêmanên modernîteya demokratîk bide naskirin. Ango mirov dikare weke neteweya demokratîk a ji komên ekonomîk-ekolojîk, welatiyên demokratîk û nasnemeyên çandî yên serê wan vekirî jî terîf bike.

Li vir têgînên krîtîk 'welatiyê demokratîk' û 'neteweya demokratîk' in. Ez yeqîn dikim ku zêde hewce bi guftûgokirina welatiyê demokratîk nîne. Eger mirov weke kesê xwediyê maf û

azadiyên ferdî bide nasîn, bawer dikim ku kes zêde wê li ber vê danasînê ranebe. Dibe ku neteweyê demokratîk tevlîhevtir xuya bike. Lê divê neyê jibîrkirin ku terîfa netewe ya Yekîtiya Ewrûpayê di şerên pêncsed salên dawî yên xwînrij ên netewe yên modernîteyê de derxistî nêzî vê terîfê ye. Neteweperestiya dewletê di roja me ya îro de bi sedema ku rê li ber pirsgirêkan û xetimînê vedike bi lez nerm dibe û li dawiyê dimîne. Di têgînên nû yê netewe de timî karektera demokratîk tê destnîşankirin. Di Komara Tirkiyê de eger mirov terîfa Mistefa Kemal a weke "Ji Xelkê Tirkiyê re Milletê Tirk tê gotin" ne yekalî, ji dualiyan ve binirxîne, hingê nêzîkatiyeke bi vî rengî wê çareserker be. Nexasim hukmên desthilatdariyê yên şoven û mêrê serwer ên zêde li têgîna neteweya tirk hatine barkirin, bikaranîna vê têgînê zehmet dikin. Her diçe vediguhere têgîneke welê ku tevlîbûna nasnameyên din zehmet dike. Ango "Xelkê Tirkiyê" nêzî terîfa min a netewe ye ku ez pêşniyar dikim. Terîfa min a netewe ji nasnameyên serê wan vekirî, welatiyên wekhev, azad û demokratîk pêk tê. Lewma mirov dikare bibêje ev terîf bi xwe "Xelkê Tirkiyê" îfade dike. Ji ber ku di wê demê de jî vê têgînê pirr etnîsîte îfade dikirin. Mirov bi muhafezekarî û çavkorî li têgîneke bûye astengî xwedî derkeve bi kêra çareseriyê nayê.

Jixwe mirov dikare KCK'ê ji bo Kurdan weke demokratîzekirina civaka sivîl bide naskirin. Weke rêxistina ban û sîwanê ya civaka sivîl, mirov dikare KCK bi rastî û bi awayekî li gorî naveroka wê di nava yekparebûna 'Xelkê Tirkiyê' yan 'Neteweya Tirkiyê' de bi cih bike. Ya rastî divê em bibêjin eger ji can û dil tê bawerkirin û tê qebûlkirin ku divê Kurd di nava Xelkê Tirkiyê yan jî Neteweya Tirkiyê de bin, pirr eşkere ye ku terîf û danasîna herî nerm û di cih de divê bi vî awayî be. Bi tenê ev danasîn û terîfa nerm dikare pêşî li kapasîteya federalîst a pirsgirêkan diafirîne û nêzîkatiyên îmhaker û înkarker bigire. Dîsa wê ev rêxistina ban û neteweya nerm karibin ji bo demeke dirêj deriyên cihêkarî û şîddetê bigirin. Çareseriyên federalîst û çareseriyên bi hêza eskerî, kapasîteyên wan ên çareseriyê jixwe nînin, berevajî bi serê xwe timî rê li ber rewşa şer û cihêkariyê vedikin, em vê yekê hem ji dîrokê û hem jî ji jiyana rojane baş dizanin. Kurdan bi rewşa xwe ya heyî, jixwe kolektîvîteyên xwe pêşde birine û weke ferd jî asteke pêşketî ya azadbûnê bi dest

xistine. Mirov li bendê be ku ji vê paşdetir qebûl bikin an jî li ser wan bê ferzkirin, wê ev yek zêdetir rê li ber şîddet û cihêkariyê veke. Ya rastî zehmet nîne ku mirov pêşbîniya rewşê bike û bibêje, di vê rêya vekirî de wê zêdetir û bi leztir bibezin. Rêveberiya Federe ya Kurdistanê ya li Bakurê Iraqê hinekî jî vê rastiyê îfade dike. Encamên polîtîkayên îmha û înkarê yên di dîroka Komarê de jî li pêş çavan in. Eger qonaxa zanista civakî gihiştiyê li ber çav were girtin û li ser çareseriya KCK'ê were rawestîn wê baş were fêhmkirin ku ev ji bo rastiya Tirkiya Demokratîk, Komara Demokratîk û Neteweya Demokratîk, hem çareseriya herî ci dih de ye, hem jî îhtîmala pêkhatina wê ya herî bi hêz e.

Kengî çareseriya bi navê KCK'ê hate bicihanîn wê gelek bûyer biqewimin. Mirov pêşbîniya van bûyerên muhtemel e biqewimin bike, mirov wê jê gelekî hîn bibe. Di rewşeke bi vî rengî de saziyên Komarê wê hebûna xwe biparêzin û dewam bikin. Lê rewşeke êdî cuda derketiye holê. Bi sazîbûna KCK'ê jî bi pêş dikeve. Dewlet xwe weke yekeyên îdarî pêk tîne, lê KCK xwe bi saziyên demokratîk dimeşîne. Mijar û statuyên wan dikarin wekhev û ji hev cuda bin. Wexta ku cudahiyên wan pêk bên wê zêdetir hevdu temam bikin. Lê wexta ku bûn wekhev wê di navbera wan de pêşbaziyeke erênî destpê bike. Kîjan ji wan bersivên baş bide pirsgirêkên civakî ew ê pêşî destekê bibîne.

Di vê modela çareseriyê de xusûsa herî girîng ew e, hevdu red nakin an jî yek li ya din weke 'ya din' nanêre. Bi tevahî çareseriyên ji rêûresmê, yên dewletdar an jî yên bi mafên ferdî radibûn, timî red dikirin an jî li yên hember weke 'yên din' dinêrîn. Heta yek hilneweşiya yan jî nebûya 'yê din' û li şûnê 'yê din' bi cih nebûya, yê ji 'yê din' çêtir dihat hesibandin nedihat pêkanîn.

Di vê de para dogmatîzma dînî û pozitivîst diyarker e. Çi di dîrokê de, çi jî di roja me ya îro de bi tenê civak kiriye gulokeke pirsgirêkan û ji vê wêdetir jî ti encam nedaye. Daneyên nû yên zanista civakî, nermbûna xwezaya civakî û asta bilind a zêhniyeta wê destnîşan dikin. Berfireh û belav hebûna têkiliya sîmbîotîk (beramber ji hev sûd wergirtin) diyar dike. Derdixe holê ku nakokiya antagonîst (bi şer) mecbûrî nîne. Lewma ya rast ew e ku em bibêjin, saziyên siyaseta demokratîk (divê KCK weke rêxistiniya ban a van saziyan were fêhmkirin) têkiliyên bi dewletê re xira nakin, ji vê wêdetir dewletê ber bi rewşên hewce û bi

xêrûbêr ve dahf didin. Herçiqasî pêvajoyên tengezar pêk bên jî diyaloga zêde wê karibe rê li ber çareseriyên demokratîk veke. Mirov dikare bibêje, bi demê re şêweyên saziyan ên li ser piyan bimînin, yên hewce dikin û bi kêr tên divê bêne parastin û pêşdebirin, û divê mirov ji yên hewce neyên dîtin û bi kêr neyên bibihure. Jixwe ya ku mirov ji mekanîzmayên demokratîk bipê jî ev encam e.

## Di Çareseriya Bi Navê KCK'ê De Şaxên Wê Yên Muhtemel Bêne Pêkanîn

Em kengî şaxên çareseriya KCK'ê yên pêkanîna wan muhtemel deynin naverastê, dabaş wê bêhtir zelal bibe.

**Şaxê Aborî:** KCK wê li ser qada ekonomiyê zêde bixebite. Li dijî bandora hêmanên modernîteya kapîtalîst ên hawîrdorê xira dikin û zêde karperest in, wê hawîrdorê û civakê biparêzin. Vê yekê jî wê di serî de bi kominên ekolojîk û ekonomîk, wê yekeyên karê nakin armanc, lê pêdiviyên bingehîn ên civakê û bergeriya hawîrdorê dikin hedef, bimeşînin. Bi vî awayî wê pêşî li şêlandina yekdestdaran a li bazarê bigirin. Hêmanên kapîtalîst wê neyên tinekirin, lê wê gelekî bêne bisînorkirin. Xebat wê ne karekî nanozikê û suxrê be, wê di jiyanê de bibe mîna îbadetekê. Dîwarên xerîbkirinê yên di navbera jiyan û xebatê de hatine lêkirin, wê bêne xirakirin. Li şûna sîstema her tiştê civakê dike meta û civakê di nava metayê de dixeniqîne, sîstema ekonomîk a xwe disipêre nirxên pevguhertin û bikaranînê wê li pêş were girtin. Zemînê civakî û ekolojîk ê KCK xwe disipêriyê ji bo vê sîstemê peyda nabe. Bi qasî ku mirov bêkartiya gelekî heye ji holê rake, divê mirov têgihiştineke exlaqî ya xebatê weke azadiyê dibîne bi cih bike û ev têgihiştin wê karibe bi tevahî pêdivî û hesretên bingehîn ên civak hewcedarê wan e, tedarik bike.

**Şaxê Civakî:** Sîstema KCK'ê şêwazekî hilberînê yê kêrhatî ye, di qadên weke perwerde, tenduristî, spor, huner û huqûqê de bersivê dide pêdiviyên civakê. Di van qadên civakî de bi dewletê re pêşbazî û têkiliyeke sîmbîotîk wê hebe, lê eger mirov rewşa kêrnehatî ya heta niha ya saziyên Komarê li ber çavan bigire, mirov ê rewşa kêrhatî ya KCK'ê baştir fêhm bike. Çawa ku tê yeqînkirin,

di van qadan de ziman û etnîsîte zêde pirsgirêk nînin. Divê perwerde bi pirrzimanî be, ev weke hewcedariyeke civakî divê were teşwîqkirin. Bi qasî Tirkî divê Kurdî yan jî zimanên din bêne pêşdebirin û di perwerdeyê de bêne bikaranîn, ev yek wê manedanê dewlemend û xurt bike. Di van qadan de ji xweferzkirin û şovenînzmê re cih nîne û hewce jî nake. Kurd ê di çarçoveya neteweya demokratîk de saziyên xwe yên perwerde, tenduristî, spor û çandê pêşde bibin û ev yek wê bi xwe yekparebûna neteweyî pêk bîne û dewlemend bike. Mirov heman xusûsan dikare ji bo çandên din jî diyar bike. Eger mirov Xelkê Tirkiyê û Neteweya Tirkiyê weke yekparebûna dewlemendiyên çandî şîrove bike, mirov ê bibîne ku gelek xusûsên weke 'xetên sor' bi fikar têne destnîşankirin, ji pêşhukmên dogmatîk, muhafezekar û ji pêşketinê re xizmetê nakin, pêve tiştekî din nînin. Bi qasî yekparebûna neteweyî ya bi dilxwazî, mirov nikare li helwesteke din a serî li hêzê bide bifikire.

**Şaxê Ewlekariyê:** Şaxê herî zêde li serê wê guftûgo bêne kirin, pêdiviya wê bi biryar û qanûn hebe, qada ewlekariyê ye. Tevî ku Kurd ji azadiyê mehrûm in, lê bi sedema ku timî li kevî û nava tehlûkeyan bûn, bêguman wê garantiyên têkûz bixwazin û wê di çareseriya bi sazî de israr bikin. Mirov dikare artêşa Komarê ji bo tehlûkeyên ji derve bên qebûl bike, lê divê di mijara azadî û hebûna Kurdan de bi awayekî radîkal veguhere. Ji bo saziyên din ên ewlekariyê jî heman xusûs di cih de ne. Di van waran de heta Komar xwe veguherîne, divê KCK hêzên xwe yên bergiriyê biparêze. Nexasim heta cerdevaniya gundan, bi rewşa heyî JÎTEM û komên din ên paramîlîter (beşek ji wan ên bi Ergenekonê diyar bûne) hebûna xwe dewam bikin, KCK wê yekîneyên xwe yên xweparastinê bivênevê dewam bike. Divê armanca bicihkirina artêşê li Kurdistanê li dijî tehlûkeyên ji derve be û wekî din bi vê re jî Kurd divê weke hêmanekî bingehîn ê neteweyî û dewletê bêne hesibandin û êdî hew weke çavkaniya tehlûkeyê bêne nîşandan. Divê dev ji vê polîtîkayê were berdan. Ji bo bîranînên êş û azarên bi vî rengî yên di dîroka Komarê de qewimîne li dawiyê bimînin, divê alî bi hev re hewl bidin û bixebitin. Li ser yekîneyên xweparastinê yên KCK'ê mirov dikare hinek çareseriyan pêşkêş bike. Dibe ku statuya wan demî yan jî dewamî be. Di çarçoveya artêşê yan jî

yekîneyên din ên ewlekariyê de weke Kurdên li Iraqê nebe jî mîna parçeyekî ewlekariya xwecihî mirov dikare wan bi pêş bixe û pêk bîne.

**Şaxê Dîplomatîk:** Di vê mijarê de pirsgirêka herî girîng ew e, li ser bingehekî bi Mîsaq-î Mîllî re ne li hev çawa li parçekirina Kurd û Kurdistanê tê nêrîn û çareseriyeke çawa tê pêşniyarkirin. Bêguman Tirkmen û heta Ermenî û Asûrî jî di nava vê de ne. Rewşa wan hem li polîtîkaya hundir û hem jî li ya derve gelekî bandorê dike. Bûyerên li Ermenistan û Iraqê têra xwe rewşê rave dikin. Bûyerên li Sûrî divê piçûk neyên dîtin. Jixwe Îran tevahiya dinyayê eleqedar dike. Divê mirov Peymana Qesr-î Şîrîn a di navberê de weke ku ji vê gelekî dûr dimîne nebîne. Dem li me teng bûye. Naxwe mijarên em behsa wan dikin di çarçoveya Rojhilata Navîn de fikirînê û peydakirina çareseriyan ferz dikin. KCK di çarçoveya Rojhilata Navîn de ji bo peydakirina çareseriyan mînakeke temam e. Cudahiyê naxe navbera etnîsîte û neteweyan, ya rastî di çarçoveya cudahiyên mezheb, etnîsîte û neteweyên cihêreng de sîstemeke pirsgirêkan çareser bike, pêşniyar dike.

Modela li vir behsa wê tê kirin, sîstemeke welê nîne ku sînorên siyasî rake, derî li çareseriya eskerî veke û heta bi serê xwe federalîzmê ferz bike. Em li vir behsa pêşdebirina rêbazekê dikin ku Yekîtiya Ewrûpayê jî di navê de gelek rêbazên çareseriyê yên dinyayê li ber çavan digire, lê xweseriyên xwe jî hene. KCK qîmet dide vê pêdiviyê. Di çarçoveya yekparebûna neteweyî ya Tirkiyê de rêxistiniyeke ban a tevahiya Kurd, Ermenî, Suryanî û Tirkmenên li Rojhilata Navîn li binê xwe bihewîne, dikare were berfirehkirin. Şert nîne ku dewletan bigire bin banê xwe. Dewlet di nava xwe de dikarin yekîtiyên bi awayê Yekîtiya Ewrûpayê pêk bînin. Nexasim mirov dikare konfederasyoneke sist ji bo Tirkiye, Sûrî û Iraqê pêşniyar bike. Ev model dikare li Rojhilata Navîn berfireh bibe û kûr biçe. Divê mirov li modela çareseriyê ya KCK'ê weke dijberê modela yekîtiya dewletan nefikire, weke konfederalîzmeke demokratîk, weke yekîtiyeke civaka sivîl a ji ber pêdiviyên civakî derketiye holê û paralel bi wan re dimeşe lê bifikire. Li Rojhilata Navîn bêhed mînak hene ku nîşan didin, bi dîplomasiya dewletan bi tenê pirsgirêk çareser nabin. Badilhewa û tewş nîne ku Yekîtiya Ewrûpayê herî kêm bi qasî konfederasyona dewletan konfederas-

yona civakên sivîl jî di hevastê de pêşde biriye. Pêdiviya roja me ya îro ya bi civaka ji netewe wêdetir, rêxistiniyeke piştgiriyê ya bi vî awayî bivênevê ferz dike. Di rewşa berbiçav a Rojhilata Navîn de hewce dike û girîng e ku konfederalîzma dewletan tevî konfederalîzma civaka demokratîk di hevastê û weznekê de, bi awayekî paralel û hevtemamker were pêşdebirin û divê pirsgirêkên di vî warî de çareser bike.

Di çarçoveya KCK'ê de mirov dikare behsa hin şaxên din bike. Lê ji aliyê bûyer û pratîkên muhtemel şaxên me diyarkirî têra xwe mijarê zelal dikin û pêşniyaran pêşkêş dikin. Bêguman ji aliyê her şax û qadê ve gelek pirsgirêkên destûrî, qanûnî û rêziknameyan hene û divê bêne çareserkirin. Di vê çarçoveyê de hewcedarî heye ku gelek diyalog bi yekeyên ewlekariyê yên dewletê re bêne kirin û ev jî wê bi kêra çareseriyên hevpar bê. Xebatên di asta hukûmet û Meclîsa Millet a Mezin a Tirkiyê de wê di çareseriyê de bi rola kilîtê rabin. Herweha wê hewldan û diyalogên hevpar ên di asta saziyên dewletê de bi tenê qîm nekin. Dîsa hewldan û xebatên Hukûmetê û Meclîsa Millet a Mezin a Tirkiyê jî bi tena serê xwe qîm nakin. Civaka sivîl û weke parçeyekî wê partiyên muxalefetê jî wê bi roleke girîng rabin. Nexasim xebatên raya giştî şert in. Saziyên çapemenî û weşanê di vê de bi roleke heyatî rabin. Divê mirov alîkariya zanîngeh û akademiyan di vî warî de piçûk nebîne. Di serî de DYE û YE hêzên di çareseriya gelek şaxên vê mijarê de hema bêje aliyekî meseleyê ne, û di çareseriyê de mirov dikare alîkariyê ji hêzên xwedî ezmûn ên navneteweyî bipê.

Ev nirxandinên min ên der bar pêşîvekirina li demokratîkbûna Tirkiyê û modela çareseriya pirsgirêka Kurd de divê weke pêşnûmeyeke fikrê û pêşniyaran were fêhmkirin. Ji bo ku tevahiya aliyên pêwendîdar fikir û pêşniyarên xwe beyan bikin, ez weke erk û berpirsiyariya dikeve ser milê xwe vê pêşnûmeyê pêşkêş dikim. Kengî guftûgo û pêşniyar bêne kirin û bêne xurtkirin, bêguman em ê alîkariya xwe dewam bikin.

Ji vir û pêve pêdivî bi plan an jî bernameyeke çalakiyê ya bi cih were anîn heye. Bi vê bernameyê em ê diyar bikin ku gavên pratîk ên bêne avêtin wê ji ku û çawa destpê bikin. Ez ê plana pêşniyarên xwe ya bi vî awayî di beşa bê de pêşkêş bikim.

**Beşa Pêncemîn:**

## PLANA ÇALAKIYÊ

Her modela çareseriyê ya ji bo pirsgirêkên civakî tê pêşniyarkirin ku nirxekî xwe yê pratîkê tinebe, ji jîmnastîkeke zêhnî wêdetir tiştekî îfade nake. Bêguman gavên bêne avêtin bi fikrê re têkildar in, fikra dimeşe îfade dikin. Dîsa jî analîzên serketî bi tenê bi pratîkê dikarin bibin xwedî nirxa xwe.

Ez li ser navê xwe dikarim bibêjim, di çareserkirina pirsgirêka Kurd de bi amatorî û çarlaqî be jî min gavavêtinên pratîkî ji tevgerên çalakiyên yekalî gelekî girîngtir dîtin. Min hertim bawer kir ku diyalogên manedar divê li pêş bêne girtin. Lê dîsa ez baş dizanim ku mirov li ser diyalogê xwe bixapîne wê ev jî felaketê bi xwe re bîne. Pozîsyona muzakereyan a aliyan divê ti carî piçûk neyê dîtin. Zemînekî herî piçûk ê muzakereyê, ji çalakiyên herî pêşketî û serketî yên bi hêzê têne kirin, bi nirxtir e.

Di pêvajoya derketina holê ya PKK'ê de li salên 1970'î di mijara Kurdan de polîtîkayeke hişk a înkarê li ser kar bû. Bi awayekî devkî jî li ber van polîtîkayan rabûn bi cezayên giran dihat cezakirin. Hê di wê demê de bi komên çepgir re çareseriyên demokratîk ên hevpar li pêş hatin girtin. Bi vê armancê ez ji bo Serokatiya ADYOD'ê (Komeleya Hîndekariya Bilind a Demokratîk a Enqerê – 1975) hatim hilbijartin. Kengî ev nemeşiya derketina holê ya PKK'ê xwe ferz kir. Pêngava 15'ê Tebaxê jî dîsa alternatîfa bi tenê ya li dijî polîtîkaya îmha û înkarê bû. Herçiqasî tam bi ya dilê min nebû jî min bi tevahiya hêza xwe giraniya xwe da ser vê pêngavê û min xwe ji vê jî paşve neda.

Rewşa diyalogê ya Serok Komar Rêzdar Turgut Ozal di serê salên 1990'î de pêşkêş kir eger bihata pêşdebirin belkî pirsgirêka Kurd îro di rewşeke gelekî cuda de bûya. Ji bo diyalog û muzakereyê dewletê firsend neda serokê xwe. Bi tevahî hêza xwe ya înkarker û îmhaker li ser kar bû. Em di dema herî tarî ya dîroka Komarê re derbas dibûn. Aqûbeta hewldanên di sala 1997-1998'an de ji bereya eskerî û siyasî jî heman tişt bû. Yên ji derve û hundir ve asteng dikirin, bi kurtî Gladîo'ya li ser tevahiya avahiya eskerî û siyasî bi bandor, pozîsyoneke herî piçûk a diyalog û muzakereyê

qebûl nedikir. Tevî ku min gelekî hewl da ez pêvajoya jêpirsîna li Îmraliyê weke zemînê diyalog û muzakereyekê binirxînim jî timî hin kesan ev xira kir. Pêşniyarên min hemû bêbersiv man. Eşkere bû ku heta dawiyê tesfiyekirina tevgerê plan dikirin. Hinek sazî û dezgeh hebûn muzakere û diyalog weke dawî û qedandina xwe didîtin. Van derdoran xwe gelekî dewlemend kiribû, di nava dewletê de bûbûn dewlet. Bi şewba desthilatdariyê ketibûn û ji wan beşên herî bi tehlûke û bêrehm bûn. Tevî ku min gelekî hişyar kir jî dîsa bi hezaran kes mirin, zirar û ziyaneke bê hed û hesab çêbû. Min bi xwe ji salên 1990'î ve tercîh dikir ku şer bi sînor bigirim. Lê piştî ku vê yekê encam neda, tevî ku nedihat xwestin jî li nava Kurd û Kurdistanê bi armanca 'parastina hebûna xwe û bi destxistina azadiya xwe' pêvajoya berxwedaneke topyekûn bivênevê nêzîk dibû û ez neçar mam vê weke hişyarkirina dawî diyar bikim. Ji ber pêkhatina îhtîmalên bi vî rengî, zemînê muhtemel ê diyalog û muzakereyan hat îfadekirin.

Ne ku di nava aliyên şer de plan nînin. Planên çalakiyê ji wan xebatan in ku herî zêde li ser tê sekinîn û pêkanîn. Ez ji ezmûnên xwe hebûna van xebatan gelekî baş dizanim. Planên yekalî yên çalakiyan bi xwestek têne kirin. Ya zehmet ew e, mirov planên çalakiyê yên aliyan bigihîne hevdu pêk bîne. Eger alî li beramberî hevdu empatiyê nekin nikarin planên bi vî rengî bi pêş bixin. Ez ê der barê planên çalakiyê yên yekalî têne pêşxistin û hê jî têne pêkanîn de bi kurtî nirxandinekê bikim û tevî vê jî ez ê hewl bidim fikrên xwe der barê planeke çalakiyê de ku rê li ber lihevkirineke gengaz a herdu aliyan veke, pêşkêş bikim. Ez divê hê ji serî ve bibêjim ku ez xwe ji pêkanîna plana çalakiyê weke aliyekî berpirsiyar nabînim. Ji ber ku statuya min a hukimxarî û şertên pêkanînê derfet û îmkan nadin min ku ez di vê rewşê de bibim aliyekî meseleyê. Bi fikirên xwe yên pêşkêş dikim, armanca min ew e, hewl bidim alî zêdetir hevdu bi rastî nas bikin û di mijara planeke çalakiyê ya muhtemel de çi dikare bibe û çi nebe wan rohnî û serwext bikim.

Li gorî vê yekê:

**Plana Çareseriya Îmhaker û Înkarker a Ji Rêûresmê:** Di çarçoveya vê çareseriyê de bi qasî berê nebe jî hînê jî planên têne pêşxistin û pêkanîn mewzûbehs in. Ev derdor ji çîna navîn a bûrjûwayê û burokrasiya wê pêk tên û bingehê wan yê çînî jî xwe

disipêre rant û kurtêlxuriya dewletê. Tevî ku li derve û hundir gelekî teşhîr û tecrîd bûne jî planên xwe yên îmhayê bi rêbazên çor û fisekî pêk tînin û xwe ji vê jî paşve nadin. Ji bilî hevkartiya Kurd a kevneşopiyê, Kurdên din giş bi berxwedanên herî berfireh ên dîroka xwe li ber vê planê radibin. PKK bi pêşengiya vê berxwedanê radibe û heta ev plan bêne pêkanîn, di wê hêz û kapasîteyê de ye ku ji niha û pêve jî planên xwe yên çalakiyê pêk bîne. Di wê pozîsyonê de ye ku karibe ji planên parastina pasîf derbasî planên parastina aktîf û berxwedana topyekûn bibe. Di dema pêş me de wexta çareseriya demokratîk bi awayekî ciddî asê bibe û bixetime, mirov dikare bipê ku li hemberî vê rewşê plana parastina topyekûn bikeve dewrê.

**Plana Çareseriya Mîlliyetgir, Federalîst:** Ev plan jî divê di astên cûrbicûr û qadan de bêne pêkanîn. Ev plan ji aliyê Rêveberiya Kurdistana Federe ya Iraqê ve têne pêkanîn û li piştvan planan dewletên netewe yên mêtinkar ên rêûresmê yên herêmê û hêzên hegemonîk ên global hene. Herçiqasî armancên wan hemûyan wekhev nebin jî bi giştî mirov dikare behsa li hevkirinekê bike. Ji bo berevajîkirina potansiyela şoreşger demokratîk a li cem Kurdan planeke bi vî rengî destek dikin. DYE di serê wan hêzên hegemonîk de tê ku bi awayekî eşkere Rêveberiya Federe ya Kurd destek dike. Ji bo kontrolkirina Iraq, Sûrî, Îran û Tirkiyê Rêveberiya Federe bi roleke stratejîk radibe. Rêveberiyên Tirkî, Sûrî û Îranê bi armanca şikandina berxwedana Kurdên xwe û tine hesibandina Kurdistana wan, ji Şerê Cîhanê yê Duyemîn ve plana 'Kurdistaneke Piçûk' a li Bakurê Iraqê hatiye asêkirin bi rêbazên cûrbicûr destek dikin. Kengî Kurd dixwazin ji vî kirasê li wan hatiye birrîn derkevin, ev hêz hemû bi hev re bi ser wan de diçin.

Plansazî û polîtîkakeriya parçe bike û bi rê ve bibe herî zêde bi projeya 'Kurdistana Piçûk' tê meşandin. Nexasim bi vê rêyê dixwazin şoreşger, demokratên radîkal û sosyalîstan bê tesîr bikin. Yek ji hedefên sereke yên planê jî îzolekirina PKK'ê ye. Di berdêla 'Kurdistana Piçûk' de xebateke gelekî berfireh a Gladîoyê der barê îzole û tesfiyekirina PKK'ê de heye. Herweha ev plan di qada dîplomasiya navneteweyî de bi berfirehî tê destekkirin. Rêveberiya DYE-Tirkî-Iraq a Rêveberiya Kurd a Federe jî xistine nava xwe, di çarçoveya vê planê de niha hewl didin bi PKK'ê têkoşîna çekdarî

bidin berdan. Lê ji ber berjewendiyên cuda yên aliyan ev plan nameşe û bi cihanîna wê jî bi sînor dimîne. Dîsa ji ber ku ji aliyê beşekî berfireh ê Kurdan ve nayê destekkirin zêde bersiva bendewariyan nade. Ji ber ku ji berjewendiyên beşekî teng ê elît re xizmetê dike her roja derbas dibe zêdetir deşîfre û tecrîd dibe.

Bersiva PKK'ê daye vê planê wisa ye 'Ji teslîmbûnê re na, berxwedanê dewam bike.' Kesên demeke dirêj di nava refên PKK'ê de bêbiryar, ji aliyê exlaqî û îdeolojîk ve qels reviyan û xwe avêtin xwediyê van planan û vê jî kir ku xwediyên van planan hewl bidin tevgereke nû ya hevkartiyê bi pêş bixin, lê tevî vê jî tavilê deşîfre bûn. Mîlliyetgiriya Kurd ji ber qelsiyên xwe yên ji rêûresmê nikarîbû planeke têkûz û hevgirtî ya dewletdariya netewe jî bimeşîne û ji ber vê yekê, mîna çarenûsa wan be, her riziyane û tesfiye bûne. Van derdorên em behsa wan dikin hêviyên xwe hemû bi şikestina berxwedana PKK'ê ve girêdane. Hukûmetên Tirkiyê jî demeke dirêj bi heman awayî hêviyên xwe bi şikestina PKK'ê ve girêdane. Ji mîlliyetgiriya Kurd a xwe sipartiye 'Kurdistana Piçûk' hêvî kirine. Planeke mîna ya li ser Rûm û Ermeniyan pêkanîne xwestin yeke fena wê li ser bingehê 'Kurdistana Piçûk' li ser Kurdan jî pêk bînin. Lê ji ber cudatiya şert û mercan û statuya PKK'ê ev plan nameşin, li xwediyên xwe vedigerin û ya bi hêz dibe xeta PKK'ê ye.

**Plana Çareseriya Demokratîk:** Ji ber ku planên di herdu xalên pêşî de zêde hêviyê bi mirovan re çênakin û ji her alî ve zêde li wan diçe, Komara Tirkiyê berê xwe daye projeyên demokratîkbûyînê. Bûyerên hemdem jî berê wan li vî alî ne. Teşwîqên DYE û YE'yê (ji bo ahengê), beşekî mezin ê medyayê, raya giştî û civaka sivîl tevî Kurdan hemûyan meyla xwe ber bi vî alî ve nîşan didin û ev cara pêşî ye ku şensê pêkanîna planên çareseriya demokratîk zêde dike. Bereya faşîst a mîlliyetgir-neteweperest ku gelekî hindik bûye, tevî hemû dijberiya wê, saziyên bingehîn ên dewletê jî li dijî projeyên çareseriya demokratîk nînin û heta di amadekirina binesaziyê de bi roleke girîng radibin û ev şensê pêkanîna planên çareseriyê zêde dike. Li hemberî vê rewşa nû ya dîrokî planeke çalakiyê ya di navbera aliyan de karibe pêk bê divê di çend qonaxan re derbas bibe. Eger li ser xetên sereke yên plana çareseriya demokratîk saziyên bingehîn ên dewletê û hukûmet li hev bikin û tevî aliyê Kurd hêzên

demokratîk jî destekê bidin, qonax û pêkanînên muhtemel wê bi vî awayî bibin:

**Qonaxa Yekemîn:** Divê PKK rewşa bêşer bi awayekî mayînde îlan bike. Di vê qonaxê de divê alî nekevin provakasyonan, kontrola xwe ya li ser hêzên xwe zêde bikin û dewam bikin raya giştî amade bikin.

**Qonaxa Duyemîn:** Divê bi însiyatîfa hukûmetê û erêkirina Meclîsa Millet a Mezin a Tirkiyê Komîsyoneke Lihevkirin û Heqîqetan a bi pêşniyaran karibe alîkariya rakirina astengiyên huqûqî bike, were sazkirin. Di sazkirina komîsyonê de divê bi giranî alî li hev bikin. Li gorî mikurhatin û parêznameyên di vê komîsyonê de divê saziyeke efûyê were pêşniyarkirin û ji Meclîsa Millet a Mezin a Tirkiyê re were pêşkêşkirin. Kengî bi vî awayî astengiyên qanûnî ji holê hatin rakirin, PKK jî wê karibe hebûna xwe ya li derveyî qanûnan di bin çavdêriya desteyekê de ku têde rayedarên DYE, YE, NY, Rêveberiya Federe ya Kurd a Iraqê û Komara Tirkiyê hene, vekişîne derveyî sînoran. Paşê wê van hêzên xwe bi awayekî bi kontrol li qad û welatên cihê bi cih bike. Di vê qonaxê de nuqteya nazik ew e, divê berdena hukimxwarî û girtiyên siyasê yên PKK'ê û vekişandina derveyî sînoran a hêzên çekdarî yên PKK'ê bi hev re bêne plankirin. Li vir pîvana "yek bê ya din nabe" derbas dibe.

**Qonaxa Sêyemîn:** Her ku gavên qanûnî û destûrî yên demokratîkbûnê bêne avêtin wê zemînê ji nû ve vegera li sîlehan nemîne. Di serî de yên di nava PKK'ê de wezîfe kirine, yên gelek sal in mişextkirî ne, ji welatîbûnê hatine derxistin û yên bûne penaber wê vegera wan a welat hêdî hêdî destpê bike. Kengî xebatên KCK'ê bûn qanûnî wê hewce neke ku PKK di nava sînorên Tirkiyê de bixebite. Ji her alî ve xebatên legal demokratîk, siyasî, civakî, ekonomîk û çandî esas bêne girtin.

Ji bo ku ev plan qonax bi qonax bi cih were anîn rewşa Abdullah Ocalan xwedî girîngiyeke stratejîk e. Bêyî Ocalan şensê bicihanîna vê planê gelekî bi sînor e. Lewma çareseriyên maqûl ên der barê rewşa wî de divê bêne peydakirin.

Ez pêşniyarên xwe yên der barê rewşa xwe de dikarim bi vî awayî pêşkêş bikim:

**i-**Li ser bingehê parastina ku ez ê li Komîsyona Lihevkirin û Heqîqetan bikim weke pêdiviya kar û wezîfeyê divê bême azadkirin.
**ii-** Di çarçoveya azadiyê de, lê bi rayedarên DYE, YE, NY, Rêveberiya Federe ya Kurd û Komara Tirkiyê re, eger hewce bike bi lihevkirina bi nûnerên hêz û welatên din re, di serî de PKK ji bo ku tevahiya derdorên eleqedarî Kurdan ji çareseriya demokratîk re bêne amadekirin û ji bo ku pêdiviyên planê bêne bicihanîn, divê şert û merc werin afirandin da ku ez karibim erka xwe bi cih bînim.
**iii-**Di serî de cihê min ê mayînê divê pêdiviyên min ên cûrbicûr bêne têkûzkirin.
Raya giştî ya Tirkiyê û bi giranî gelê Kurd ji min hêviya çareseriya demokratîk û plansaziya wê dikin ku gelekî tê guftûgokirin. Ji lewra ez jî dikarim fikir û pêşniyarên xwe bi vî awayî weke pêşnûmeyê pêşkêş bikim. Eşkere ye ku li ser bingehê fikir û pêşniyarên ez ji aliyan bigirim, ez ê fikir û pêşniyarên xwe di ber çavan re derbas bikim, biguherînim û pêş bixim.
Piştî amadekirina min a vê rapor û nexşeya rê, bêguman giraniya berpirsiyariyê di serî de Hukûmeta AKP'ê dikeve ser milê Meclîsa Millet a Mezin a Tirkiyê û rayedarên saziyên bingehîn ên dewletê. Eger lihevkirineke giştî pêk bê, tavilê divê mirov ji qonaxa yekemîn destpê bike. Naxwe, ne weke gefxwarin, lê bi awayekî ez hîç naxwazim di serî de PKK û KCK wê ji niha û pêve neçar derbasî qonaxa bi navê 'Ji bo parastina hebûna Kurdan û azadkirina wan berxwedana topyekûn' bibin. Di berdêla çi de dibe bila bibe ji bo rê li ber vê neyê vekirin, bi herhalî divê em tev bi hev re li pêşiya hesabên polîtîk ên rojane û berjwendiyên kariyerîst bibin asteng û divê em model û plana xwe ya çareseriya pirsgirêka Kurd û pêşîlêvekirina demokratîk pêk bînin.

**Beşa Şeşemîn:**

## ENCAM

Eger Komara Tirkiyê ya ciwan bi çareserkirina demokratîk bi ser pirsgirêka Kurd de biçûya, bêguman wê meş û rêveçûna dîrokê cuda bûya. Projeyên korker ên hêmanên modernîteya kapîtalîst bi awayekî aqûbeta Kurdan bikin mîna ya Ermeniyan hatibûn xêzkirin. Konjonktura dinyayê û qelsiyên rêxistinî û îdeolojîk ên Kurdan xwediyên van projeyan bi cesaret kirin. Ji xwe piştrast û dilniya bûn ku serketina wan a li dijî Ermeniyan wê li ser Kurdan jî dubare bibûya. Li gorî bûrjûwaziya çîna navîn û burokrasiya wê ku dîroka berî komarê ji bîra xwe biriye, Kurd ji mêj ve di dîrokê de hatine binaxkirin, hebûna wan nemaye, bi tenê tiştek in ku ji çend hêmanên texrîbkar wêdetir tiştekî îfade nakin û ti maneya wan nîne. Derfet û îmkan hebû ku li ser wan polîtîkayeke asîmîlasyonîst a bi sînor pêk bihata. Tesfiyekirina Ermeniyan a bi awayekî fizîkî dikarîbû li ser Kurdan bi awayekî çandî bihata pêkanîn. Pêşengên Tirkan di her qonax û werçerxa dîrokî de bi pêşengên Kurdan re hevpartiyeke stratejîk kirine, lê nifşekî nû êdî di rojevê de hebû ku hîç nedişibiya van pêşengên xwe. Komarê ev nifş timî xwedî kir. Ji bo kesek bibe zilam, ji bo bibe xwediyê kariyerê diviyabû Kurd înkar bikirana, ev weke qanûneke ji hêsin a bêdeng bû. Bi devberdana ji Kurdîtiyê jî ti miqam û mertebe tinebû ku mirov negihîjiyê. Bi tenê li ser vî bingehî dikarîbûn di nava tevahiya yekdestdariyên modernîteyê de cih bigirin.

Heta bi derketina holê ya PKK'ê bi dengên lawaz û zelûlî be jî li dijî vê înkar û qirkirina çandî derketin hebû, lê dijberiya PKK'ê di vî warî de weke tehlûke û gef hat dîtin. Li gorî wan diviyabû nebûya, lê dibû. Ji lewra çaryeka dawî ya sedsala dawî pirr dijwar derbas bû û mirov dikare wê bi gotinên weke 'awarte' û 'xeternak' diyar bike. Çaryeka dawî ya sedsala dawî ya em behsa wê dikin, têra xwe piştrast kiriye ku rêya ketinê bi tenê li dijî mirovatiyê gunehkarî nîne, di heman demê de ji aliyê maddî û manevî ve jî gelek zirar û ziyanên xwe hene û gelek nirx û buhayan dirizîne. Di vê rêyê de serketin nabe. Ya rastî, Komar bi hevgirtina xwe sipart hêmanên têkûz ên demokratîk hat avakirin. Kurd jî hêmanên

damezrîner ên vê hevgirtinê bûn. Projeya modernîteya yekdestdar a bi destê dewletê hat birêvebirin, bi biryar bû ku hevgirtiyên din sosyalîst û ummetgirên Îslamî bi tevahî ji nava sîstemê rake. Têgihiştina neteweya homojen di asta dînîtiyê de hat lêkolînkirin û hewl dan bidin meşandin.

Berevajî îddîayan, mîmarê vê projeyê ne Mistefa Kemal e, kadroyên Îttîhadgir in. Çawa ku Abdulhemîdî bi kar anîn, hewl dan bi heman taktîkan Mistefa Kemalî jî bi kar bînin. Divê mirov plana qirkirina çandî ya Kurd di van kadroyên Îttîhadgir de bibîne û ev ji bo destnîşankirina rastiyê gelekî girîng e. Bereya mîlliyetgir-neteweperest a hê jî weke hevgirtina Qizilelmayê (sêvasor) tê meşandin bi rengekî faşîst radibe û weke antîteza hevgirtina demokratîk a di dema damezrandina Komarê de ye. Komîtakarî û darbekarî di nava dewletê de rêbaza wan a bingehîn bû. Di nava DYE'yê de, û hê beriya wê di nava Împaratoriya Brîtanyayê de hamiyên xwe yên baş peyda kiribûn. Di şêst salên dawiyê de xwe sipartin Gladîo'ya NATO'yê û bi vî awayî di bêvla civakê re anîn. Herçiqasî dadgehkirina Ergenekonê sembolîk be jî derbeke ciddî ye ku li derfeta van kesan ketiye ango derfeta van kesan a di nava dewletê de bibin dewlet, derb xwariye. Rewş dişibe dema Siltan Mehmûdê Duyemîn. Di wê demê de axatiya Yenîçeriyê bi heman awayî hatibû tesfiyekirin. Yenîçeriyan timûtim padîşah ji text dianîn xwarê, sadrazam bi darve dikirin û ji bilî vê jî bi kêra tiştekî nedihatin. Lewma di sala 1826'an de bi tesfiyeyeke xwînî ji holê hatin rakirin. Bi vî awayî pêşî li Tanzîmat û Meşrûtiyetê hat vekirin.

*Yenîçeriyên Îttîhadgir ên Modern* ku herî kêm sedsalek rabihuriya wan heye, ne bi tenê Împaratoriya Osmanî ber bi hilweşandinê ve birin, meşrûtiyeta wê ya demokratîk Komara Tirkiyê jî di demeke kin de veguherandin rêveberiyeke despotîk û ji vê jî paşve neman. Heman zêhniyet û pêkhatinê li şûna hamîtiya emperyalîzma Elman xwe avêt hamîtiya emperyalîzma Brîtanya û DYE'yê. Di nava deh salên dawiyê de weke neteweperest û mîlliyetgir di nava dewletê de bi komplo û provakasyonên nedîtî bi navê Eregenekonê xwestin xwe bi cih bikin. Ji bo vê şerekî dijwar meşandin û di vî şerî de vê carê bi ser neketin. Sedema vê yekê jî eşkere ye: Hamiyê wan ê sereke DYE'yê desteka xwe ji pişt wan vekişandibû. Bi lîstika bi navê Avrasyagiriyê li Çîn, Rûsya û Îranê li

destekê geriyan, lê zêde eleqe nedîtin. Jixwe lîstika wan a Kemalîzmê di asta karîkaturiyê de bû. Herçiqasî hêza van derdoran a berxwedanê nebe jî divê nûnerên wan ên siyasî, zêhniyeta wan û bermahiyên avabûna wan a burokratîk piçûk neyên dîtin. Herçiqasî nikaribin hegemonya xwe di nava dewletê de ji nû ve ava bikin jî dikarin pêşîlêvekirina demokratîk a Tirkiyê provoke bikin, naveroka wê pûç bikin û bikin ku bi kêra çareserkirina pirsgirêkê neyê, wê bêkêr bikin. Dibe ku hêz û ezmûnên wan têra vê yekê bikin.

Li Rojhilata Navîn û Tirkiyê bûyerên diqewimin yên ku rê li ber krîz û pirsgirêkan vedikin, bi tenê bi pêşîlêvekirineke berfireh a demokratîk dikarin bêne çareserkirin. Di vê mijarê de weke zêhniyet û avabûn, şensê Tirkiyê yê modelbûnê heye. Mîna şert û mercên di dema derketina Komarê de şert û merc ji bo veguherîn û pêşîlêvekirinên demokratîk ên Komarê mewzûbehs in. Dîrok careke din çerxa xwe digerîne, lê bi awayekî nûvekirî vê yekê piştrast dike. Ji bo Kurdan jî mirov dikare tiştên bi heman rengî bibêje. Çawa ku di tevahiya hevgirtinên dîrokê yên Anatolya û Mezopotamyayê de xwedî rol bûn, dîsa niha bi roleke heman rengî re rûbirû ne. Ew êdî ne Kurdên berê ne; wan xwe nû kiriye, rêxistinkirî ne, çalak in. Li herdu qadan jî paşverûtiya hundir, muhafezekarî û komplokarî wê bixwazin rola xwe ya dîrokî dewam bikin.

Hêza hegemon a global DYE, dizane wê bi Gladîo'ya NATO'yê bi sernekeve. Piştî ku bloka Sovyetê hilweşiya ti maneya Gladîo'yê nema. Di encama hewldanên mezin ên rêveberiyên Tirk de bi zor û zehmetî hatin razîkirin ku Gladîo'ya Tirk heta bi Mijdara 2007'an bimîne. Ya rastî, PKK'ê bîstûpênc salên xwe yên dawiyê bi şerê bi Gladîo'ya Tirk ya di bin banê NATO'yê de bihurand. Aliyê xeternak ê vê meseleyê ew e, hê nû tê fêhmkirin ku Kurd jî di nava Felaketa Ermeniyan a duyemîn re derbas dibin. Berjewendiyên DYE, Îsraîl û Yekîtiya Ewrûpayê li Rojhilata Navîn û Kurdistanê bi Gladîokariyê re li hev nedikirin. Lewma di peymanên xwe yê nû de ku bi rayedarên hukûmetê û saziyên Komarê re kirin, bi kêmanî li hev kirin ku bi şêwazê berê yê Gladîokariyê nabe û divê ji vî şêwazî bibihurin. Di vê çarçoveyê de mirov dikare bibêje, ji derve astengiya herî diyarker a li pêşiya gavavêtinên demokratîk ên Tirkiyê hatiye lawazkirin. Darbekar û komploker wê weke berê

nehatana destekkirin. Lê divê neyê jibîrkirin ku wexta pêdiviyê bi wan bînin û bi kar bînin, wê bermahiyên wan di bin destê xwe de hazir bigirin. Çawa ku di dema avakirina Komarê de bi heman bermahiyan xwestin avakirinê asteng bikin û piştî avakirinê jî çawa xwestin wê ji rêya pêşketinê bigirin, li pêşiya demokratîkbûnê jî îhtîmalên bi heman rengî hene. Eger dîrok xizneyeke bêhemta ya dersdanê ye herî zêde jî weke firsenda azadiyê ya niha li pêşiya wê, mirov dikare heta dawiyê jê sûdê werbigire.

PKKya ku xwe nûkiriye, xwe ji pêşîlêvekirinên şaristaniya demokratîk re amade kiriye, veguherîna xwe û ya Kurdan pêk aniye, pêngava wê ya bi navê KCK'ê amûra herî di cih de ya siyaseta demokratîk û aştiyeke bi rûmet e, ew ne amûra şer e. Ev wesfê wê yê bingehîn tê wê maneyê ku ew garantiya Tirkiya Demokratîk e. Hevgirtina dîrokî ya Anatolya û Mezopotamyayê di roja me ya îro de weke hevgirtina Tirkiya Demokratîk û Kurdistana Azad ji bo pêkhatin û zayînê janê dikişîne. Ji bo mirov firsendê nede xêrnexwazên hundir û derve divê mirov hinekî guh bide dîrokê. Ji bo yên zanibin bibihîsin dîrok pisûlayek e ku ji rastiyê şaş nabe. Ji bo yên bizanibin bixebitin jî xwesipartina civak û gelê welatê azad û demokratîk timî çavkaniya hêz û îlhamê ye.

Kengî 'Modela Çareseriya Pirsgirêka Kurd û Pêşîlêvekirina Demokratîk' a bibe bersiva rastiyên dîrokî û şertên rojane yên Tirkiyê, bi cih werin anîn, hingî dîrok wê bi tenê ji bo wê bi awayekî azad neherike, di heman demê de ji bo gelên Rojhilata Navîn jî wê bibe rêya pêşketina demokrasî, wekhevî û azadiyê. Li dijî mêtingerî û dagirkeriya hêmanên modernîteya kapîtalîst li ser çanda herêmê, wê pêşketina hêmanên modernîteya demokratîk bihêle ku weke sîstemeke di cih de ya ku li rastiyên xwe yên dîrokî vedigere bi hêz û xwedîderfet bibe. Heye ku dîrok yekem car ne weke dîroka dagirkerî, mêtingerî û her cure fetihkariyê, lê weke dîroka civaka ji jiyana ferdên azad, wekhev û demokratîk pêkhatî were nivîsandin.

**15'ê Tebaxê 2009**
**Abdullah Ocalan**
**Îmralî**